

Berbang

Bilaga p  svenska

KOVARA FEDERASYONA KOMELEY N KURDISTAN  LI SW D  •HEJMAR/ No: 122  ILEYA P Ş N/ DECEMBER 2001



**Avayiya n  ya Federasyon  ji aliy  Wez ra Kultur  ya Sw d 
Marita Ulvskog ve hat vekirin!**



**Bi h viya ku em xwed  li nirx n xwe y n netewey  derkevin;
sala we ya 2002  p roz be!**

Berbang

Hejmar / No: 122, 2001

Berbang organa
Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye
û ji du mehan careke derdikeve

Utges av Kurdiska Riksförbundet i Sverige

Berpirsiyarê giştî / ansvarig utgivare

Keya Îzol

keya.izol@kurdiskarf.org

Redaktorê Berpirsiyar:

Vildan Tanrikulu

vildam.tanrikulu@kurdiskarf.org

Redaksiyon / i redaktionen

Hemed Gohary
Vildan Tanrikulu
Newzad Welî
Kovan Amedî

layout-redigering /pergela rûpelan

Faris Marsil
berbang@kurdiskarf.org

Abonetiya salane / Prenumeration

Ji bo kesan 150 SEK
Ji bo dezgehan/myndigheter 300 SEK
Ji bo welatên din 250 SEK
Bihayê yekane 25 SEK
annons

en hel sida 5000 SEK

Navnîşan / Adress

Adresa seredanê

Henriksdalsringen 6

131 32 Nacka

Berbang

Box 5013

S-131 05 Nacka

SWEDEN

berbang@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

tfn 08-644 6622

faks 08-650 21 20

Postgiro: 64 38 80-8

ISSN 0281-5699

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e. Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji derve tîn, serrast û kurt bike.

Çapxane: APEC-Tryck

Ji bo hemû kes, komele û rêxistinên Kurdistanî

Ez li ser navê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, sipasiyên xwe ji bo wan kes, komele, rêxistin û partiyên dikim bi mesaj, name û bi e-mailan avayiya nû ya Federasyonê pêroz kirine.

Digel slavên germ

Keya Izol

Serokê FKKSê

Hin tîbînî...

Avayiya nû ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ku li Henrikdalê li belediyeya Nackayê hatibû kirîn; di 12ê Cotmeha 2001ê de ji aliyê Wêzîra Kulturî ya Swêdê Marita Ulvskog ve hat vekirin. Bi munasebeta vekirinê şahiyê mezin hat li dar xistin. Di vê hejmarê de -him bi kurdî û him jî bi swêdî- me cî da vê mijarê.

Her weha konferansa YJKê ku li ser "kvinnohålsö & sexualitet" hat li dar xistin di vê hejmarê de ciyekî fireh distîne.

Dîroka 20 saliya Federasyonê ku me di du hejmarên buhûrî de jî cî dabû, di vê hejmarê de li ser vê babatê bi gelemperî û bi taybetî jî li ser prosesa damezirana wê hatiye sekinandin. Ev nivîs di hejmara berê ya Berbangê beşa Soranî de hatiye çapkirin û transkripsiyona wê nivîsê ye!

XXX

Di redaksiyona Berbangê de jî guhartineke çêbû. Endamê Komîteya Karger Vildan Tanrikulu bû redaktorê berpirsiyar yê Berbangê. Di eynî wextê de ew wek endamê redaksiyonê jî dê kar bike.

Heta hejmareke din di xweşiyê de bimînin!

www.kurdiskarf.org/berbang

Komeleyên endam

- 1-Kurdiska Foreningen i Borlange
Sturegrand 11,
784 32 Borlange
- 2-Kurdiska Idrotts Foreningen
Box 152 16, 161 15 Bromma
- 3-Kurdiska Foreningen i Borås
Box 11129, 507 11 Borås
- 4-Kurdiska Foreningen i Eskilstuna
Box 14595, 630 14 Eskilstuna
- 5-Kurdiska Foreningen i Falköping
Box 146, 521 02 Falköping
- 6-Kurdiska Foreningen i Falun
box 6010, 791 06 Falun
- 7-Kurdiska Foreningen i Helsingborg
Visitorsg. 13, 252 47 Helsingborg
- 8-Kurdiska Foreningen i Gävle
Box 1277, 801 37 Gävle
- 9-Kurdiska Foreningen i Göteborg
Box 11102, 404 23 Göteborg
- 10-Kurdiska Foreningen i Hudiksvall
Valv. 15, 824 42 Hudiksvall
- 11-Kurdiska Kultur och
Solidaritetsforeningen,
Box 225, 175 02 Jarfalla
- 12-Kurdiska Foreningen i Jönköping
Box 8043, 550 08 Jönköping
- 13-Kurdiska Kultur Klubben
Box 130, 691 22 Karlskoga
- 14-Kurdiska Foreningen i Karlstad
Fagog. 11, 654 70 Karlstad
- 15-Kurdiska Foreningen i Kristinestad
Bataljonv.40, 291 37 Kristinestad
- 16-Kurdiska Foreningen i Linköping
Box 657, 582 07 Linköping
- 17-Kurdiska Handikappsforeningen i
Linköping,
Box 657, 582 07 Linköping
- 18-Kurdiska Kulturföreningen i Luleå
Box 170, 971 05 Luleå
- 19- Kurdiska Foreningen i Lund
Box 1633, 221 01 Lund
- 20-Kurdistsans Fredsforening i
Malmö
Fosilv. 29 B, 7 tr. 214 31 Malmö
- 21-Kurdiska Foreningen i Malmö
N.Gränsbergsg. 4, 214 55 Malmö
- 22-Kurdiska Foreningen i Marsta
c/o Gharib Adil,
Sleipersg 40, 195 54 Märsta
- 23-Kurdiska Foreningen i
Norrköping,
Kungsgatan 26, 602 20 Norrköping
- 24- Kurdiska Foreningen i
Nynäshamn,
Box 266, 149 01 Nynäshamn
- 25-Kurdiska Foreningen i Sala-Häby
Box 165, 733 30 Sala
- 26-Kurdiska Forening i Sandviken
Box 3070, 811 33 Sandviken
- 27-Kurdiska Foreningen i Spånga
Box 4118, 163 04 Spånga
- 28-Kurdiska Forenin i Stockholm
Box 5013, 131 05 Nacka
- 29-Kurdiska Författarforeningen
Box 5013, 131 05 Nacka
- 30-Kurdiska Juristforeningen
Box 5013, 131 05 Nacka
- 31-Kurdiska Foreningen i Sundsvall
Box 6025, 850 06 Sundsvall
- 32-Kurdiska Foreningen i Trollhatten
Box 6043, 461 06 Trollhatten
- 33-Kurdiska Foreningen i Umeå
Box 257, 901 06 Umeå
- 34-Kurdiska Foreningen i
Upplandsvasby
Björkvalav. 29, 194 36 Upplandsvasby
- 35-Kurdistsans Forening i Uppsala
Box: 3088 750 03 Uppsala
- 36-Svensk Kurdsika Foreningen i
Uppsala Box 25065, 750 25 Uppsala
- 37- Kurdiska Foreningen i Västerås
Box 1369, 720 13 Västerås
- 38- Kurdiska Foreningen i Örebro
Box 537, 701 50 Örebro
- 39- Kurdiska Foreningen i Östersund
Box 668, 831 27 Östersund

Armancên



Federasyonê

F K K S rêxistineke demokratîk e. Bi tu rêxistinên siyasî û olî ve ne girêdayî ye. Ji komele û yekî-tiyên Kurd li Swêdê pêk tê.

- Kurdên li Swêdê temsîl dîke û ji bo berjewendîya civata Kurd li Swêdê xebatê dîke.
- Kurdên li Swêdê di derheqa civata Swêdê de agahdar dîke û ji bo çareserkirina pirs û pirsegirêkên Kurdên li Swêdê û ji bo pirsê integrasyonê xebatê dîke.
- Ji bo pêşdebirina ziman û belavkirina çanda Kurdî xebatê dîke.
- Ji bo çareserkirina pirsên jin û ciwan û zarok û handîkapên Kurd xebatê dîke û ji bo pêşdebirina wan hewildide ku îmkanan amade bike.
- Alîkariya penaberên Kurd dîke û wan di derheqa mafên penaberan de agahdar dîke. Ji bo başkirina rewşa wan hewil dide.
- Gelê Swêdê di derheqa pirsê Kurd û Kurdistanê de agahdar dîke û ji wan doza piştgiriya dîke.
- Li dij zordestiyê piştgiriya tevgera gelê Kurdistanê ya li Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê dîke û ji bo parastina nasnameya neteweyî xebatê dîke.
- Bi rêxistinên demokratîk û civakî (çi swêdî, çi biyanî) re hevkarî dîke.
- F K K S ê ji bo mafên biyanîyan û penaberiyê li gor peymanên navnetewî û prensîbên beyana cihanî ya mafên mirovan bîn parastin dixebite.

Komîteyên Federasyonê

Ev komîteyên Federasyonê di kongreya 19em a Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ku di 21 û 22ê Cotmeha 2000an de li Stockholmê li avayîya ABFê de pêk hat, hatin hilbijartin.

Komîteya Karger

Keya Îzol-Serok
Hamed Gohary-Sekreter
Nasir Fezullah- Berpirsiyarê kultur û perwerde
Vildan Tanrikulu-Berpirsê reorganizekirina YJK û YCK
Nizal Mahmûd- Berpirsê peneberan
Kovan Amedî- Berpirsiyarê peywendiyên navxweyî
Fexreddîn Olçer- Berpirsê aborî
Seyran Dûran(Seroka Yekîtiya Jinên Kurdistanê)
Seval Mert(Ji Yekîtiya Ciwanên Kurd)

Cigir:

Ezîze Vatandost
Enver Karahan
Selam Cizîrî

Komîteya Giştî

Emir Circis
Ehmed Sindî
Niyaz Ehmed
Rehman Hessen
Salih Demir
Diyar Mizûrî
Reşîd Ehmedî
Cemil Demircan
Lokman Ertaş
Xunav Xoşnav
Adil Dihokî
Macit Abdurrehman
Cigir
Nurî Salih, Gelale Nûrî, Reşîd Battê
Komîteya Rawêj
Cemal Batûn, Mustafa Aydogan, Bubê Eser, Serdar Omer, Şerîf Şerîf
Komîteya Revisor
Asî Rebbatî, Felat Koçkaya, Lokman Polat

naverok

"Ev avayî dê bibe navenda hemû kurdên li Swêdê"	Keya Izol	6-7
FKKS redkirina cûdabûnên me, erêkirina	Vildan Tanrikulu	8-9
Du rojên hêja û dagirtî	Seyran Duran	10
Konferansa "seksualîte û nexweşiya jinan"	Sevgi Yildiz	11-13
Kod	Faris Marsil	16-17
Dîroka Federasyonê	Amadekar: H. Gewerî- K. Amedî	18-22
Nûçeyên malbatî.....		23
Çalakiyên Federasyonê		24

PORTRE



"Xerabî ne tenê ji
dagirkeran e, kurdan
bi xwe jî xerabî bi xwe
kirine"
rûpel: 14-15



Avayiya nû ya Federasyonê pîroz be!

Innehåll

öppet brev till EU:s regeringschefer	4-5
Ingvigning av KRF:s nya lokaler	6-9
Kvinnohälsa & seksualitet	10-11
"Integration, På Vems Villkor"	12

”Ev avayî dê bibe navenda hemû kurdên li Swêdê”



Serokê Federasyonê Keya Izol û Wezîra Kulturî ya Swêdê Marita Ulvskog di vekirina avayiya nû de!

Keya Izol
keya.isol@kurdiskarf.org

Wezîra Kulturî ya Swêdê Marita Ulvskog avahîya FKKSê di rîzê cotmeha zoorê de vekir. Di civîna vekirinê de Serokê Beledîya Nackayê Erik Langby, gelek mêvanên kurd, swêdî û bîyanî hazir bûn. Hemû mêvanên ku bi vê munasebetê peyîvîn bi xetên qalind behsa girîngîya rêxistineke bi vî rengî ku dikare piraniya kurdên Swêdê di bin baskên xwe de bicivîne, kirin.

Di destpêka salên 1980î de ku munaqeseya rêxistineke wek Federasyon di nav rojêya kurdên li Swêdê de bû, wê demê jî behsa avahîyake payîdar dihat kirin. Hemû Kongreyên FKKSê de ev daxwazî dihat zimên. Lê piştî 20 salan ev xewna me bû rastî. Îro mala me bixwe heye. Ev avahî dê bibe navenda hemû kurdên li Swêdê. Hemû kategoriyên civata me li vî welatî wek zarok, ciwan, jin û mêr dê vê avahiyê wek mala xwe biparêzin. Kurdên Swêdê dikaribûn zûtir jî xaniyêke wiha ji xwe re bikin. Lê ji ber gelek sebebên

ev yeka dereng ket. Yek ji sebebên esasî nezelaîya pêşeroja kurdên Swêdê bû. Kurd nizanibûn gelo ew dê li vî welatî bimînin yan jî ew dê vegehin welat. Xwanêye piştî 20-30 salan kurd êdî biryara xwe ji bo mayîna û entegrebûyîni li vî welatî dan.

Bi vê biryarê êdî kurdên li Swêdê bi Brenceke din dikevin nav civata Swêdê jî. Wek nûnerên siyasî, beledîye, dezgehên fermî de wê bikaribin îmkana testîrkirina civakî vê têxin destên xwe. Ji bo nîşfa nû û yê pey wê ev rastîya wek rastîyêke gelek girîng di rojêya kurdên li Swêdê de ye. Divê em bi dînamîzma grûpa xwe bikaribin testîr li ser çûyîna civakî ya vî welatê bikin. 20 - 30 salên li pêş me em ê bi hev re encama vê berhemê bibînin.

Tevlîbûna di pirsên civakî ya Swêdê ji ber 2 sebebên pir girîng e. Yek ji ber ku em li vî welatî dijîn, divê ji bo berjewendiya xwe yê grûbî bikaribin testîr li ser siyaseta vî welatî bikin. Ev jî bo pêşeroja me gelek girîng e. Ev di heman wext de parastina mafên me li Swêdê ye. Sebeba duwemîn bi doza kurdan ve girêdayî ye. Gava em aktîf

bin em ê wek grûp bikaribin bi êsanî destkewtî û piştgirîya raya giştî jo bo doza kurdan bi dest bixin.

Grûba me di nav guherandîneke Gbingehîn ya civakî de ye. Jiyanê li Swêdê bi her awayî li ser me tesîreke mezin kiriye. Pîrsa pêşeroja ciwanên me û wekhevîya jin û mêran wek pîrsên girîng li pêş me ne. Divê ciwanên me bi nasnameyên xwe yê kurdî li vir mezin bin. Herweha divê em jî hewilbidin ku pîrsa wekhevîyê bi hemû manayên xwe bixin nav civata xwe. Ev yeka wê ji bo nîşfa paş me dibekû hêsantir be, lê îro nîşfa yekem divê bi awayekî aktîf di vê prosesê de cihê xwe bigre. FKKS, YJK û YCK divê di salên pêş de di vî warî de ji civata ku lê dijîn kêmtir nebin. Ev yeka ji bo berjewendîyên me ya civakî pêwîst e. Ev proses jî xwe dest pê kiriye. Lê divê em hewilbidin ku ev bi dînamîzma me bi xwe bê ajotin. Ne ku bi gotina hin dezgehên Swêdîyan bê meşandin. Di rojên buhurî de li ser grûba me bi zanebûn hin kampanyayên xeter hatin meşandin. Em wek FKKSê van qewimandînen negatîf ji nêzîk ve taqîp dikin û li her derê jî li dij wan derdikevin. Divê em di vî warî de bêtir xebat bikin.

Xebat û piştgirî ji bo doza Kurdistanê û xebata entegrasyonê divê hevûdu temam bikin û bi hev re werin meşandin. Ev yeka wê bêşik di alîkî de nasnameya me ya netewî biparêze wê di aliyê din de alîkarîya me bike ku em di vî civata nuh de baştir cihê xwe bigrin.

Avahîya me careke din li me pîroz be. Li ser navê FKKSê ez dixwazim spasîyên xwe yê germ ji bo hemû hevalên ku kedên xwe ji bo xizmeta civata me dan, bikim.



Wezîra Kulturî ya Swêdê Marîta Ulvskog: "Ez di wextek gelek xweş de li vir im ku we avayiyeka nû li vir li belediyeya Nackayê bi dest xistiye. Kurd û zimanê kurdî ciyê xwe di civata Swêdê ya piralî de girtiye û dê duwerojê de ji ev proses dewam bike.



Serokê Belediyeya Nackayê Erik Langby: "Ez kêfxweş im ku iro ez livir bi we re beşdarî vekirina lokala nû ya Federasyonê dibim. Ez dixwazim bêjim ku ji bo me siyasetmedarên Nackayê ne hesan bû ku em vê avayiyê bifroşin kurdan"




Wezîra Kulturî ya Swêdê Marîta Ulvskog piştî vekirina avayiya nû ya Federasyona Komelyên Kurdistanê li Swêdê deftera mêvana înzê kir.....



Piştî vekirina avayiya nû Wezîra Kulturî ya Swêdê Marîta Ulvskog bi kêfxweşî xwarina kurdî xwar!!

FKKS, redkirina cudabûnên me erêkirina muşterekên me ye!*

+



Vildan Tanrikulu

vildan.tanrikulu@kurdiskarf.org

Bîst sal piştî avakirina Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê (FKKS), careke din li ser pêwîstîya hebûna û avahiya rêxistinî ya FKKS hewcedariya nivîsandinê, dikare weke tiştêk pir xerîb xuya be. Lê dema mirov civatek weke Swêdê de bi-jî, dema mirov bi yek ji wan rêxistinên demokratîk, neteweyî û kutlewî ku, di nav kurdan de îstîsnayek e, angî di FKKS de nêzî 20 salan di organên cuda de kar kiribe, ev tişt wisa "xerîb û ecêb" nayê. Ji ber ku, hem ew civata ku em lê dijîn de, pirsên pêwîstî û avahiya rêxistinî yên rêxistinên cuda, rojane û bi berfirehî tene nixandî û munaqêşekirin û hem jî dema mirov bi demêk dûr û dirêj di nav rêxistînek de kar dike, dînamîzm, nûhbûn û li gel vana jî pêwîstîya agahdarî û nixandîna rewşa rêxistinî dikare hin ji nêzîk ve bibîne û tesbît bike. Her weha, tê zanîn ku li gelek civatan de, li gelek komeleyên endam de û bi giştî di nav kurdên Swêdê de (çi yên nûh hatî û çi jî yên bi ro-salan ve ye li vir dijîn) bi giştî pirsên li ser birêxistinbûnê û taybetî jî rexistina demokratîk ya me, angî FKKS, dinirxînin û pirsan dipirsînin û li gor xwe encaman derdixin. Loma jî, bi qeneeta min, ne kevinbûn û bi emirbûna rêxistînek, lê hebûn û dînamîzma rêxistînek, ne bi tenê pêwîstîya lê her weha bîngeha berdewamîya nixandî û munaqêşekirina rewşa wê rêxistinê jî, ava dike.

FKKS çi ye? FKKS çima hatiye avakirin? Gelo FKKS çima pêwîst e? Çima navenda FKKS li Stockholmê ye? Çima kurdên li bajarên din yan jî komeleyên kurd li bajarên din endamên FKKS ne? FKKS tune be dê kurd çi wenda bikin û çi qezenc bikin? Gelo FKKS rêxistînek demokratîk e yan na? Gelo FKKS piştigiriya hin hêzên sîyasî dike yan jî bi kontrola hin hêzên sîyasî de ye yan na? Gelo îmkanên FKKS rast û bi armancên FKKS re lihevkerî tînin bi kar anîn yan na?

Ev û bi dehan pirsên din dikarin, li civatên cuda yên kurdan de, bibin babetên munaqêşê û nixandînan. Bê guman lêgerîna bersîvên van pirsan di hejmarek Berbangê de û bi yek du rûpelan ve ne mumkun e. Ez dê hewil bidim da ku, di vê hejmara Berbangê de bi tenê du pirsan binirxînim û muna-

qêşê bikim. Bi qeneeta min ev herdu pirs jî pirsên bîngehî in û divê mirov ji van pirsan dest bi nixandî û munaqêşeyê pêwîstî û avahiya rêxistinî ya FKKS ê bike.

Ev herdu pirs jî ev in; gelo pêwîste ku kurd komeleyên li beledîyeyan ava bikin û ev komele jî bibin endamên FKKS û bi vî awayî dengên xwe bikin yek? Ez dê berê nixandî, bersîva xwe ya ji bo vê pirsê bidim.

Belê, pêwîst e ku kurd komeleyan ava bikin, xwe birêxistin bikin. Kurd divê ne bi tenê li gund û bajarên de, lê her wisa li seranserê welatê ku lê dijîn de divê birêxistin bin û temsîla xwe ava bikin. Û ne bi tenê awayek rêxistinî lê, li her qadek jîyanê de bi her awayên ku mumkun û pêwîst e divê birêxistin bin û temsîla wan a rêxistinî li sewîya merkezi de divê hebe. Babeta me FKKS û komeleyên endam yên FKKS ye. Loma jî ez vedigerin li ser babeta esasî.

Kurd li Swêdê penaber in. Sedemên hatina kurdan yek bi yek çî dibin bila bibin, hemû kesên ku xwe kurd dizanin, her weha dizanin ku ew ne li welatê xwe, lê li welatek din dijîn. Ev yek xalek muşterek ya ji bo hemû kurdên li Swêdê, yan jî li derveyî Kurdistanê dijîn e. Dema her yek ji me, angî nêzî 40 ooo kurdên li Swêdê, li welatê xwe bûn, li gund û bajarên xwe bûn, xaleke me ya muşterek a bi vî awayî tune bû. Lê li vir heye. Ev tişt ji bo nîşên nû jî

FKKS û komeleyên endamên FKKS redkirina cudabûnan me ye û erêkirina xalên me yên muşterek e. Loma jî, FKKS, ne alternatîfa ne jî astenga li hem ber rêxistinên ku li ser bingehên cudabûnên me hatine avakirin e. Her awayek birêxistinêbûnê ji bo me kurdan xwedî cîh, mane û fonksiyonek cuda ye. A giring ew e ku, mane, cîh û fonksiyona her awayek rêxistinên kurdan ji bo endamên wan û ji bo civatê zelal bin.

wisa ye. Zarok û neviyên me jî zarok û neviyên kurdên penaber/mihacir in. Xalek din ya muşterek jî ew e ku, em zarûkên welatek parvekirî û neteweyek bindest in. Li piraniya qada welatê me, em hîn nikarin bibêjin em kurd in û ji mafê xwe yê herî tabîî û mirovî, ango ji mafê bi zimanê xwe axaftinê bêpar in. Ev xal jî, ji bo hemû kesên ku xwe kurd dizanin, li ku derê dinyayê dijîn bila bijîn, xalek muşterek e.

Lê em, nêzî 40 000 kurdên li Swêdê ji hev û du bi gelek awa û xisûsiyetên xwe ve jî, cuda nin. Hem bi xisûsiyetên xwe yên şexsî, hem bi girêdanên xwe yên civakî, hem bi hêjahiyên xwe yên fikrî, hem bi baweriyên xwe yên dînî (olî), hem bi peywendiyên xwe yên siyasî, hem bi zaravayên xwe û.h.w.d.

Eger em vê yekê hin vekirîtir binivîsin tê maneya ku, di nav me kurdên li Swêdê ciwan û pîr, mêr û jin hene. Yên dirêj û kin, yên qelew yan jî qels hene. Yên sosyalîst, liberal, sosyal-demokrat, komunist û xwediyên baweriyên siyasî yên din hene. Yên ku endamên rêxistinên siyasî û yên ku ne endamên rêxistinên siyasî nin hene. Yên dewlemend û yên feqîr hene. Her yek ji me xwediyê meslek û karên cuda nin. Hin ji me nebûne xwediyê îmkanên xwendinê, hin ji me profesor in. Hin ji me li gundan yên din li bajaran mezin bûne. Hin ji me misilman in lê, yên yêzîdî û xiristîyan û musewî jî hene. Hin ji me jî bi hîç dînekî (olek) ve ne bawer

in. Hin jî me ji rojavayê başûr, hin ji bakur hin ji rojhilat û hin jî ji Kurdistan başûr in. Em hem bi zaravayê kurmancî, hem soranî hem zazakî dipeyîvin. Ez devokên cuda nabêjim. Her kesek dikare van cudabûnên me bi dehan tiştên din jî zêdetir bike. Lê ez dirêj nakim.

Nuha divê em ji van herdu xalên muşterek yên xwe û bi dehan xisûsiyet û girêdanên ku em ji hev cuda û dûr dikin, neticeyek di derheqê jiyana me ya rêxistinî ya li Swêdê derxin. Gelo, divê em kurdên penaber li Swêdê li ser bingeha muşterekên xwe yan jî li ser bingeha cudabûnên xwe rêxistin ava bikin? Pirsêk ne di cî de xuya dibe! Ji ber ku, bersîveke xweser (spontan), li gora gelek kesan ew e ku "li ser bingeha muşterekên xwe ava bikin". Û rast e. Lê ne bi tenê ew rast e. Kurd dikarin û divê li ser bingeha cudabûnên xwe jî, eger pêwîstî bibînin, rêxistinên cuda ava bikin. Û rêxistinên wisa jê hene! Ji ber ku her cudabûn, bingeha xalek muşterek jî ava dike. Weke nimûne, berjewendiyên mamosteyên kurd û tacîrên kurd ji hev cuda nin. Ciwan û jin xwediyê pirs û berjewendiyên cuda nin. Liberal û sosyalîst xwediyê hêjahiyên cudanin. Loma jî, pir tabîî ye û pêwîst e jî, mamosteyên kurd yan jî liberalên kurd xwe birêxistin bikin, da ku bikaribin pirsên xwe çareser bikin yan jî bigihîjin armancên xwe.

Lê, pirsê me ya bingehîn, di şexsê

FKKS de birêxistinbûna kurdên li Swêdê ye, ne bi tenê birêxistinbûna mamosteyên kurd, liberalên kurd, jinên kurd yan jî perçeyên din yên civata kurd li Swêdê ye. Loma jî dema mirov bibêje, "EM KURD" û li ser birêxistinbûna kurdên li Swêdê dest bi axaftin yan jî nixandinek bike, wê demê bersîva "ME" ya ji bo pirsê li jor hate kirin, divê weha be; "EM KURDÊN PENABER YÊN LI SWÊDÊ DIVÊ LI SER XALÊN JI BO ME HEMÛYAN MUŞTEREK IN XWE BI RÊXISTIN BIKIN". Bersîva min bi xwe jî, wekî kurdek, ne wekî mamosteyek kurd, wisa ye.

FKKS, wekî ku tê zanîn, yekîtîya komeleyên kurd li Swêdê ye. Ango, endamên FKKS ne ji şexsan lê ji komeleyan pêk tê. Ev yekîtî, yekîtîyek azad e û komeleyên cuda bi xwe di kongreyên xwe de biryar girtine ku bibin endamên FKKS. Bi vî awayî, komeleyên ku endamên FKKSê nin, dengên xwe li seranserê Swêdê kirine yek û temsîlek neteweyî di şexsê FKKSê de anîne wucûdê. Bi gotinek din, FKKS, bersîva pirsên ku, li ser birêxistinbûna kurdên li Swêdê, bi gotinên "EM KURD" dest pê dikin e.

FKKS û komeleyên endamên FKKS redkirina cudabûnan me ye û erêkirina xalên me yên muşterek e. Loma jî, FKKS, ne alternatîfa ne jî astenga li hem ber rêxistinên ku li ser bingehên cudabûnên me hatine avakirin. Her awayek birêxistinêbûnê ji bo me kurdan xwedî cîh, mane û fonksiyonek cuda ye. A giring ew e ku, mane, cîh û fonksiyona her awayek rêxistinên kurdan ji bo endamên wan û ji bo civatê zelal bin.

* Ev nivîs li ser bingeha materyalên ku min ji bo semînera "Komele pêwîst e ya na?" li Komeleya Kurdistan Li Eskilstuna, amade kiribû hatiye nivîsandin û dê hejmarên pêş de dom bike.

Du rojên hêja û dagirtî



Seyran Duran
Seroka YJK ê
jin@kurdiskarf.org

Pîştî ku me proja xwe ya li ser sihhêt û nexwêstiya Jinan ” Kvinno hälsa och sexualitet” peşkêşî Folkhälso Institutet kir, li ser gelek gotin hatin gotin!

Gelek normal e ku di despêka karekî de rêxne û spekulasyon çêbibe.

Dive mirov bêhnfireh be û benda êncamê bisekîni !

Dema me îlana qursa ku li 20-21/Oktobre li Nynäsgårdê çêbû, kir, me ji bo çil kesan cî veqetandibû. Lê li gorî daxwazî û muracaata jinên kurd, em mecbur man ku kontenjana xwe bikin heştê. Ew dide xûyakirin ku me bi rastî jî ji bo pewîstiya jinên kurd projeyek di cî de tespît kirîye! Divê em ji rastiya xwe ne tirsîn !

Di roja 20ê Cotmehê di saet 8.30 de li city central ê şêst jinên kurd hazir bûn . Bi du bassan em çûn Nynäsgårdê . Yen mayin jî ji bajarên nezîk wek Uppsala, Eskistuna , Västerås û Gävle hatin.

Heştê jinên kurd; ji çar beşên Kurdistanê , bi nêrîn û pirsên guhartî salona konferanse dagirtin! Roja yekemîn Dr.Simal Çeliker, zanî û tecrubeyên xwe bi du zimanan (swêdî - kurdî ”kurmançî-soranî”) li ser nexweşiyên jinan agahdarî û bersivên pirsên beşdaran da.

Di van du rojan de kesên besdar

wext dîtin ku pirsên xwe yê taybetî jî ji Dr. Simal Çeliker re bêjin.

Ez dixwazim li ser nava Komita Kargerê YJKê bo Dr.Simal Celiker re sipasîyên xwe yen taybetî peskes dikim. Bi rasti Dr.S.Çeliker bi zanebûn û alaqa-teke mezin van du rojên me dagirt!

Cardin hukukzana me Dewrim Nujen jî li ser rewşa keçên ciwan rawest û li gor tecruben xwe û li gor mafê insanî nêrînên xwe pêşkêşî civînê kir.

Seroka Terafemê Bernedita Nunez, li ser rewşa jinên penaber, ledan û tecavuzan jinan agahdarî da.

Avûqat Ann-Catrin Bark jî li ser heq û hukukên jinên Swêdê agahdarî û bersivên pirsên beşdaran da !

Ji Länstingen ê ji lekolinera Lena li ser nesaxîyên cinsî agahdarî da.

Pistî rojêk wehe dagirtî , gruba muzikê Hassen Melle û Cudî bi muzikên xwe ve şewa me geşkirin. Her kes keyfxwes û rehet bû.

Roja duyemîn; li ser ” em ê çava bikaribin alikariya ciwanên xwe, û bi taybetî jî keçên xwe bikin” şeş grubên kar hatin hîlbijartin û wan di navbera xwe de munaqase kirin û rapora xwe pêşkêşî beşdaran kirin.

Li gor raporên van ses gruban, ew êncam derket ;

1- Divê em bi zarokên xwe re wek heval bin. Dîalogek baş di navbera me de hebe.

2- Divê bawerî û hêjayî bidin zarokên xwe (keç) hem ew bi xwe bawer bin hem jî em ji bawer bikin!

3- Wextê ji bo zarokên xwe veqetînin û bi problemên wan re alaqeder



Dr. Şemal Çeliker (rismê li jor) û ji Institut Folkhälso Institutet Marianna Buzaglo beşdarî konferansê bûn

nîşan bidin.

4- Hevalên wan nas bikin û li dibistanan de beşdarê çalakiyên wan bibin !

5- Em dayikên kurd divê alikariya hewdû bikin û kontrola civakî biskinin!

Ez bawer im ger em gor van noqteyan bimeşin , em ê serkeftî bibin û em ê bikaribin alikariya ciwanên xwe bikin.

Ez dixwazim bejim, bi rasti pewîstiya ciwata me bi qursen vê awaye hene.

Bi vê awayê em ê bikaribin hewdû baştir fahm bikin û alîkar bibin.

Di dawiyê da dixwazim ji bo wan rojen serkeftî sipasê mamostan, berpirsbara projê Sukran Baksi, ji bo hevalên endamen komita kargerê YJK ê ku bi harmoniyêk bas kar navxwe de par kirin û ji bo heştê jinên kurd ku bi besdari û nerînên xwe ve rojên me dagirtin!

Em bi hew re xurttir û çalêktir in !

Konferansa li ser "seksualîte û nexweşîya jinan"

Yekîtîya Jinên Kurdistanê li Swêdê, li ser nexweşîya jinan konferansek li Stockholmê pêk anî. Ji 80 zêdetir jinên Kurd beşdarî konferansê bûn. Babeta konferansê ji bo jinên Kurd babetekî gelek balkêş bû. Jinên Kurd dixwestin bersîva gelek pirsan di wê konferansê de bibînin. Her jina ku beşdarî konferansê bûbû, xwe di babeta konferansê de didît û tiştekî ji konferansê wegirt.

Konferans ji bo YJKê jî gelek girîng bû. Ji ber ku xebatên

ku xizmeta hewcedarîyên rojane ya jinan dike, dikare zêdetir bala wan bixşîne ser xwe ku jinan bi xurtî li dora rêxistina xwe kom bike û jin xwedî li rêxistina xwe derkevin. Ji bo xwendevanên me di derheqê konferansê de zêdetir agahdar bin, endama Komîteya Karger ya YJKê Sevgî Yildiz, bi gotarbêjê konferansê Dr. Şemal Çelîker û bi beşdarên konferansê ji seksiyonên jinan ya Komeleyên Kurd, Şukrîye Baksî, Saîme Bîçîmlî, Rûken Misto û Nesrîn Kiliçaslan re hevbevyînek çêkir. Em vê heypeyvînê pêşkêşî xwendevanan dikin.

Redaksiyon

"Wekhevî pirê caran şaş tê femkirin"

"Wekhevî pirê caran şaş tê femkirin. Ez ne bawer im ku jinên Kurd wekhevîye wek jinekî Swêdî bifikire. Wekhevîya ku jinên Kurd dixwaze ne firaq şuştin û karê malê ye. Jina kurd, dibêje ku gava ez kar dikim divê mêrê min pê bizanibe û hurmet nîşan bide, qedirê karê min bigrê ku ez du caran ji wî zêdetir kar dikim."

Sevgî Yildiz : Tu di derheqê YJKê de çi dizanî ?

Şemal Çelîker: Ez dizanim ku YJK berê wek komele bû, paşê fireh bû û bû Yekîtîya Jinên Kurdistanê. Jinên me ji her çar perçeyên Kurdistanê tê de cîh digrin û kar dikin.

YJK li gor rewşa xwe karên baş kirine û dikin. Wek civîn, semîner, konferans û agahdarî ji bo jinan. Tiştekî min hez kirîye di YJKê de ev e ku pirsan jinan wek çerçewa ailê de dîtîye, ne tenê

wek femînîstîya Ewropa ku ez bi xwe li dijî femînîstîyê me. Ez bawer im ku ji bo jinên Kurd ev pir girîng e ku pirs û problemên jinan di kultura kurdî de di çerçeweya ailê de bimîne. Ne ku wek pirsan jin û wek femînîstekî hişk li berhemê mêra be. Ez dijî dijberîya mêra me. Loma ez wê tiştî pir hez dikim ku mirov pirsan jina di çerçeweya ailê de bibîne û bi hev re hal bike.

Şukrîye Baksî: Gava ku komele hat damezrandin, ji wê rojê vir de ez tê de me heta îro, eva bû nêzîkî 20 sale ku ez endam im û kar dikim. Wextek rewşa YJKê zêde ne baş bû lê niha wek ez dibînim îro du roje li vê derê semînerêkî pir bi rêk û pêk hate çê kirin û pir xweş derbas bû. Ev tiştekî girîng e. Em wek endam dixwazin her tim çalakîyên weha çê bibin, ji ber ku tiştekî girîng e.

Saîme Bîlîci: Ez rastîyê bibêjim, YJK di salên çûyî de tiştekî zêde neda. Ji ber wê jî min zêde elaqe nîşan neda. Lê ev çend salên dawî pir çalakî û xebatên baş dikin. Gava ku ez van karên wan yê baş dibînim, ew jî min wek jineke kurd li Ewropayê gelek kêfxweş dike.

Rûken Misto: Ez gelek tişt dizanim di derheqê YJKê de. Min demekî di Komîteya Karger ya YJKê de kar kir. Demekî gelek bê deng man, me got belkî wê xelas bibe. Niha bi rastî jî ber xwe didin, yanî têdikoşin û pir tiştên baş dikin. Ez gelekî kêfxweş im ku di warên weha de serketin. Ji ber ku YJK pêvîstîyekî mezin e ji bo jinên Kurd li Swêdê. Di bin şemsiya YJKê, di konferans û civînan de hatina ba hev, têkilîyekî baş, bawerîyekî xurt û germahîyekî di nav jinan de çê dike. Ev pêvîstîyekî mezin e.

Nesrîn Kiliçaslan: Ez dizanim ku YJK çend sale heye û çalakîyên baş dike. Ez jî dixwazim di demekî kin de, beşdarîya çalakîyên wan bibim. Ji ber ku karên baş dikin.

Sevgî Yildiz : Tu ji kîjan komelê û ji kîjan seksiyona YJKê yî?

Şemal Çelîker: Ez wekî endameka aktîv nebûme, lê em wek malbat endamê federasyonê ne. Çalakîyên min di seksiyona Jinan ya Komeleya Vesterosê de ye.



Şukrîye Baksî: Ez endama Komeleya Kurd li Spongayê me û her weha di komelê de seroka seksîyana jina me. Ez dixwazim beşdarî hemû çalakîyên YJKê bibim, çiqas ji min bê, tenê ez ne nexweş bim. Ez hemû karên xwe dihêlim ji ber ku beşdarî kar û barên wan bibim. Her tim nav de bibim û ezê nav de bibim, heta ku sax bim.

Saîme Bilicî: Ez endama seksîyaona jinan ya Komeleya Stockholmê me.

Rûken Misto: Ez endama seksîyona Komeleya Kurd li Stockholmê me.

Nesrîn Kiliçaslan: Ez endama seksîyona Komeleya Kurd li Spongayê me.

Sevgî Yildiz : Têkilîyên te bi YJKê re çiqas heye û tu çiqas beşdarî çalakîyên YJKê dibî?

Şemal Çelîker: Têkilîyên min wek şexsî bi endamên aktîv re hene. Ez li Vesterosê demekî di komîteya jinan de bûm. Lê mixabim ji ber karê min yê pîrîvat, zêde wextê min çê nabe û ji ber wê jî min nikarîbû di komîteyê de berdewam bikira. Lê li gor wextê xwe ez beşdarî civînan bûme û dibim.

Şukrîye Baksî: Ez di her awayîyê de, beşdarî hemû çalakîyên YJKê bûme. Ji roja damezrandina komelê heta niha ez tê de me. Di Komîteya Karger, Komîteya Çavdêr û di seksîyonan de min pir caran cî girtîye û aktîv kar kirîye.

Saîme Bilicî: Weka ku min di destpêkê de jî got, yanî heta niha tiştekî girîng, tiştekî nedihat kirin. Ji ber wê jî cîlaqa min bi wan re tunebû. Lê niha bi

rastî jî kar û xebatên gelek girîng dikin, ew jî fedekarîyekî mezin e. Ji ber van karên dawîyê, ev karên xweş, bi çî ewayî alîkarî bixwazin ez amade me, alîkarîyê bikim. Ez ji ber karê min yê şexsî, di komîteyan de nikarim cî bigirim. Lê çî alîkarî bixwazin ez amade me.

Rûken Misto: Ez li gor wextê xwe, beşdarî piranîya çalakîyan YJKê dibim. Ji ber karên min şexsî pir caran wextê min çê nabe. Lê ez hewil didim ku beşdarîya çalakîyên YJKê bibim.

Nesrîn Kiliçaslan: Gava ku çalakî çê dibin, beşdarî piranîya wan dibim.

Sevgî Yildiz : Te babeta semînera îro çewa dît?

Şemal Çelîker: Min gelek baş dît û ez hêvî dikim ku YJK hewil bide ku civînên weha hîn ferehtir ji bo malbatên Kurd bike. Di civînên weha de divê mêr û ciwan jî beşdar bibin. Ji ber hînek sebebên kultura swêdî û ya kurdan, di nav malbatê de yanî di navbeyna zarok û dê û bav de nakokî çê dibe. Problemên weha divê bê munaqesekirin ku em bikaribim çareyekî jê re bibînin. Semîner û konferansên usa dikare pir bi rehetî hal bike, yan jî kêr bike. Bala min gelek kişand ku hewcedarîya jinên me bi taybetî bi semînerên usa heye. Ew jî ji bo min tiştekî pir întiresant û girîng e. Bi taybetî di warê tîbî de, ji bo wan gelek girîng e ku bi zîmanên wan agahdarî bê dayin. Girîng e ku mêr jî beşdarî civînên weha bibin û bibînin ku jin çî dixwazin. Bila mêr nefikirin ku gava jin têne ba hev û dijî mêran xeber didin. Ne usa ye. Jinên kurd dixwazin di mala wan de, diyalogekî baş û hizûr hebe û her usa bi xwe

jî wek însanekî bê qebûlkirin û xwedî mafê xwe be. Di kultura me de zehmetî ew e ku mêr jinan wek xwe nabînin. Wek beşek ji civatê û wek beşek xwedîyê maf nabînin. Problemên ku di kultura me de heye ew e. Di semînerên weha de mirov rê dide ku jin vî tiştî bînin zimên û bêjin ku çî dixwazin û mêr jî li wir bin û wan guhdarî bikin. Her usa di navbeyna wan de diyalogek çê dibe û meriv ji hev û din bêtir fem dike. Divê mêr bizanibin ku ka daxwazîyên jinên kurd çî ne û ew ê bi çî ewayî bikaribin daxwazîyên wan bînin cî. Wê çaxê di malbatê de huzûrek xweş çê dibe û tesîrê civatê dike.

Wekhevî pir caran şaş tê femkirin. Ez ne bawer im ku jinên kurd wekhevîye wek jinekî swêdî bifikire. Wekhevîya ku jinên kurd dixwaze ne fîraq şuştin û karê malê ye. Jina kurd, dibêje ku gava ez kar dikim divê mêrê min vî bizanibe û hurmet nîşan bide, qedrê karê min bigrê ku ez du caran ji wî zêdetir kar dikim.

Şukrîye Baksî: Tiştekî pir baş û girîng bû. Her usa jî gelek bi rêk û pêk derbas bû. Mirov dikare firehtir bike û

YJK

Yekîtiya Jinên

Kurdistanê li Swêdê

Postadress

Box 15218

104 65 Stockholm

Adresa sêrîledanê

Henriksdalsringen 6, Nacka

Tel: 08-642 21 55

Fax: 650 21 20

e-post

jin@kurdiskarf.org

info@kurdishwomen.net

www.kurdishwomen.net



Şemal Çeliker:

"Min konferansê gelek baş dît û ez hêvî dikim ku YJK hewil bide ku civînên weha hîn ferehtir ji bo malbatên Kurd bike. Di civînên weha de divê mêr û ciwan ji beşdar bibin."

bi giranî were baştir dibe. Ez dixwazim civînên weha berdewam bike û ciwanên me ji beşdar bibin.

Saîme Bilîci: Konferansa li seksualîte û nexweşîya jinan, konferansêk pir girîng bû ji bo jinan. Dr. Şemal tiştên pir girîng anî zimên. Ez dixwazim konferansên weha hîn xurtir û firehtir bên çê kirin.

Rûken Misto: Gelek baş û girîng bû. Ji ber ku bi hev re axaftin, hev û din naskirin bawerîyekî çê dika di navbeyna jinan de û mirov baştirt ji hev û din fehm dika. Di konferansên usa de nêrînen meriv bêtir dibe. Em dikarin bêtir alîkarîya hev û din bikin, wek jin, zarok ciwan û bi kurtayî wek malbat.

Nesrîn Kiliçaslan: Gelek başbû ku jin bi hev re rûniştin û her tişt bi hev re, bê tabû û bê şerm axaftin. Bi pêşniyarên girîng û fikrên xwe pir bi zelalî ji hev ra gotin.



Rûken Misto:

"Gelek baş û girîng bû. Ji ber ku bi hev re axaftin, hev û din naskirin bawerîyekî çê dika di navbeyna jinan de û mirov baştirt ji hev û din fehm dika. Di konferansên usa de nêrînen meriv bêtir dibe."

Sevgî Yıldız: Li gor te YJKê divê di kar û xebatên xwe de giranî bide kîjan babetê?

Şemal Çeliker: Agahdarî dayin di nav malbatê de. Diyalog çêkirin di nav jin û mêrandamên malbatê de, ji bo min ev gelekî girîng e. Ji ber wê jî di semînerên usa de ne tenê jin, divê mêr jî beşdar bibin ku diyalog çê bibe û bikaribin bi hev re xeber bidin, bidin û bistînin ku ji probleman re bi hev re çare bibînin.

Şukrîye Baksî: Giranî bidin ser ciwanan, zarok û malbatên ku belavbûn tê de çê dibe. Em herin wek YJK hewil bidin û alîkarîya wan bikin di her awayîyê de. Em bikaribin alîkarî bikin ku jin û mêr ji hev vengetin. Li gor quwet û îmkanên xwe alîkar bin. Semînerên weha divê firehtir û pirtir çê bibe. Ewê tesîrekî pir mezin li ser jinan bike. Ew ê pirtir kes beşdarî kar û barên YJKê bibin û emê pirtir pêşve herin.

Saîme Bilîci:

"Konferansa li seksualîte û nexweşîya jinan, konferansêk pir girîng bû ji bo jinan. Dr. Şemal tiştên pir girîng anî zimên. Ez dixwazim konferansên weha hîn xurtir û firehtir bên çê kirin."

Saîme Bilîci: Girîngîyê bide ser zarok, jin û ciwanan.

Rûken Misto: Ji bo pêşketina jinan li gor min her tişt girîng e. Girîngîyê bidine ser jin, zarok û ciwanan.

Nesrîn Kiliçaslan: Ev babeta îro, bi rastî jî ji bo jinên me babetekî pir girîng bû. Ez dixwazim ev babeta berdewam bike. Ji ber ku pêvîstîyekî gelek girîng e ji bo jinên kurd ku li Ewrûpaya dijîn.

www.kurdishwomen.net

jin@kurdiskarf.org

info@kurdishwomen.net

Nav: Kerîm Husamî, **Kengi hatiye Swêdê:** 1986, **Temenê wî:** 80, **(di 6.10.2001ê de wefat kir)** **Mesleg:** nivîskar, **Li kuderê dijî:** Stockholm û li vir defin kirin, **Malbat:** Zewicî û bavê du zarokan e, **Parola wî:** "Xebat, xebat û dîsa xebat"

"Xerabî ne tenê ji dagirkeran e, kurdan bi xwe jî xerabî bi xwe kirine"

Azîz Aliş

Yek ji têkoşerê kurd Kerîm Husamî di 6ê Cotmeha 2001ê de li Swêdê çû ser heqîya xwe. Ev nivîsa ku min teqrîben berî salêk nivîsandiye bawerim di derheqê wî nivîskar û siyasetmedarê me de hinek agahdarî bide xwendevanan û bi taybetî jî xwendevanên bakur.

Di 02.09.2000 de civîna Komîteya Giştî ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê pêkhat. Yek ji xalên rojevê, "Mêvanê Federasyonê" bû.

Min bixwe meraq kir, da ew mêvan kî ye. Berîya ku civîn biqede, min dît ku kek Kerîm Husamî hate hundir û bi bêdengî li ser kursîya li ber derî rûnişt.

Pistî çend deqîqeyan, serokê Federasyonê Keya Izol axaftinek kurt kir û got:

-Hevalên hêja, îro mivanekî me yê pîrr azîz heye. Ez bawer dikim hûn hemû wî nasdikin. Mêvanê me kek Kerîm Husamî ye. . . fermo kek Kerîm. Kerîm Husamî hêdîka jî ci yê xwe rabû û li kêleka Keya' Izol rawestîya. Keya axaftina xwe domand:

- Nuha kek Kerîm Husamî 80 salî ye. Wî 60 salên xwe daye xebata siyasî û kulturî. Em, ji bona van xebatên hêja, wî pîroz dikin û van gulana pêşkêşî wî dikin û her weha ji wî re jîyaneke xweş hêvî dikin.

Kerîm Husamî: Ez sipasî Federasyona Kurd dikim. Hêvîdar im xebatên we

yên pîroz evê her berdexam be. Birastî FKKSê gellek xebatên hêja kirîye. Ez jî, ji bo xebatên we yên hêja, we pîroz dikim û sipasî we dikim ku we min di bîra xwe de anî. . . Şaîrekî azertî hate bîra min. Navê wî Shehrîyan e. Yek ji xelkê wî, ji yekî din re dibêje: - Eger ev saîrê mezin bimre, emê çî bikin? Wa ye ji birçîna dimre. Yê din bersiva wî dide, - De biçê alîkariya wî bike, ji bo ku nemire.

Ez 80 salî me. Ji bo wê jî bîrhatinên awa, ji bo min bexterîyeke mezin e.

Min di nav PDK-Î xebata siyasî kirîye û herweha di Komara Demokrat de jî cîhê xwe girt. Ez yekemîn kes im ku, di radyoya Moskovayê de bi kurdî axifim. Min hem li Tehran û hem jî li gel-

lek herêmên Rojhilat, bersiveyari û fermandari kiriye. Gellek serpehatiyên min hene, lê di jiyana xwe de tu carî salên xwe yên di zîndanê de ji bîr nakim. Sê sala di zîndanê de bûm. Di nabêna wan hersê salan de bavê min, jina min, dûvre diya min û pistî demek kurt ji xuşka min mir. . . (Hêsir di çavê wî de tijî bû, girî kete qirikê. . . nikarîbû bipeyîva. çend deqîqe bêdengîyek bû. . .) Bîbûrin. . . mirov nikare ji bîr bike.

Gava ku ez hatim Ewrûpayê, min dîsa cihê xwe di nav bizava xebata kurd de girt. Lê, li gor bawerîya min karê Federasyonê kirîye, ji xebatên min zêdetir e. Ji bo wê jî, cihê şanazîyê ku dezgehêk wisa girîng bangî min dike û 60 salên têkoşîna min bibîrtînin û pîroz dikin.

Yek ji endamê KK mafê axaitinê wergirt û got:

- Ev bû 22 sale ku ez kek Kerîm dinasim. Wî, li hemberî zordariyê serê xwe netewandîye û xizmetên pîroz ji bo gelê kurd kirîye. Hêvîdar im temenê te dirêjtir be û pênuşa te raneveste.

Endamekî din yê KK jî weha got:

- Eger em gihîştîbin qonaxekê, ew jî ji tesîr û xebatên we yên hêya ye û me ji xebatên we ders wergirtiye.

Kerîm Husamî: Sipasî we dikim. Bi rastî di demên berê de çî xeletiyên me çêbûye divê em bêjin ku me xeletî kiriye û em rastîya xwe ya îro baş bibînin. Amensty International di broşûra xwe ya 400 rûpelî de dibêje ku; "xerabî ne jî dagirkeran e, kurdan bi xwe jî xerabî bi xwe kirine."

Kurd, tişteki wan tunebû. Her bê desthilatdar bûn û di nav listikên dagirkeran de diçûn û dihatin Îro jî di nav listikên dewletên rojava diçûn û tên. Rewşa me ev e. . . em çî bikin. . . gava kurd ne desthilatdar be, ewê çî bikin.

Endamehekî din: Mamoste, Komara demokrat hate rûxandin û ev rûxandîna tesîrî perçeyên din jî kir. Gelo beşê başûr bi sernekeve û were rûxandin, ewê careka din gelê kurd bikaribin ku



Kerîm Husamî

Rojbûn: 1921(6) li gundê Bayram, navçeya Mahabad

1946: Beşdarî avakirina Komara mahabad bû

1961: Çû Çekoslovakayê

1964: Çû Bulgaristanê

1971: Bû endamê Polit Buroya PDK-Iranê

1983: Him ji Partiyê istifa kir him jî terka welêt kir.

1986: Hat Swêdê.

1987: Bi Cemşid Heyderî re rojnameya **"Serdema nû"** derxist. 54 hejmarên vê rojnameyê derket.

Niviskarî: Li gel gelek nivîsan bi tevayî 44 kitêbên wî (tevî kitêbên wergêrê) hatine çapkirin.

Tarîxa mirinê: 6.10.2001

Goristan: Stokholm-Swêd

bibine xwediyê fersendek weha ?

Kerîm Husamî: Bawer nakim, belkî êdî hiç nebînin. Lê Xwedê neke, îşallah Başûr narûxe.

Endamekî KG jî pirsek awa kir:

-Ji bo min Kerîm Husamî dîrokek zîndî ye. Gellek tişt hene ku em ji te fer dibin. Pistî ku Qazî Muhammed hate girtin, hin kesan gotin ku ew çû teslîm bû û poşimaniya xwe aniye zimên. Gelo ev tişt rast e ?

Kerîm Husamî: Na, ne rast e. Qazî Muhammed tu carî poşiman nebû. Wî nexwestîye tahrîbatên mezin li Mahabadê bibe (wêran ne be). Her weha wî

nexwest xwina kurda zêde bete rijandin. Ew mêrxasekî weha bû ku, wî bixwe dikarbû kursîya di bin lingê xwe bikêşanda. Mebesta min ji vêya, Qazî Muhammed bêtirs bû û xwedî cesaret û pîr zîrek bû.

Ji Jinake endam: Li ser pîrsa jinan tu çî difikirî?

Kerîm Husamî:

-Jinen kurd wefakar in û zebatkar in; le rêzî bo wan nehatîye girtin. Ew jî xeletîya jinan e. Divê ew têbikoşe. Eger jin azad ne be, kurd jî azad nabin..

Kod û sergêjîyên wê

Faris Marsil
Berbang@kurdiskarf.org

Ji ber ku gelek caran avayiya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê hatiye şelandin û kompitor û gelek tiştên wê yên din hatine dizîn, birevebirên Federasyonê tedbîr standine ku îcar avayiya xwe ya nû alarim bikin û kesên ku pêwîst pê dîtî-nê li gel mufteyek, kodeke alarmê jî bidin wan. Sîrrê alarimê ew e ku divê wexta meriv derî veke alarimê ji dewrê derxîne û wexta derî bigre jî alarimê bixewre. Hele ew kesî/a ku bê Federasyonê veke û di nava deqîqeyekî de bi koda xwe alarimê ji dewrê dernexe, alarim dike fîke fîk û polîs di nav çend deqîqeyan de tê çiyê fîke fîkê.

Wê rojê hevaleka wezîfedar ku hatibû Federasyonê û bi mifta xwe derî vekiribû lê di nava deqîqeyekî de koda wê nehatibû bîra wê ku alarimê ji dewreyê derxe, alarim kiribû fîke fîk û di tavilê de polîs hatibûn. Xeynî polîs îfadeya wê bigrin, 3500 Kron jî cezayê pere dabûn Federasyonê. Ji bona ku koda wê nehatibû bîra wê û koda ku meriv çawa alarimê jî bisekinîne nizanibû ev tişt hatibû serê wê. Herweha reqamên telefona Federasyonê ya nuh jî sergêjîyê

peyda dike, em yên ku li Federasyonê kar dikin gelek caran di şûna ku bêjin 644 66 22, em 4 reqamên wê yên dawiyê tevlihev dikin, em dibêjin 644 22 66.

Êdî kod û reqem bûne parçayekî jiyana me ya rojane. Ez bixwe çend caran bûme şahidê wê yekê ku ji ber van kodan gelek kes problem jiyane. Ev problem ne tenê problemê alarim û polîs in, problemê cuda ne.

Yek ji wan şahidbûna min ew e ku wê roje di dora bankomatê de mêtîkî navsalî jî ber koda xwe ya bankomatê sê caran li ser hev bi xeletî lêxist, cara sêyem bankomat karta wî paşde neda. Dîsa ez carek rastê kurdekî hatime ku ew cuzadanê xwe wenda kiribû û koda bankomatê ku banka daye wî, ew ji bo vê kodê bîrva neke wê jî kiriye bêrika cuzadanê xwe. Bi vî hawî him mêtîkî jî cuzdan û pereyên di cuzadanê xwe de û him jî pereyên ku di bankomata wî de hebûye, bêpar maye. Camêr digot; "êdî em li vir bi kodan dijîn evqas kod hene ku ez gelek caran jî bîr dikim ji bona wê jî min koda karta bankomatê xistibû bêrika cuzadanê xwe û tu carî nehatiye bîra min ku ez ê rojekê cuzadanê xwe wenda bikim yan jî diz ji min bidizin."

Dîsa wê rojê ez çûm mala hevalekî

ku deriyê wî yê avayiyê bi kod e. Ev kod jî pirê caran ji çend mehan carek tîn guherandin. Mêtîkî ixtiyar ku di wê avayiyê de dijiya -bêyî ku haya wî jê hebûye ku koda derî hatiye guherandin -beriya min çend caran li kodê xistiye da ku derî veke, lê derî venebiye û telefona wî ya mobîl jî girtî bûye û pinkoda telefonê nehatiye bîra wî ku telefona xwe veke da ku telefonê xanima xwe bike jê koda derî bistîne.

Dîsa wê rojê hevalekî ku çenteyê "Jemis Bond" bi kar danî, koda wê ji bîr kiribû û nikaribû çenteyê xwe veke, mecbur ma ku bi awayekî din çente veke û ewrakê xwe jê derxîne.

Carek tirimbelek yekî hatibû dizîn û ewrakên erbeyê di hundirê wê de mabûn, ew telefonê polîs kiribû daku ji polîs re buyerê bêje, lê wexta polîs jê pirsîye plaqeya erebaya te çi ye? Mêtîkî kiriye, nekiriye -belkî ji heyecanê beplaqeya areba wî nehatiye bîra wî ku ew ji polîs re bibêje, ew tenê reng û markeya eraba xwe jê re gotiye.

Ez gelek caran rastî wê yekê hatime ku hin kesên xwediyê telefonên mobîl reqamên telefona xwe jibîrkirine, û di hafîzeyê telefonê de jî nenivîsandine ew bi saya hevalekî xwe yê din ku reqamê telefona wî li cem bûye, fêrî reqama telefona xwe bûye.

Ez bûme şahidê wê yekê ku havalekî kompîtorê xwe kodkiriye lê piştî çendeyek koda xwe jî bîr kiriye û nikaribûye kompîtorê xwe veke, mecbûr maye bangî yekî ku şarezayê kompîtorê ye kiriye ew hatiye kodên wê ji dewreyê derxistiye.

Ez rastî wê yekî hatime ku gelek caran kodên înternetê xwe wenda kiriye û hergav telefonê şîrketa ku ew aboneyê wê yê înternetê ye koda xwe ji wan pirsîye û bi vê hawayî ketiye înternetê.

Ez rastî yekî hatime ku ji bona benzîn bike erbeya xwe, karta xwe kiriye sîstema benzînê, lê koda wî nehatiye bîra wî ku lêxe û benzîn bixewre depoya erebaya xwe û bi vî hawî aciz bûye, çû-



ye û karta benzîna xwe jî li wê ji bîr kirîye.

Dîsa ez rastî wê yekê hatime ku carekî yek di dora kirînê de xwestiye bi korta xwe ya supermarketa ICAYê kirîna xwe bike, wexta karta xwe daye kasiyer, koda wî nahatiye bîra wî ku lêxe daku hesabê xwe bide bi vê awayê di dorê de "kaos" peyde bûye.

Kod, kod û kod. Êdî bê kodan meriv nikare jiyana xwe ya rojane bidomîne. Li welatên pêşketî kod bi huviyeta însên dest pê dike. Di welatekî wek Swêdê de 10 şifreyên ku nasnameya meriv deşîfre dikin, têra her tiştî dike. Ji van 10 reqeman 2 reqem ji wan yên sal, 2 reqem yên meh, du reqem jî reqamên roja rojbûna merivan pêk tê. 4 reqamên din jî aliyê dewletê ve didin merivan. Ku malbatek ji 6 neferan pêk

bê, divê mezinê wê malbatê kodên hemû malbata xwe bizanibe da ku di jiyana rojane de îhtiyacên resmî yên xwe û zarokên xwe bimeşîne. Herçiqaqas yên me kurdên navsalî meh û rojên rojbûna me or û or in û ev hinek karê me hêsan bike jî, lê 4 reqamên me yên dawiyê yan jî hin kodên me yên şexsî ku **8978, 9879 û 8798** hwd.bin divê em wan bi awayekî ezber bikin!!

Yanî bi pêşketina teknîk û teknolojiyê ve hafizeya însên bi kod û şifreyan ve tîn dagirtin, bê wan însên nikare jiyana xwe ya rojane bidomîne. Kod sergêjîyekî mezin derdixin, divê teknîk û teknolojiyê bîy ku kodan meriv bi kar bîne jê re çareyeke peyde bike. Yên ku hafiza wan lawaz in û li hember reqaman "bêçara" ne û gelek "kartan" bi kar tînin way ji wan û halê wan re!

Pîrozbayiya 56 saliya Komara Mahabadê

Tarîx : 19.01.2002

Cî: Solana Hallen-Stockholm

Seet: 18.00

Hunermendên beşdar:

Nasir Rezazî

Qadir Ilyasî

Erdelan

Qadir Qurbanî

Grûba Hunerê Lawanê

Demokrat li Swêd

Amadekar:

Hevkariya Hêzên Kurd û

Kurdistanê li Swêdê

-Hevkarî-

Sersaxî

Ji ber wefata welatperwerê
kurd

Mecidê Haco

em sersaxiyê ji malbata wî re
dixwazin

Mumtaz Aydin, Selim Bakaç,
Alî Çiftçi, Nihat Elî, Keya İzol,
Mahmut Kîper, Mahmûd Le-
wendî, Faris Marsil, Faxrî Olçer,
Vildan Tanrikulu

Dîroka 20 salîya

FKSSê

Amadekar:

Hemîd Gewherî -Kovan Amedî

Swêd welatê komeleyan e, beşekî girîng ya civata Swêdê di komeleyên demokratîk de hatin hundanin û îro ji 200 hezar pirtir komeleyên kulturî, civakî, pêşeyî, spor û yên din henin. Dewleta Swêdê pir bi dilxweşî dixwaze ku pirs û pirsîrêkên civata xwe bi rîya kom û komikên civatê ve guhdarî bike û beşekî mezin yên pirsên civatê bi rîya wan komeleyan ve çareser bike. Ji bo vê armancê, damezrandinê komele û federasyonan xizmetek baş didin.

Yekem rêxistina demokratîk ya Kurd ku li Swêdê hatîye damezrandin, seksiyona Komeleyên Xwedevanên Kurd li Ewropayê (KSSE) bûye. Navenda KSSE yê çardemîn kongra xwe ya sala-wextî di 1-5 / 8 / 1970 î de li Stockholmê pêktîne û di eynî wextê de jî seksiyona xwe ya li Swêdê dadimezrîne.

KSSE piştî têkçûyîna şoreşa Îlonê di sala 1975 î de perçe bû û bû sê beş. Bi navê Yekîtîya Xwendevanên Kurdistanê, (AKSA) û bi navê Yekîtîya Ciwanên Xwendevanên Kurdistanê (YUKSE) hatin damezrandin.

Di sala 1976î de çend endamên AKSA yê, Memo Yetkîn, Mehmet Baksî bi çend kesên din re ji AKSAyê veqetîyan û Komeleya Karkerên Kurdistanê li Swêdê avakirin. Piştî damezrandina Komeleya Karkerên Kurdistanê, gelek kurdên ji bakûrê Kurdistanê, ji KSSE, AKSA û YUKSE yê veqetîyan û çûn

nav refên Komeleya Karkerên Kurdistanê.

Piraniya endamên wê komeleyê, rengên wan yê siyasî nêzîkê PSKê bûn ku wê demê bi navê organa xwe ya merkezi Riya Azadî ve dihate naskirin. Ev rengê PSKê xwe di biryaran de jî dida xuyakirin. Loma endam û hogirên rêxistinê din yê Kurdistanê xwe di kar û xebatê komeleyê de zeif didîtin. Ji ber wê yekê jî ji Komeleya Karkerên Kurdistanê veqetîyan û li gor rengên xwe yên siyasî komeleyan avakirin.

Ew rêxistinê ku navê wan dûra ezê binim ser ziman, piştî damezrandina komeleyên xwe, kar û xebatên xwe lokal dimeşandin, yanî her komeleyekî bi xwe cejna Newrozê pîroz dikir, rengên siyasî di kar û xebatên siyasî, civakî û kulturî de di wan komeleyan de pirtir dihate xuyakirin. Her komeleyekî bi tena xwe li ser navê kurdan peywendîyan bi dezgehên resmî yên Swêdîyan re girê didan.

Karên bi vî teherî di nav penaberên kurd li Swêdê de, wê demê hejmarên kurdan jî ne gelek bûn û ev yeka jî kar û xebatên hevbeş ya komeleyên kurdan zeyif dixist. Evaya jî bi giştî karên kurdan hêsan nedikir û gelek zehmetîyan dida pêş wan. Wê demê her çiqas nav rêxistinê kurdan de nakoyên siyasî û îdolojîyê hebûn jî, lê ghiştibûn wê qeneatê ku yekîtîyêkî demokratîk di nav xwe de pêk bînin. Her usa sîstema karê komelayetîyê li Swêdê, kurdan ber bi yekîtîyêkî weha dikişand. Hinek grubên biyanî ku berî kurdan li Swêdê bi cîh bûbûn, federasyonên xwe ava kiribûn. Ev faktorên hanê, pêvîstîya hewil-

dana kurdan ji bo damezrandina federasyonêkî hîn xurtir dida nîşandan. Êdî pirsê yekîtîya kurdan li Swêdê xwe anîbû ber derê kurdan, lewra bi taybetî berpîrsîyarên rêxistinên Kurdistanê bakur li Swêdê, biryara bi hevra karkirine dan. Piştî roan civînan li komeleyan û li malan, di navbera sala 1980 û 1981ê de ghiştin wê qeneatê ku ewana jî wek biyanîyên din, ji komeleyên xwe Federasyonê Kurdan damezrînin. Her weku me li jor jî anî ziman, ku berî kurdan, gelek biyanîyên din ku li Swêdê dijîyan, federasyonên xwe damezrandibûn.

Çar rêxistinên siyasî yên kurdan, bi 6 komeleyên xwe ve beşdarîya damezrandina Federasyonê bûn.

Weka ku ji we ve jî xuyaye ku çend rêxistinên me yên siyasî, Federasyonê damezrandin. Armanca rêxistinê ew bû ku di warê demokratîk de temsîla kurdan pêkbînin. Lê şertekî rêxistinê siyasî ya kurdan ew bû ku kar û xebatên Federasyonê, ne li dijî siyaseta wan bin, heta bi wî armancê damezrandin ku hinek ji karên xwe yên muşterek yên siyasî û civakî bi wesîleya Federasyonê bimeşînin. Ya rastî jî, şertên wê demê ya Kurdistanê û penaberên kurd li dervayê welat jî her ewî dixwest.

Kongreya 1 em ya Damezrandina Federasyonê

Komeleyên ku beşdarîya damezrandina Federasyonê bûnin evên li jêr in:

1- Komeleya Çanda Karkerên Kurdistan li Stockholmê (layengirê KUKê bû)

2- Komeleya Kurdî - Swêdî ya Çandî û Kulturî li Stockholmê (layengirê DDKD yê bû)

3- Komeleya Kurdî ya Xwendevanên Pêşverû li Uppsalayê

4- Komeleya Demokratîk a Çanda Kurd li Stockholmê (layengirê Ala Rizgarîyê bû)

5- Komeleya Kurd li Göteborg (layengirê Ala Rizgarîyê bû)

6- Komeleya Karkerên Kurdistan li Stockholmê (layengirê Riya Azadî bû)

Ev 6 komeleyên me her yek bi 3 nûnerên xwe beşdarî kongra damezrandina Federasyonê bûn. Kongre di roja 22.5.1980î de li tunelgatan 14, li Stock-

holmê pêk hat.

Kongreyê, Ahmet Tigrîs wek serokê diwanê û Ferhad şakelî jî wek sekreterê diwanê hîlbijart. Piştî helbijartina diwanê li gor rojevê, munaqêşe li ser destûr û programa Federasyonê hat kirin, pêşniyara destûrê bi dengê giştî hat pesinandin.

Destûra ku di kongreyê de hat pesinandin bi vî awayîye:

1- Navê Federasyonê-

Federasyona Komeleyên Kurdî (KR)

2- Armaca Federasyonê:

A- Federasyon hemû komeleyên kurdî li bin baskên xwe dicivîne. Ev komelena ku ji aliyê penaberên kurdan û ji hemû beşên Kurdistanê pêkhatine. Federasyon bi metodên demokratîk piştgirîya tekoşîna netewî û demokratîk ya gelê kurd dike. Federasyon ji bo peydakirina piştgirîyê ji tekoşîna azadîya gelê Kurd re, civîn û meşan pêk tîne, semîner, şevên piştgirîyê û xebatên din çêdike.

B-Federasyon alîkariya karkeran, xwendevanan, jin û zarokên ku ji Kurdistanê tên dike. Ji bo pirsên wan yê li Swêdê, wek di karê tercumanî û mamostetî de, di dagirtina blankêtan de, di têkilî bi dixtor û awukatan re, alîkariya wan dike.

C- Federasyon ji bo xurtkirina piştgirîyê ji gelê Kurd re, di nav kurd û swêdîyan de kar dike. Ji bo ku bigihîje armanca xwe, komeleyên xwe yê endam jî seferberî vî karî dike.

ç- Federasyon bi tu rêxistinên siyasî ve ne girêdayî ye.

d- Federasyon rêxistinekî demokratîk e, bi organên xwe ve li gor pîrensîbên demokratîk kar dike.

3- Endametî

A- Komeleyên kurdî ku li Swêdê hebin û destûra Federasyonê qebûl dikin û her usa kar û xebatên wan ne li dijî armancên Federasyonê bin, dikarin bibin endam. Komeleyên ku daxwaza endametiye dikin, divê organên wan li gor pîrensîbên demokratîk bîn hîlbijartin.

B- Ji bo ku komele wek endam bê qebûl kirin, divê di kar û xebatên xwe

de bi kêmanî 6 mehên xwe dagirtibe. Divê komele di destûra xwe de daxwaza endametiya xwe ji bo Federasyonê bide xuyakirin. Komeleyên ku dibin endamê Federasyonê, 3 mehên pêşî ya endametiya wan wek ceribandîne ye. Komîteya Giştî li ser endametiya komeleyan biryar dide.

C- Komeleyên endam di karên xwe de serbixwe ne, lê kar û xebatên wan divê li dijî destûr û armancên Federasyonê nebe.

Ç- Komeleyên endam di şertên cuda de, dikarin ji îmkânên aborî û ji hinek îmkânên pratîk yê Federasyonê istifade bikin. Biryara vî tiştî Komîteya Karger dide.

D- Komeleya ku daxwaza endametiye dike, divê bi hindikayî xwedîyê ro endaman be.

4-Kongre

A- Federasyon, kongre ya xwe ya asayî her sal di meha 12an de pêk tîne. Divê komeleyên endam, ji bo wext û cîyê kongrê mehekî berî kongrê bi nivîskî bîn agahdarkirin.

Protokola kongreya damezrandina federasyonê

Komeleyên li jêr beşdarî kongreya damezrandina Federasyonê bûn:

1- Komeleya Çanda Karkerên Kurdistan li Stockholmê

2- Komeleya Kurdî - Swêdî ya Çandî û Kulturî li Stockholmê

3- Komeleya Kurdî ya Xwedevanên Pêşverû li Uppsalayê

4- Komeleya Demokratîk a Çanda Kurd li Stockholmê

5- Komeleya Kurd li Goteborg)

6- Komeleya Karkerên Kurdistan li Stockholmê

Xên ji van 6 komeleyan, çend komeleyên din yê kurdan ku di sala 1980î de hatibûn damezrandin, beşdarîya damezrandina Federasyonê nebûn, lê di kongreya damezrandina Federasyonê de daxwaza endametiye kirin.

Komeleyên ku di kongreya damez-

randina Federasyonê de daxwaza endametiye kirin evên li jêr in:

1- Komeleya Demokratîk a Çanda Kurd li Huddingeyê

2- Komeleya Demokratîk a Çanda Kurd li Botkyrkayê

3- Komeleya Kurdî li Solnayê

Kongre biryar girt ku hîlbijartina organên Fedrasyonê bi dizî be, lê jimartina dangan vekirî be.

Di kongreyê de nûnerên jêrîn xwe ji bo Komîteya Karger dest nîşan dan.

Salih İnce

Nazif Taşçı

Keya İzol

Şerefhan Cizîrî

Eşref Okumuş

A. Melik Mahmod

Ji wan nûnerên namzet pênc kesên jêrîn ji bo Komîteya Karger hatin hîlbijartin.

Salih İnce

Nazif Taşçı

Keya İzol

Şerefhan Cizîrî

Eşref Okumuş

Ji bo Komîteya Çavder jî şêxmus Ceylan, Mustafa Yılmaz û Mustafa Uzun hatin hîlbijartin.

Di kongreyê de li ser 7 pêşniyarên cuda, wek pîrsa perwedekirina bi zimane kurdî, li ser rewşa jinan û pîrsa hêlîna zarokan û yê wekî din, kongre bi tevayîya dangan biryar girtibû.

Biryara dawî ya kongreyê ew bû ku Federasyon, kongreya xwe ya sala bê di meha 12 / 1981 î de bicivîne. Ji bo wext û cîyê kongreyê, wê Federasyon komeleyên xwe yê endam, mehekî berî kongreyê bi nivîskî agahdar bike.

Piştî kongreyê, Komîteya Karger ya Federasyonê di civîna xwe ya yekem de erkên xwe yê KK wek li jêr li hev û din dabeş kirin.

Berpirsiyarên peyvendiyan: Keya İzol û Eşref Okumuş

Berpirsiyarên karên îdarê: Nazif taşçı û Şerfxan Cizîrî

Berpirsiyarên karên aborî: Eşref Okumuş û Salih İnce

Berpirsiyarên karên rêxistinî: Salih

Înce û Nazîf Taşçi

Berpirsiyarên karên ragihandinê:
Şerfxan Cizîrî û Keya Îzol

Bi vî awayî kurdan jî li Swêdê Federasyonê xwe ava kirin.

Kongreya 2 em

Federasyonê kongreya xwe ya 2 em li gor biryara kongreya 1 em, di wexta tayinkirî 5-6/ 12 / 1981 î de civand. Kongre bi 18 nûnerên van komeleyên jêrîn ve vebû.

- 1- Komeleya Çanda Karkerên Kurdistan li Stockholmê
- 2- Komeleya Kurdî - Swêdî ya Çandî û Kulturî li Stockholmê
- 3- Komeleya Kurdî ya xwedevanên pêşverû li Uppsalayê
- 4- Komeleya Demokratîk a Çanda Kurd li Stockholmê
- 5- Komeleya Kurd ya Çandî li Göteborg
- 6- Komeleya Karkerên Kurdistan li Stockholmê

Ji bo dîwana kongrê Kemal Cengîz, Lutfî Baksî û Ferhad şakelî hatin hilbijartinê. Piştî hilbijartina diwanê, nûnerê Komîteya Karger ya Federasyonê, li ser navê KK axaftinek kiribû û di axaftina xwe de usa gatibû: "Gelê Kurdistanê ji hemû maf û azadîyên xwe yê demokratîk bê par kirî, di bin zordestîyek mêtîngêkar û di nav jiyaneke dijwar de ye. Mêtîngêkarî di heyama me de hatiye rûreş kirin û lanet kirin, lê hîn jî li welatê me hebûna xwe diparêze. Welatê me Kurdistan ku xwedîyê gelek dewlemendîyên xwezayî ye, ji aliyên hukmên barbar û hov ve tê şelandin. Gelê me birçî û bê mijûlayî, şerpeze, bende û kole tê hiştin. Dewletên mêtîngêkar metodên gel qirkirinê li gelê me diceribînin. Li Kurdistanê Îranê gelê me dijî hukma meleyên kevneperest li ber xwe dide, ji bo standina azadî û mafên xwe, ji bo çarenivîsa xwe her roj tekoşinê dide. Li Kurdistanê Iraqê, li dijî dîktatorîya Saddam muxalefet pêşve diçe, welatê me Kurdistan, roj bi roj dibe navenda muxalefeta civakî. Li Iraqê, li Suriyê gelê me li gor şertên heyî yê civakî û siyasî xebata

xwe dajo û li hember kirinên nijadperetên Baas, ber xwe dide.

Li Tirkîyê û Kurdistanê Tirkîyê jî, bi hatina cuntaya leşkerî ya faşîst di 12 îlona sala 1980 î de bi deh hezaran mirov hatine girtin, bi hezaran kes ji îşkencan de derbas bûn û ewqas jî hatin kuştin. Heta niha 10 kes hatine bi darvekirin. Lê rastî her ewe ku, cuntaya faşîst ne karibûye û dê nikaribe dawî li tevgera siyasî ya gelê me bîne. Kurdistanê Tirkîyê jî bo ders deranina ji kil û kêmasîyên bihurî, tevger ketîne nav raberizînek tund. Li hember cuntayê li ser yekîtîya tekoşin û hêzan diaxivin û li îmkânên bi hevra xebat kirinê digerin. Federasyonê me bi hemû hêzên xwe piştgirîya vê xebatê dike."

Piştî xwendina raporên Komîteya Karger, diwanê rê dabû mêvanan ku axaftinên xwe pêşkeş bikin. Dor hatibû hilbijartina Komîteya karger. Nûnerên kongreya 2 em kesên li jêr ji bo Komîteya karger hilbijartin.

Salih Înce
Keya Îzol
Şerfxan Cizîrî
Harun Eliacik (Şiyar)
Eşref Okumuş

Piştî helbijartina KK, diwanê pêşniyarên nûneran ji bo biryar girtinê da dengdan. Kongre li ser 8 xalên jêrîn bi tevayîya dengên biryar girt.

1- Piştî sala 1960 an tekoşina gelên bindest gihaye gehînekên nû û derbên giran dawşandîye mêtîngêkarî û emperyalîzmê. Kongreya me, bi tevayî piştgirîya tekoşina gelên bindest ji bo serxwebûna wan dike. Bi taybetî piştgirîya tekoşina rizgarîya gelê Filîstînê, gelê reşîk yê Afrîkaya jêrîn, tekoşina rizgarîyê li Erîtreyê, tekoşina gelê Namîbyayê, tekoşina gelê Saharaya rojhilat û piştgirîya tekoşina gelê Nîkaraguayê û El Salvadorê dike.

2- Kongreya me, li hember xwe çekdar kirinê, şerên nû yê dewletên emperyalîst û hêzên ku aşîtiya cihanê tehdît dikin, derdikeye. Xwe li kêlaka hêzên aşîtiya cihanê û tekoşina aşîtiyê bi tevayî dibîne.

3- Endamên Federasyonê Komeleyên

Kurdistanê li Almaniyayê (KOMKAR)ê û hinek karkerên welatparêz ji duyê meha mijdarê vir de ji bo parastina mafên demokratîk yê penaberên kurd li Almaniyayê û protestokirina metodên hov ya cuntaya faşîst a Tirkîyê ku li dijî gelê kurd bi kar tîne, greva xwebirçîhiştinê dikin. Kongreya me piştgirîya welatparêzên kurd ku di greva xwe birçîhiştinêdane dike û serketina wan dixwaze.

4- Bi geşbûna tekoşina dijî faşîstan li Ewropayê, faşîstên Tirk li Almaniyayê di demên dawî de erîşên xwe li ser welatparêzên kurd û şoreşgeran bêtir kirine. Segên faşîst, li ku derê keysê bibînin, erîşê şoreşgeran dikin. Yek ji wan erîşên dawî li Almaniyayê li dijî Nezîr şeker, endamê Komeleya Demokratîk a Karkerên Kurdistanê, KKDKê bû. Nezîr şeker bi erîşên faşîstên tirkan ve hat kuştin. Kongreya me mirovkujîya faşîst mehkum dike û ji bo yekîtîya li dijî faşîstan, bangî hemû kesên dijî faşîzmê li Ewropayê dike. Kongreya me rêz li hemû welatparêz û şoreşgerên ku şehîd dibin digrê û wan nemir dibîne.

5- Îro neteweya Kurd li Kurdistanê Îranê û Iraqê de, bo şikandina bendên koletîya sedsalan û bo azadîya gel û welat, dijî sazumanên zordest û kevneperest şerekî çekdarî dike. Her du dewletên zordest jî naxwazin heqê gelê Kurd bidin. Lewra leşkerên xwe dajon ser Kurdistanê, welatê me wêran dikin û dixwazin tevgera rizgarîyê bi darê zorê cardin vemirînin. Her usa jî her du dewletên kevneperest, dixwazin di nav hêzên welatparêz de şer derxîne û kurdan bi hev û din bidin kuştin.

Kongreya me bi dil û can piştgirîya hêzên welatparêz li Kurdistanê başûr (Iraq) û li Kurdistanê rojhilat (Îran)ê dike. Dijî zordestîya rejîma Xumeynî ya xwînrij li Îranê û ya Saddam Huseyîn li Iraqê derdikeye. Kongreya me bo serketina tevgera azadîyê li her du beşên Kurdistanê yekîtîya hemû hêzên welatparêz pêwîst dibîne. Divê ew dijî dijminên zordest cepheyekî fireh pêk bînin

Ji bo sazkirina demokrasîyê li temamîya Îran û Iraqê û bo bidestxistina

mafên gelê Kurd li Kurdistanê, hewceye ku di navbera welatparêzên Kurdistanê û hemû hêzên demokrat û pêşverû li Îran û Iraqê, cepheyên fireh bîn saz kirin. Kongreya me pêkanîna cepheyên han dixwaze û li Îran û Iraqê, dijî emperyalîzîm, kevneperestî û şovenîzmê, piştgirîya hemû hêzên demokrat dike.

6- Ji 12 ê Îlonê vir de ku cuntaya faşîst li Tirkîyê hate ser hukum, li ser hemû hêzên welatparêz, xasîma li ser gelê me li Kurdistanê, zulm û tedayî qat bi qat zêde bû. Cuntaya faşîst daxwazên emperyalîst û hevalbendên wan yê hundur bi cîh tîne. Bi piştgirîya NATO yê û xasîma bi piştgirîya emperyalîzma Emerîkî, dixwaze tevgêra xebatkarên Tirkîyê û tevgêra gelê Kurd ya neteweyî vemirîne. Ji bo vê yekê, cuntaya faşîst hemû komeleyên demokratîk û partîyan girtin, kovar û rojnameyên pêşverû qedexa kirin, bi sedhezaran merivên demokrat û sosyalîst girtin û bi sadan kes kuştin. Cunta dixebite ku bi her awayî rejîmekî faşîst saz bike û bimeşîne.

Cuntaya faşîst pîranîya leşkerên xwe şandiyê Kurdistanê, li ser gund û bajarên me de girtîye, can, mal û namûs nasnake, bêperwa xwîna dirijîne, zulm û tuda dike. Kolonyalîstên faşîst dixwazin çavê gelê me bitirsînin, hêzên welatparêz û şoreşger bipelixînin û tevgêra azadîyê şûnda bavêjin. Lê hemû kirînan van zordestan heya niha pere nekir û niha şûnda jî nake. Qet zordestek nikare tevgêra azadîyê li Kurdistanê vemirîne. Ev zulm û tade ruyê dijmin çêtir êşkere dike û daxwaza gelê me bo rîzgarîyê xurtir dike. Gelê me ji van rojên çetin wê derbaz be, tevgêra neteweyî wê firehtir û geştir bibe û wê ber bi serketinê bimeşe. Rojên serketinê ne dîr in.

Kongreya me, ruyê reş ya cuntaya faşîst êşkere dike û bi dil û can piştgirîya hêzên welatparêz û şoreşger li Kurdistanê bakûr dike. Kongreya me, bo serketina hêzên welatparêzên Kurdistanê bakûr, yekîtîyêkî fireh pêvîst dibîne û piştgirîya saz kirina cepheyêkî welatparêz û demokrat dike. Gazî hemû kesên pêşverû û welatparêz dike ku bona

yekîtîyê kar bikin. Kongreya me her usa bo dûrxistina hukma faşîst û bo saz kirina demokrasîyê li Tirkîyê û Kurdistanê, ji bo demokrasîyê, di nav her gelan de cepheyêkî dijî emperyalîzmê pêvîst dibîne û piştgirîya saz kirina cepheyêkî han dike û bo pêkanîna wê bangî hemû hêz û kesên demokrat dike.

7- Kongreya xwest ku xwedîyê organeke xwe be, ji bo wî jî biryara derxistina organa Federasyonê da. Kongre li ser pêşniyara Reşo Zîlan, navê BERBANGê li organa Federasyonê kir. Komîteya Karger di civînekî xwe de berpirsîyarîya Berbangê dide Eşref Okumuş. Berbang hejmara xwe ya 1 em di meha 6 / 1982 an de çap dike. Heta dawîya sala 1982 an 6 hejmarên xwe diweşîne û her 6 hejmar jî bi zaravayê kurmancî bûye.

Kongreya 2 em ya Federasyonê Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, hemû welatparêz û pêşverûyên Kurdistanê vedixwîne xebatê.

Bijî kongreya 2 em ya Federasyonê Komeleyên Kurdistanê li Swêdê!

Bijî tekoşîna netewî û demokratîk ya gelê me!

Komîteya Karger, piştî kongreya 2 em, civîna xwe ya yekem di roja 16.12.1981ê de pêk anî û erkên xwe yê Komîteya karger, wek li jêr li hev par kirin.

- 1- Salih İnce, Keya İzol: Berpirsîyarên peyvendîyên giştî ya Federasyonê
- 2- Şerefxan Cizîrî: Berpirsîyarê ragîhandinê
- 3- Harun Eliaçik: Organîzator
- 4- Salih İnce û Keya İzol: Berpirsîyarên kar û barên îdarî
- 5- Eşref Okumuş: Berpirsîyarê Aborî

Her wekî win jî dibînin struktur û xebata Federasyonê ne wek ya îro ye. Rewşa wê demê ya kurdan jî li gel rewşa îro ya kurdan cuda bû. Li Kurdistanê bakur cuntaya leşkerî ya faşîst hatibû ser hukum, li Kurdistanê başûr û rojhilat jî gelê Kurd di nav şerekî germ ya çekdarî de bû. Penaberên kurd li Swêdê gelek kêmbûn. Kar û xebata

Federasyonê jî li gor rewşa Kurdistanê, li gor rewş û pêvîstîyên wan yê li Swêdê bû. Rastîyêkî din jî ew e ku, wê demê rêxistinên Kurdan di xebata çînayê û îdeolojîk de tundtir bûn.

Ev faktorên li jor tesîra xwe raste rast li ser kar û xebatên Fedrasyonê dikir. Ev tişt di biryarên Kongreya 2 em de pir bi zelalî xuya dike. Kongreya 1em heta 3 em Federasyon bê serok bû, berpirsîyarîya peyvendîyan û kar û barên îdarî sipartibû Salih İnce û Keya İzol ku desthilatîya wan wek hev bû.

Hebûna Fedrasyonê di nav kurdên rûniştvanên Swêdê de gelek dihate xebardan, ev yeka bi taybetî di nav kongreya 2 û 3 em de gelek dihate munaqesekirin. Her ji bo vê mebestê, bi îmzeya A.Riza Alan, li ser navê Komîteya Karger, nivîsekî dirêj di hejmara yekem ya Berbangê de bi ser nivîsa "Bo çî Federasyon" hat weşandin. Em wê nivîsê li jêr pêşkeşî we dikin.

Ciyê Federasyonê di têkoşîna neteweyî de

Tiştên li jor hatin gotin, li xurû di çerçewa şertên Swêdê û biyanîyên li Swêdê de bûn. Tenê li ser civata kurdên li Swêdê, wek grûbekî biyanî û li welatekî biyanî bûn. Lê rewşa kurdan ev çend ne hêsan e. Ango Kurd ne wek her grûbekî biyanî ne. Di serê her tiştî de bê dewletbûn û bindestîya me, me ji gelek biyanîyên din vediqetîne. Sedemên barkirina me ya ber bi Ewrûpayê çî dibin bila bibin, aborî yan siyasî, di bingehên van sedeman giş de, ev rastî û trajedî heye. Bi kurtî welatê ku em jêr tînin, welatekî bindest û perçekirî ye. Civata ku me li dû xwe hiştîye jî, civatekî ji hev belavkirî û paşdemayî ye. Lê gelê me li hember vê zulm û bindestîyê stuyê xwe xwar nekirîye û serî dananîye. Dîroka liberxweda a gelê me, bi qandî dîroka bindestîya wî kevn e. Gelê me îro jî wê "qederê" re dibêje "na" qels jî mabe, ji hev de jî ketibe, çarmedor dijmin be jî, dîsa bi qandî taqeta xwe dibêje "na". Di zîndanên tarî de, li Suleymanîyê, li Diyarbekirê, li Mehabadê, bi deh hezaran mirov, bo stranên azadîyê venamire, bo tovên serxwebûnê

şîn were, bo ku êdî xîreta gelê me hew di nav dest û piyên hovan de bipelixe, her roj, di çerxên îşkence de û di sêpê-yên îdamê de canê xwe bi gorî dikin. Ev tekoşîn ji ber me ve û di şûna me de jî tê dayin. Ji bo vejandin û xurtkirina li berxwedanê, girtiyên me alîkarî û pêşmergek me çek divên. Helbet çek ne tenê kelenşîkof e. Çek zanîn û zanî-yarî ye, piştevanîya dostan û yekîtîya di nav me bi xwe de ye jî. Di rewşa îro de, çeka herî girîng ev e. Û îro li welat yekîtî çiqas pêvîst be, li derveyî welat jî ewqas pêvîst e. Hinek der û dor ji berê de dixwazin di nav me de felsefa rebeniyê û bêkesîyê belav bikin. Dibêjin: "di xebata derveyî welat de tu xêr tune" an "tu dostên kurdan nînin". Wek ku li ruyê dinê de tu hêz, kesên mirovperwer nemabin. Li gora vê zihniyeta kevnare, weka ku em di tekoşîna xwe de, tik û tenê, bê heval û hogir, bê piştgirî û dost, bi serê xwe mane. Rast e gelo? Em bi xwe dibêjin "na". Yên ku dibêjin rast e, bila rûnên wek pepûk û sêwîyan li çoka xwe bixînin. Eger em hebin û destên birayetî dirêjî hev û du bikin, di nav xwe de bibin yek û bi hêz bin, dost gelek in.

Girîngîya piştgirîya navnetewî û hêzên pêşverû û demokrat li welatên Ewropayê, ji tekoşîna gelên din yê bindest rind di bîra me de ye. Gava em bikaribin rewşa welatê xwe û şerê gelê xwe bi rîya rêxistinên wek partî, sendîka û rêxistinên hwd. bidin naskirin û qebûlkirin, emê bikaribin hêz û îmkânên rejîmên kevnepereşt li Kurdistanê qelstir û kêmîr bikin. Girêdanên wan yê paşverû bi derveyî welat re çiqas bîn birîn, wê pergela wan yê gemarî ji ewqas bê tecrîd kirin. Bi vî awayî, wê hêvî û rîyên nû li ber tekoşîna gelê me vebin û wê serketina me hêsan û nêzikîr be. Komeleyên endamên Federasyonê, ji bo ku bala gelemperî bikşînin ser rewşa welatê me û tekoşîna bi salan ya ku gelê me dide, beşekî girîng ya xebata komeleyan ev bûye û vê xebatê tesîrekî mezin li ser gelek kes û hêzên demokrat kirîye. Piştî ewqas sal û ewqas tercube, îro em di nuqteyekî de hemfikir in; Di gel ferqên bîr û bawerî û dîtinên cuda yê siyasî, komeleyên me dikarin

piranîya xebata xwe ya bo raya giştî li Ewropayê di platformekî demokratîk de bicivînin. Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê FKKS di vî warî de bo yekîtîya xebatê, platformekî têkûz e.

Ji bo ku em bikaribin bigîhên hede-fên li jor rêzkirî, ne tenê komele, divê her welatparêzekî Kurdistanê jî wezîfa xwe ya esasî bi cih bîne. Li derveyê welat, wezîfa me ya esasî propaganda ye. Yanî bi hêzkirin û pirkirina hevalbend û dilxwazên tekoşîna gelê Kurdistanê ye. Divê propoganda li gor şertên civatê bîn kirin. Mesela, carna melodî ya bilûra şivanekî Kurdistanê, an govend gerandina komekî folklorê, hêjayîya deh belavok û sed siloganan e. Ev misalekî piçûk e. Lê bê guman ji aliyê her kesî ve tê zanîn ku propoganda, tercube û zanebûneke taybetî dixwaze. Divê em hemû tercube û zanîna xwe û kesên xwe yê pîspor di warên curbucur de, bikaribin li merkezêkî mobilîze bikin. Ev merkez, bê guman Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye.

Federasyonêk çawa?

Bê şik Federasyonêkî Kurdistanî û demokratîk. Divê Federasyon xebata xwe li ser van her du hîmên esasî bidomîne. Ger em, foksîyona Federasyonê û faktorên ku me tînin cem hev bidin ber çavên xwe, xebatekî weha bi tenê dikare li ser platformekî bi vî rengî bimeşe. Kurdistanî bûn, bi maneya temsîlkirina hemû komeleyên welatparêz û demokratîk yê ji her çar aliyên Kurdistanê ye. Demokratîk bûn, bi maneya ji hemû bîr û bawerî û dîtinên welatparêz û pêşverû re vekirîbûn û bi tu heze kî yan dîtinêkî taybetî ve ne girêdayîbûn e.


Xebata salekî

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, di meha gulana sala çûyî de hate ava kirin. Kongreya yekemîn bi pêşengî û înisîyatîva çend komeleyên aktîv civîyan. Di despêkê de kêmasî gelek bûn. Cara pêşîn ji her çar aliyê Kurdistanê, xwediyê program û bîr û baweriyên cuda, ewqas komele, ji bo xebatek weha dihatin cem hev. Loma ger di despêkê de hinek problem derketi-

bin û xebat wek avê neherikîbe jî, divê gelek normal bê dîtin. Ya herî girîng ev e ku, bo çareserkirina van probleman xebat hatîye kirin yan na. Belê bi rikoyî û serwestî xebatek dijwar hatîye kirin. Berpisfariya welatparêzî û şoreşgerî dawîya dawî bi ser ketîye û Federasyon ava bûye.

Bi cih bûn û rûniştina rêxistinek wek Federasyonê, gelek xebatên giran dixwaze. Di serê van xebatan de, peywendiyên resmî û burokratik bi hemû rêxistinên resmî re tînin. Federasyonê li ser rewşa Kurdên li Swêdê û ji bo xwendîna zimanê Kurdî di dibistanên Swêdê de, bi SÖ (Serokatîya Kar û Barên Dibistanên Bilind) û SIV (Dayira Kar û Barên Biyanîyan ya Dewletê) re dest bi kar kirîye. Di vî warî de projektî fireh daye ber xwe. Armanç, bi alîkarîya kesên pîspor, organîzekirin û pêşvebirina xebatên xwendîna ye. Bi belediyê re gelek civîn hatine kirin û li ser rewşa zarok û malbatên Kurdan çend gavên keysdar hatine avêtin. Bi komele û federasyonên biyanîyan re, peywendiyên xurt hatine pêk anîn. Bi partî, sendîka û rêxistinên demokratîk yê Swêdî re gelek civîn hatine kirin. Di 12 îlona derbazbûyî de, li dijî cunta Tirkîyê çalakîyekî xurt û fireh hatîye pêkanîn. Bi programekî dewlemend û bi beşdarbûna hemû Kurdan ve, Newrozekî serketî hatîye pîroz kirin. Meş, mitîng û çalakîyên wekî din hatine rêxistin. Bi mamosteyên kurd re û bi kesên di warê sporê de xwedî întirese nin re civînên fireh hatine kirin û bo damezrandina komeleyên meslekî, komîte hatinin helbijartin. Ya herî girîng jî, hejmara komeleyên endam di Federasyonê de ji 6 an derketîye 13 an. Federasyonê, bi vê hejmara BERBANGê ve dest bi jîyana xwe ya weşanî kirîye.

Bo Federasyonêkî bi hêztir û ji bo Berbangêkî çêtir, alîkarî û piştevanîya we divê. We xuşk û birayan... We hevalên dilsoz...

roj bûn

Demîn Basdas

Di 21.11.2001ê de bû 6 salî. Em 6 saliya te pîroz dikin; bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyanêke şad dikin.

Diya te Bêrivan,
Bavê te Xalid Xoca
xwişk û birayên te

roj bûn

Silîva Aydın

Di 03.11.2001ê de bû sê salî. Em 3 saliya te pîroz dikin; bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyanêke şad dikin.

Bavê te Mumtaz,
Diya te Leyla, xwişk
te Bêrî û meta te Emîne

roj bûn

Mîro Toheidy Azîzî

Di 12.12.2001ê de bû 4 salî. Em 4 saliya te pîroz dikin; bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyanêke şad dikin.


Diya te Sara
Bavê te Kawa
Xwişk te Kanî

roj bûn

Kanî Toheidy Azîzî

Di 11.09.2001ê de bû 11 salî. Em 11 aliya te pîroz dikin; bi hêviya gelek sersalên din, em daxwaza jiyanêke şad dikin.

Diya te Sara
Bavê te Kawa
Birayê te Mîro

Bîranîn


Mahmûd Baksî
1944 -19.12.2000

Em di 1 saliya wefata
te de, te bi bîr tînin!

Elîn Classon
Lutfî Baksî
Ahmed Baksî
Selva Baksî
Şukran Baksî
Zozan Baksî
Bedrî Baksî

Bîranîn


Necla Baksî



Huseyin Yildirim

Em xwişk xwe Necla
Baksî û zavayê xwe
Huseyin Yildirim û hevalên
wan di 21 saliya şehîdbûna
wan de, bi bîr tînin!


L. Baksî, A. Baksî
S. Baksî, Ş Baksî

Mizgînî

Didar Izol

Di 10.10.2001ê de ji
me re lawek çêbû. Me
navê wî Didar danî.
Bi xêr hatî vê dinyayê
Didar

Serdar, Zerî, Tajdîn,
Vesîle, Keya, Berfîn,
Ferza û Filtîz

Mizgînî

Bawer Bedran Acar

Di 3.12.2001ê de ji me
re lawek çêbû. Me navê
wî Bawer Bedran danî.
Bi xêr hatî vê dinyayê
Bawer Bedran

Bavê te Selîm
Diya te Selma
Hevalên bavê te yên
ku alîgirên Xelîl in

Çalakiyên Federasyonê

Amadekar:
Kovan amedi
kovan.amedi@kurdiskarf.org

Di roja 16.10.01ê de li gor biryara KG, FKKSê nameyek di heqê Nîzar Xezrecî de ji komeleyên endam re şand ku (ku N. Xezrecî di karesata Helebçê de destê wî jî hebû û niha jî li Danîmarkayê daxwaza penaberîyê kirîye) bo mehkemekirina wî zedetir agahdarî bide hev.

Di roja 17.10.01ê de FKKSê li ser biryara KG nameyek ji bo tawanbarkirin û mehkemekirina Nîzar Xezrecî, ji wezareta Derveya Danmakê re şand.

18.10.2001 î de Keya Îzol, Vildan Tanrikulu, û Seval Mert beşdarî civîna SIDAyê bûn. SIDA dixwaze di pêvajoya berendametîya Tirkîyê ji bo Yekîtîya Ewrûpayê de alîkarîya Tirkîyê bike. Di wî warî de bi FKKSê şewirtin û FKKSê jî dîtînen xwe pêşkeşî wan kir.

Di roja 19.10.2001 î de li ser ideayan ku Dayira Biyanîyan, kurdên başûrê Kurdistanê mecbûrê wergirtina pasaportên Iraqî dikin, FKKSê nameyek ji Dayira Biyanîyan re şandin û nerazîbûna xwe da nîşan dan.

Di roja 3.11.01 î de Hemîd Gewherî, Keya Îzol, Vildan Tanrikulu û Kovan Amedî besdarî civîna çileyê sehîdên gundê Xêlê Heme, li Kista Treffê bûn. Civîn ji aliyê YNKê hatibû amadekirin.

Swêd dixwaze salmezînen Kurd wegerîne Kurdistanê

Swêd dixwaze bi projê salmezînen Kurd wegerîne welat, Ji bo ew kesên ku wegerin, îmkânên maddî û yê kar li welat peyda dikin, bi sertê ku mafên wanê kar kirinê li Swêdê ji wan tê girtin. Di roja 6.11.2001 î de ji Sosiyal mis-



Sekreterê giştî yê Hizba Şûî a Kurdistanê birêz Kerîm Ehmed FKKSê ziyaret kir

sionê Angelika Perez civînekî agahdarîyê her li ser vê babetê, bi serokê FKKSê Keya Îzol re çê kir.

Sekreterê giştî ya Hizba Şûî a Kurdistanê birêz Kerîm Ehmed FKKSê ziyaret kir

Di roja 26.11.2001ê de sekreterê giştî ya Hizba Şûî a Kurdistanê birêz Kerîm Ehmed, ji Komîteya Ewrûpa û ji komîteya Swêdê ya Hizba Şûî, birêzan Bavê Tara, Qadir Reşîd û Dr. Zekî Federasyonê ziyaret kirin. Mêvan ji aliyê Komîteya Karger ve hatin ezimandin. Serokê FKKSê Keya Îzol di heqê FKKSê de bi kurtî axivî û bersîva pirsan da. Birêz Kerîm Ehmed jî li ser rewş û tercubeya Kurdistana Başûr û siyaseta û helwesta Hizba Şûî axivî û piştî axaftina xwe bersîva pirsên endamên Komîteya Karger ya FKKSê da.

Di roja 8.11.2001 î de du nûnerên Komeleya Nabîniyan Federasyonê ziyaret kirin. Li ser navê FKKSê sekreter Hemîd Gewherî û berpirsiyarê KPN Kovan Amedî wan ezimandin û li Federasyonê agahdarî dan wan. Ewana jî li ser Komeleya Nabîniyan agahdarî dan û bi nameykî daxwaza endametîyê ji FKKSê kirin.

Di roja 11/11/2001 î de Komeleya Falkopîngê kongreya xwe ya sala wextî çê kir. Li ser navê KPNê Adil Dihokî besdarî kongrê bû û axaftinek kir.

Di roja 8.11.2001 î de du nûnerên Komeleya Nabîniyan Federasyonê ziy-

aret kirin. Li ser navê FKKSê sekreter Hemîd Gewherî û berpirsiyarê KPN Kovan Amedî wan ezimandin û li Federasyonê agahdarî dan wan. Ewanajî li ser Komeleya Nabîniyan agahdarî dan û bi nameykî daxwaza endametîyê ji FKKSê kirin. Daxwaza wan ji bo KK hat peskeskirin. KK jî wê daxwaza wan bibe civîna KG.

Di roja 10 û 11/ 11/2001 î de Keya Îzol, Kovan Amedî, Seyran Duran û Midya Hessen Besdarî civîna pîrsa wekhevîyê û pîrsa zarokan li Norrkopîngê bûn. Civîn ji aliyê Kvinno SIOSê ve hatibû amadekirin.

Meş li dijî rasîzm û şiddetê

Di roja 1.12. 2001 î de li Stockholmê, Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêdê, Federasyona Îraniyan, Federasyona Somaliyan, Federasyona Şîlîliyan û polis ji liqa entegrasyonê, bi hev re li dijî şiddet û rasîzmê meşîyan. Rêxistinên biyanîyan û çend rêxistinên wek komeleya dijî narkotîkê, Komeleya Dê û Bavan û Komeleya dijî krîmînalîtetê, polis ji liqa entegrasyonê Michael Lundh, di civînekî 3 meh berî niha de, biryar girtibûn ku mehê carekî ango îni ya dawî ya her mehê di bin şîra Civatekî bê şiddet û krîmînalîtetê de li Stockholmê bi hev re bimeşin. Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêdê, bi ewayekî aktîv beşdarî vê çalakiyê dibe.

Berbang

Kurdiska Riksförbundets Tidskrift • No: 122 • 2001

Invigning av KRF:s nya lokaler 12 oktober 2001



Kulturminister Marita Ulvskog:

”Det känns som en väldigt bra tidpunkt att få vara här och markera att ni har fått ett hem här i Nacka. Att det kurdiska språket och kurderna har en plats i mångfaldens Sverige. Det är så viktigt precis som mötets öppnare förklarade att kurder ska vara, är redan men ska fortsätta vara och bli i en högre grad, en viktig del av Sverige och det svenska samhällslivet. Då är det ganska bra att känna sig hemma på många ställen. Då skall jag alldeles strax förklara själva hemmet invigt och sen är det ni som skall fylla den med innehåll och värme och det har ni ju egentligen redan börjat.”

sidan 7

Berbang

No: 122

2001

Kurdiska Riksförbundet i
Sverige

Ansvarig utgivare

Keya Izol

keya.izol@kurdiskarf.org

Layout

F. Marsil

Prenumeration

myndigheter 300 SEK
annons:
en hel sida 5000 SEK

Adress

Berbang
Box 5013
S-131 05 Nacka
SWEDEN

Besöksadress
Henriksdalsringen 6
Nacka

tfn 08-644 66 22
faks 08-650 21 20

berbang@kurdiskarf.org
www.kurdiskarf.org/berbang

Postgiro: 64 38 80-8

ISSN 0281-5699

Utges av Kurdiska Riksförbundet
i Sverige

APEC-Tryck



Vad är Kurdiska Riksförbundet?

Kurdiska Riksförbundet (KR) bildades 1981 och har varit verksam sedan dess som kurdernas representant i Sverige. KR är partipolitisk och religiös obunden organisation. Vi har för närvarande 36 medlemsföreningar med upp till 8500 medlemmar runt i hela Sverige. Alla enskilda kurder som är bosatta i den kommun kan söka medlemskap i denna förening.

KR har sitt årsmöte varje år. Styrelsen som väljs i årsmötet består av 12 ordinarie och 3 suppleanter och har sammanträde 6 gånger per år. Verkställande Utskott (VU) består av 7 ordinarie och 3 suppleanter. Ordförandena i Kvinno och ungdomsförbundet ingår som automatiska ledamöter i VU. VU har sitt sammanträde varannan vecka.

KR är enda organisation som har lyckats att samla kurder oavsett vilken del av Kurdistan man kommer ifrån eller vilken politisk bakgrund man har. Därför är den en unik kurdisk organisation som saknar motstycke i hela världen.

Vi sysslar med integrationsfrågor, hjälp till nyanlända flyktingar samhällsfrågor som uppstår i samband med kulturkrock och relationsfrågor. Kvinno, barn och ungdomsfrågor har vi som prioriterade frågor inom vår verksamhet. Kultur är en annan viktig verksamhet som vi prioriterar. Nämligen att bevara den kurdiska kultur och tradition och identiteten.

Vi har även verksamhet som inriktar sig till händelser som sker i Kurdistan. Vi bevakar orättvisor och kränkningen av mänskliga rättigheter. Vi har lobby verksamhet för att uppmärksamma den kurdiska frågan samt agera mot occupationsländerna Turkiet, Irak, Iran och Syrien.

Oftast fungerar vi som en kurdisk ambassad för att klara alla dessa frågor eftersom vi saknar stat och ambassad här i Sverige. KR agerar som språkrör för kurder här i Sverige och samtidigt försöker avslöja och bekämpa de orättvisor som sker i vårt hemland, här i Sverige.

KR har egen tidskrift som heter BERBANG och som publiceras 6 gånger per år. Den är på nord och syd kurdiska samt på svenska.

Besöks adress: Henriksdalsringen 6

Postadress: BOX 5013, 131 05 Nacka

Tel: 08-6446622 • Fax: 08-6502120

www.kurdiskarf.org

info@kurdiskarf

Bersiva resmi ji dezgehên Danimarka, di derheqê Nizal Kharzeci de

KURDISKA RIKSFÖRBUNDET
Henriksdalsringen 6, 131 32 Nacka
Tel: 08-6446622
Fax: 08-6502120
e mail: keya.izol@kurdiskarf.org

E post: info@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

—— Original Message ——

From: "Erik Hald" <erik@microsis.com>

To: <keya.izol@kurdiskarf.org>

Sent: Monday, January 07, 2002 4:13 PM

Subject: Your email dated 17. october 2001 (2nd attempt - with adress and phone numbers)

THE NATIONAL COMMISSIONER OF POLICE
SERIOUS CRIME DIVISION - HOMICIDE SQAUD

at present:

Tinggade 15, 4100 Ringsted.

DENMARK

TEL: +45 5761 1448 ext. 532/ 502

FAX: +45 5767 0477

With reference to Your email dated 17. october 2001 concerning the former Iraqi army chief Nazar Abdelkarim Al-Khazraji.

As it may be known to You, the Danish Prosecution has decided to carry out a criminal investigation with the purpose of conducting an inquiry, whether production of evidence can be made with the purpose to press charges for violation of International conventions e.g. the GenÈve Convention in connection to The Anfal Campaign against the Kurds in the 1980'.

For the need of gathering material to above mentioned purpose You are kindly asked if You or Your Organization are in possession of any kind of documentation, which prove or substantiate the participation of former Iraqi army chief Nazar Abdelkarim Al-Khazraji or units from the Iraqi army in The Anfal Campaign or the suppression/expulsion of the kurdish population.

Such documents could be:

- a) written documents, articles, press cuttings etc.,
- b) Photos or videos,
- c) Any knowledge to wittneses, who may have witnessed or suffered an assault from Iraqi army chief Nazar Abdelkarim Al-Khazraji or any army unit,
- d) Persons who may have carried out orders directly from or on behalf of army chief Nazar Abdelkarim Al-Khazraji.
- e) Any documentation You may find of importance for the ongoing investigation.

If You are in possession of such material or any material You believe is of importance please contact us.

You can contact us at above mentioned adress or faxnumber.

Best Regards

Erik Hald, det. insp.

Poul B. Andersen, det. chief insp.

Öppet brev till EU:s regeringschefer, EU-kommissionärer och Europa parlamentarikern

”Vägen till medlemskap i EU går för Turkiet via lösningen av den kurdiska frågan”

Turkiet har utarbetat ett nationellt program som beskriver hur partnerskapsprogrammet skall genomföras. Detta, flera hundra sidor långa, program kom ut i mars 2001. Man kan fundera över om det mångordiga nationella programmet är ett försök att i ordflödet dölja sin bristande vilja att leva upp till Köpenhamnskriterierna.

Nationella programmet upprätthåller nuvarande status för kurderna. Programmet är reaktionärt och ett håll för kurdfrågan, det ligger långt efter EU:s partnerskapsprogram och motsvarar inte Köpenhamnskriteriernas krav. Detta är inte en tillräcklig vägbeskrivning för en fredlig lösning på kurdfrågan.

Turkiet har med det nationella programmet inte förmågan att uppfylla de grundläggande politiska kriterierna och når inte förhandlingspositionen för förhandlingar med EU. Nationella programmet motsvarar inte Köpenhamnskriteriernas förväntningar. Turkiets nationella lagstiftning passar inte EG-rätten och Turkiet har problem

att anpassa sin lagstiftning.

En del av de konstitutionella förändringarna som Turkiska riksdagen antagit nyligen, ger inga rättsliga garantier för att den kurdiska kulturella och språkliga identiteten skall kunna utryckas obehindrat.

En vägbeskrivning för en politisk lösning på kurdfrågan

Vi vill gärna se seriösa reformer och ett konkret handlingsprogram för kurdernas nationella och demokratiska rättigheter i Turkiet.

Vi anser att den kurdiska frågan är den viktigaste politiska frågan i Turkiet och därför också en viktig fråga inför medlemskapsförhandlingar mellan EU och Turkiet.

Vägen till medlemskap i EU går för Turkiet via lösningen av den kurdiska frågan.

Därför vill vi:

- att den turkiska regeringen skall ra-

tificera följande Europakonventioner:

a) ramkonventionen för skydd av nationella minoriteter,

b) konventionen för regionala språk och minoriteters språk,

- att den turkiska regeringen följer parlamentariska församlingens rekommendation 1201 om ett tilläggsprotokoll om nationella minoriteters rättigheter till Europakonventionen om mänskliga rättigheter,

- att den turkiska regeringen skall redogöra för lösningen av den kurdiska frågan med en lista över konkreta åtgärden, ett handlingsprogram, samt

- att den turkiska regeringen skall gå från ord till handling i dessa frågor.

Nedan har vi listat de punkter som vi anser skall bevakas särskilt i ett sådant handlingsprogram.

Kortsiktiga politiska kriterier

1. Samtliga regleringar i den turkiska lagstiftningen, inklusive den turkiska grundlagen, vilka förbjuder och för-

nekar kurdernas identitet skall tas bort. Grundlagen och lagstiftningen skall garantera landets kulturella, språkliga och etniska mångfald. Alla rättsregler om förbud för kurder att använda sig av sitt modersmål i radio- och TV-sändningar skall upphävas.

2. Lagen om undantagstillstånd samt lagen om tillfälliga byvaktsystem i de kurdiska regionerna måste upphävas. Befolkningen i de byar som bränts ned eller där befolkningen förflyttats med tvång skall få möjligheter att i trygghet återvända till sina hem och deras ekonomiska förluster skall ersättas.

3. Förändrade stads-, by- och ortsnamn skall återfå sina ursprungliga namn. Kurdiska föräldrar skall ha rätt att ge sina barn kurdiska namn. Vuxna skall likaså ha rätt att byta till kurdiska namn.

4. Amnesti skall utfärdas för de personer som dömts för eller anklagas för separatism. Förbudet att verka politiskt skall hävas för de personer som dömts därtill. Samtliga politiska fångar i Turkiet skall frisläppas.

5. Dödsstraffet skall avskaffas.

Medellångsiktiga politiska kriterier

1. Grundlagen och lagstiftningen skall garantera rätten till användning av kurdiska i undervisning och som utbildningsspråk, samt rätten till fri användning i partipolitiskt syfte.

2. Alla rättsliga bestämmelser som förhindrar utövandet av att bilda politiska partier på etnisk och kulturell grund bör avskaffas. Det skall inte finnas juridiska hinder för att kalla de sydöstra delarna av Turkiet för Kurdistan. De politiska partierna skall ha rätten att, om de så önskar, bilda regionala partier och delta i valkampanjer i dessa regioner. Partier skall ha rätt att kräva regionala parlament. Regionalt skall andra officiella språk, bredvid turkiska, kunna införas. Alla dessa förordningar skall skyddas i grundlag samt lagstiftning.

Ett handlingsprogram för lösning av den kurdiska frågan kommer att ge den turkiska regeringen trovärdighet i sin vision om Turkiet som en del av Europa. En integrerad del av den civiliserade världen.

Vi hoppas att EU-kommissionen

anser att Turkiet med sin nationella plan inte kan uppfylla Köpenhamnskriterierna. Ansökan bör läggas på is eller diskvalificeras till dess att ett nytt entydigt partnerskapsprogram där man ställer tydliga krav när det gäller kurdfrågan och kallar den vid sitt rätta namn har utarbetats. EU-kommissionen skall också avkräva Turkiet ett nytt nationellt program som skall omfatta en vägbeskrivning för en politisk lösning på kurdfrågan utan att medge undantag, kompromisser eller rabatter.

2001-11-12

Med vänliga hälsningar

KRF
Kurdiska riksförbundet

HEVKARI
Samordningskommitten för
kurdiska politiska organisationer i Sverige

IKS
Kurdiska Initiativet i Sverige

Ann Eriksson

Kurdistan

fotografier

Frilansfotografen Ann Eriksson har sedan 1974 gjort många resor till Kurdistan. Ingen annan svensk fotograf har under så lång tid levt bland kurder och dokumenterat deras liv över hela Kurdistan. Det unika bildmaterialet skildrar med stor närhet människornas vardag i byar och städer, men också hur flyktingar gerillasoldater tvingas leva.

Beställningsadress

Sigma Reportage
Havregatan 7
118 59 Stockholm
eller
tel: 08-640 90 23
fax: 08-640 29 69
e-post: sigma@algonet.se

Pris: 200kr+moms och porto


inbunden, 199 x270 mm. 172 sid. 76 foton tryckt i duplex

Invigning av KRF:s nya lokaler 12 oktober 2001



Det var stor fest när Kurdiska Riksförbundet invigde sin nya lokal på Henriksdalsberget i Nacka. Kulturminister Marita Ulvskog klippte bandet och hon skrev in sig i gästboken.

KRF:s ordförande Keya Izols tal vid invigning av KRF:s nya lokaler 12 oktober 2001.



Hjärtligt välkomna. Särskild välkommen är vår Kulturminister Marita Ulvskog och våra andra svenska gäster från Nacka Kommun, företrädare från våra politiska organisationer och representanter från våra vän organisationer.

Det är en historisk dag för oss kurder i Sverige. Det har varit en långvarig

”Det är en historisk dag för oss kurder i Sverige”

maraton innan vi kurder på allvar bestämt oss att bosätta oss i Sverige på riktigt. Detta beslut innebär att vi som grupp har också beslutat att vara delaktiga i det nya landets politiska liv. Det innebär att vi kommer med våra kunskaper och färdigheter att berika mångfalds Sverige.

Det var också en lång maraton innan vi fick dessa lokaler. Det har funnits motstånd från en del håll. En del tyckte att vi inte passade bra in här. Jag är övertygad om att vi efter dagens invigning kan känna oss som välkommen till det här området. Vår närvaro kommer utan tvekan bli bra för vår grupp och för det här området. Vi är

också här för att bidra mångfalden, bekämpa främlingsfientlighet och rasism samt vara delaktiga i den demokratiska processen i Sverige.

Jag vill passa på och tacka er alla som bidragit med era insatser för att denna dag blev så lyckat. Denna lokal kommer att vara centrum för våra ungdomar, kvinnor och för riksförbundet. Alla Ni som finns här idag har stött denna process så idag har vi äran att uppleva vårt eget hus. Er närvaro och stöd betraktar jag också som ett stöd för det kurdiska folkets kamp för sina fri och rättigheter.

Tack för ordet.

Kommunstyrelsens ordförande i Nacka, Erik Langby

Det är väldigt roligt att vara här. Jag är glad vi att idag kan äntligen inviga KRF:s nya lokaler här i Henriksdalsberget. Jag måste påpeka att alla inte var eniga i denna fråga. Som politiker tar man många beslut i sin verksamhet.

”Jag är glad att idag kan vi äntligen inviga KRF:s nya lokaler här i Henriksdalsberget”

Det här beslutet att KRF skulle överta denna fastighet är ett sådant beslut som jag inte kommer att ångra mig.

Speciellt nu när jag ser vilka positiva förändringar som åstadkommit av er. Det känns mycket bra. Er närvaro här

är helt i enlighet med den framtidsvision som vi har för Nacka Kommun.

Därför vill jag lämna den här presenten till er som en symbol för framgång och framtid.



**Kulturminister
Marita Ulvskogs tal vid KRF:s
lokal invigning**

Jag har fått inviga Kurdiska Biblioteket för snart 4 år sen. Det var en stor händelse, en viktig händelse tror jag för er också men viktig händelse för oss som inte är Kurder. Detta Bibliotek har betytt och kommer att betyda mycket för Kurderna i Sverige och även för kurderna i andra delar i Europa. Det betyder mycket för att det visar språkets betydelse för vår identitet och där möjliggör förmågan att fungera som ett nytt samtalsämne. Vi som tillhör ett litet språk som det svenska språket vet vikten av detta. Därför tycker jag att en markering från statens sida var oerhört viktigt när det gäller att stödja Kurdiska Biblioteket.

Därför var det precis lika viktigt att komma hit idag och få inviga detta egna kurdiska huset som kan vara ett hem för er verksamhet i Sverige. Hur viktig det att ha eget ställe? Det som har varit på föreningarnas hus, medborgarhus, folketshus-, vad det har betytt för vår identitet så att vi har kunnat bli medborgare i landet fullt ut. Det var ett tag sedan då man som medlem inom arbetarrörelsen upplevde att man inte var fullvärdiga medborgare av språkliga skäl eller av att man kommer från andra delar av världen. Som man kommer kanske från

”Det kurdiska språket och kurderna har en plats i mångfaldens Sverige”

andra delar av landet och det var kolossalt viktigt att känna denna händelse. Jag tycker dessutom att det nog bakgrunder det som sker just nu och som har skett under våren när det gäller kurdiska språket. Sen är det viktigt att få vara och markera regeringens agerande mot åtalet mot Mehmet Uzun. En svensk medborgare som åtalades för att han skulle syssla med separatism då han skriver om sitt eget liv, om kurdiska språket och om kurder. Detta är ju totalt främmande för oss. Nu lades åtalet ned men han blev ändå tvungen att åka dit. Det där tror jag var en viktig händelse, inte bara för Uzun, för alla författare, Opionsbildare och politiker.

Från regerings sida har vi klart deklarerat att detta icke är något som kan accepteras i ett demokratiskt land. Vi accepterar inte det och vi kommer noggrant att följa allt som händer kring det åtalet.

Han kunde ju inte veta hur det skulle sluta. I andra delar av världen som engagerar sig utan i högsta grad för oss i Sverige som oberoende av parti politisk tillhörighet engagerar oss djupt i fallet Mehmet Uzun. Mehmet fick komma hem igen som en segrare. Det har lagts fram ett reformpaket i Turkiet alldeles nyss som handlar om hur konstitutionen nu ska förändras enligt men det kommer inte att räcka. Det kommer att krävas väldigt mycket mer när det gäller annan lagstiftning. Vi vet ju också att M. Uzun nu återigen har blivit störd.

Han har svårt att koncentrera sig på att skriva, att vara en författare fullt ut därför att han återigen har ett åtalshot mot sig.

Jag kan nämna att jag känner en stor sorg över att det just nu finns ett annat hus, Rinkeby folketshus-, som befinner sig i en oerhört svår kris. Det känns därför skönt att få komma till ert kurdiska hus där ni ska samsa, riksförbundet, kvinnoorganisationen och ungdomsorganisation. Jag hoppas att ni ska ha mycket roligt här. Det är ju en plats där man möts naturligt för att känna gemenskap, för att ha roligt tillsammans. Det kan vara ett ställe där man för ganska tuffa diskussioner också och naturligtvis öppnar sig för dom som inte tycker likadant så har det ju alltid varit på de andra föreningshusen och så kommer det förstås vara här också.

Det känns som en väldigt bra tidpunkt att få vara här och markera att ni har fått ett hem här i Nacka. Att det kurdiska språket och kurderna har en plats i mångfaldens Sverige. Det är så viktigt precis som mötets öppnare förklarade att kurder ska vara, är redan men ska fortsätta vara och bli en högre grad, en viktig del av Sverige och det svenska samhällslivet. Då är det ganska bra att känna sig hemma på många ställen. Då skall jag alldeles strax förklara själva hemmet invigt och sen är det ni som skall fylla den med innehåll och värme och det har ni ju egentligen redan börjat.

”Kurdiska Riksförbundet har genom de 20 år som har förflutit varit det enda organ som samlat majoriteten av kurderna i Sverige under ett paraply”

**Kurdistan Regionala Regering
Nordic Representation Taha
Barwarys tal vid invigning av
KRF:s nya lokaler 12 oktober 2001.**



Ärade deltagare,

Ärade Minister

- Kurdistan Regionala Regerings vägnar först och främst tack för Kurdiska Riksförbundets inbjudan. Jag känner mig hedrad att vara här.

Kurdiska Riksförbundet har genom de 20 år som har förflutit varit det enda organ som samlat majoriteten av kurderna i Sverige under ett paraply. Kurdiska Riksförbundet har bidragit bl.a med opinionsbildning för kurderna genom demonstrationer, seminarier, media-framträdanden och kontakter med svenska myndigheter och organisationer.

Det är värt att nämna att mycket av det som har åstadkommit är tack vare den svenska statens och den organiserade Sveriges förtjänst. Utan en sådan politik skulle det ha varit betydligt svårare att kunna klara Riksförbundets viktiga uppgifter under så lång tid. Sverige har ställt up då vi har haft det som svårast.

Denna viktiga dag vill jag samtidigt som jag för Kurdistan Regionala Regerings räkning gratulerar Er till dessa nya fina lokaler, betona att arbetet för att integrera kurderna i det svenska samhället och skapa broar mellan kurder och svenskar kräver nya krafter och inte minst unga förmågor. I det komplexa samhället behövs det mera kunskap och kunnande som i sin tur ger Kurdiska Riksförbundet nya möjligheter att höras och påverka. Dagens invigning ger bättre möjligheter att åstadkomma detta.

Jag vill rikta ett särskild tack till Marita Ulfskog, Sveriges kulturminister som trots ett hektiskt program är med oss. Du ska veta att din närvaro är uppskattad.

Tack för att ni lyssnade

”Kurdiska riksförbundet kräver att Danmarks regering ställer Khazneci inför rätta

Till UD Danmark

Kurdiska riksförbundet är en paraplyorganisation för 38 kurdiska föreningar med 8 500 medlemmar i Sverige. Genom våra lokala avdelningar och enskilda medlemmar har vi fått kännedom att en av Saddam regimens generaler Nizar Kazneci befinner sig i Danmark som asylsökande.

Vår Syrelse tog upp fallet Nizar Khazneci i sitt sammanträde den 13 oktober 2001 och beslutade att med ett brev protestera hans närvaro i Danmark.

Enligt våra källor och referenser från Kurdistan är Khazneci med Saddam Hussein i spetsen ansvariga för tusentals civilas liv under perioden 1986-1991. Under denna period har regimen systematisk använt kemiska stridsmedel mot de civila kurderna i irakiska Kurdistan. Khazneci är också en av de främsta ansvariga för folkmordet i Halabja 1988 då mer än 5000 civila miste sina liv och tusentals kurder blev sårade av kemiska anfallet i staden. Än idag får vi rapporter om sviterna av detta folkmord.

Kurdiska riksförbundet kräver att Danmarks regering ställer Khazneci inför rätta och till svars för sina gärningar som krigsförbrytare och som en av de ansvariga för folkmordet i irakiska Kurdistan.

2001-10-17

Med vänliga hälsningar

Keya Izol
Förbundsordförande

Angående passhandlingar för irakiska kurder

Migrationsverket
Att: Magnus Ryden
601 70 Norrköping

Angående passhandlingar
för irakiska kurder



Vid ansökan om passhandlingar, både främlingspass och resedokument, har migrationsverket varit positiv till att bevilja irakiska kurder dessa. Denna praxis har dock på sistone förändrats och många av våra medlemmar har fått avslag på sina ansökningar och hänvisats i stället till irakiska ambassaden. Detta har skapat internt problem inom gruppen många kan mistänka varandra för samarbete med den regimen när de vänder sig till irakiska ambassaden. De flesta av irakiska kurder är icke villiga att vända sig till irakiska ambassaden och avslöja sin identitet p g a rädsla för repressalier och förföljelse av anhöriga i hemlandet.

Det är riktigt att en del av Irakiska kurder kommer till Sverige som anknytning, men majoriteten av dem är knutna till de som har beviljats uppehållstillstånd av flyktning eller flyktingliknande skäl. Det kan även nämnas i detta sammanhang att den psykologiska följderna av kontakten med ambassaden är av vikt både för sökanden och andra irakiska kurder runtomkring.

Migrationsverket har även avslagit ansökan för irakiska kurder med asylhistoria, dvs de som vid ankomsten har sökt asyl och beviljats uppehållstillstånd av flyktingsskäl eller åtminstone omfattas av förordning av mottagandet av flyktingar.

Under vårt möte den 28 augusti tog vi upp denna problematik med Er. Ni skulle ta upp detta med olika passenheter på migrationsverket och begära att handläggarna ta hänsyn till det sagda och eventuellt ha mjukare hållning i frågan. Jag vill underrätta Er att vi fortfarande får många liknande förfrågningar från våra medlemmar som upplever denna svårighet på passenheter.

2001-10-19

Med vänliga hälsningar

Keya Izol
Förbundsordförande

**”Kurder i Sverige
och även i Kurdistan
har stora förhoppningar
från ert parti ”**

**Till Socialdemokraternas
Kongress,**

5-11 november Västerås

Kurdiska riksförbundets vägnar vill jag skicka våra varma hälsningar till Er Kongress den 5-11 nov 2001 och önskar all framgång för ert arbete. Kurder i Sverige och även i Kurdistan har stora förhoppningar från ert parti för ett aktivt stöd och initiativ för det kurdiska folkets kamp för sina grundläggande fri och rättigheter.

Vi ser fram emot en mer initiativrik period i detta avseende av Er som Sveriges regerande parti. Kurdiska riksförbundet som en del av den aktiva folkrörelsen i Sverige har alltid strävat efter ett bättre samarbete med företrädare från Ert parti från regerings och departement nivå till ungdoms och kvinno nivå ända till lokala nivåer.

Vi uppskattar det starka engagemanget som finns på alla nivåer för den kurdiska frågan. Det är vår förhoppning att även för det framtida arbetet att verka för bredare solidaritet, förstärkande av mångfald och humanismen, mot etnisk diskriminering och rasism. Det är också vårt önskemål att kunna vara närvarande i Er kommande Kongress.

Med vänliga hälsningar

Keya Izol
Förbundsordförande

”Kvinnohälsa & Sexualitet”

**Projektledaren
Sukran Baksi:s
tal inför
konferensen
20-21 okt 2001**

Hej och välkomna!

Jag vill hälsa er alla deltagare och föreläsare varmt välkomna till den här konferensen som är en del av projektet ”Kvinnans Hälsa och Sexualitet”. Det anordnas i samarbete med Folkhälsoinstitutet.

Jag vill därmed passa på att tacka Mariana Buzaglo från Folkhälsoinstitutet som har hjälpt oss mycket med detta projekt och förberedelser för denna konferens.

Ett av målen som vi strävar efter genom att organisera dessa konferenser är att öka medvetandet hos kvinnor och ungdomar om sexuella överförbara sjukdomar samt att skapa förståelse för öppna samtal om just sexuellt överförbara sjukdomar sexualitet och dess samband med kvinnans hälsa.

Det kurdiska samhället har som bekant inte den öppenhet i dessa frågor som det finns i det svenska samhället. Därför är det av yttersta vikt att vi försöker bryta tystnaden om de här frågorna bland kurder och utvecklar förutsättningar för

öppna och offentliga samtal angående dessa ämnen. Inte minst visar intresset för att delta i den här konferensen det stora behovet av att inhämta kunskap och att ha öppna samtal om de här frågorna.

Vi i Kurdistans Kvinnoförbund utgår ifrån att kvinnans hälsa och sexualitet inte bara handlar om just hälsa och sexualitet. Projektets huvudsakliga innehåll har en direkt koppling med samlevnadsfrågor och familj- och generationskonflikter i det Kurdiska samhället i Sverige.

Vi hoppas att detta projekt leder till mer öppenhet, jämställdhet och jämlikhet bland kurder i Sverige och att det förbättra kvinnornas hälsa.

Avslutningsvis vill jag tacka våra föreläsare som under två dagar kommer att ge oss viktiga kunskaper och information i olika ämnen som berör oss kurdiska kvinnor.

Våra föreläsare är Semal Celiker läkare från Västerås, Devrim Nujen jurist, Anne-Katrin Bark advokat, Bernardita Nu”ez ordförande för ”Terrafem” och Lena Morbrandt ansvarig för Lafas hälsofrämjande arbete kring kvinnors sexualitet.

Ännu en gång hjärtligt välkomna!

Ett telegram från Integrationsminister i Sverige Mona Sahlin

Till deltagare och medverkande vid konferensen ”kvinnors hälsa och sexualitet” vid Nynäsgården 20-21 oktober 2001-12-11

Jag har tagit del av det spännande och inspirerande program som ni kommer att ta del av denna helg och känner att det är precis mer av denna varan som vi behöver. Kunskap är makt. Därför att med kunskap börjar man att ifrågasätta saker och ting. Man vill förändra saker - till det bättre. Tillsammans kan vi försätta berg och ingen ska hindra oss.

Jag vill med denna korta hälsning önska er lycka till med konferensen och hoppas att ni får en givande och rolig helg!

2001-10-12

Med vänlig hälsning

Mona Sahlin



Integrationsminister i Sverige
Mona Sahlin

Om "Kvinnohälsa & Sexualitet"

Kära medlemmar!

Kurdistan Kvinneförbund i Sverige tillsammans med Folkhälsoinstitutet anordnade den 20-21 okt en konferens om "Kvinnohälsa & Sexualitet" på Nynäsården i Nynäshamn.

Under dessa konferensdagar har 80 kurdiska och svenska deltagare utbytt kunskap och erfarenheter gällande kvinnosjukdomar, kvinnohälsa, våld mot kvinnor och de unga kvinnors levnadsvillkor i Sverige.

Konferensen innehöll föreläsare som Mariana Buzaglo- från Statens Folkhälsoinstitutet, Semal Celiker- allmän läkare. Devrim Nujen- jurist. Anne-Katrin Bark- advokat. Bernadita Nunez- ordförande Terrafem och Lena Morbrandt- ansvarig för LAFA.

Arbetet bestod av grupparbeten och gruppdiskussioner i respektive ämne.

Ett telegram från Sveriges integrationsminister Mona Sahlin skickades till konferensen där hon tackar och önskade oss lycka till.

På lördag kvällen anordnades en fest för deltagarna där musikgruppen Hessen Mella och Cudi sjöng och spelade kvällen lång. Det blev en trevlig fest som uppskattades av alla.

Vi tackar en än gång alla föreläsare och deltagare som har bidragit till en lyckad konferens.

Siliva Cegerxwin
Styrelseledamot

Kurdistan Kvinneförbund
i Sverige

Pressmeddelande

Protestera mot domslutet i Jönköping

Med en stor besörtning fick vi vetskapen om att polismannen som sköt den kurdiska flyktingen Idris Demir i Jönköping har blivit friad i tingsrätten i måndags.

Idris Demir blev flykting p g a han blev ständigt måltavla för turkiska polis och säkerhetsstyrkor. Han flydde därför från Turkiet och sökte skydd i Sverige som han hade tilltro som ett demokratiskt land. Sverige skulle vara det land som skulle skydda honom som en världsmedborgare och garantera honom de demokratiska fri och rättigheterna som han saknade i sitt hemland.

Hans sanna historia att han som kurd blev trakasserat och kränkt av den turkiska regimen räckte inte till för en fristad i Sverige. Han fick avslag av svenska myndigheterna.

Det var mänskligt att han blev rädd av en rutin kontroll av polisen. Han försökte fly precis som han flydde från Turkiet. Han blev skjuten precis som han skulle bli skjuten i Turkiet. Han är död av en polisman och den skyldige blir friad av en svenska domstol. Många övergrepp och polisiära våld fällt inte i turkiska domstolar eftersom hela processen är styrd uppifrån. Vem styrde domstolen i det aktuella fallet ?



**Kurdiska
Riksförbundet**

2001-11-14

Alla vet att den av domstolen friade polismannen är skyldig och han har dödat en värnlös oskyldig kurdisk flykting. Den skyldige måste få sitt straff oavsett om han är polis eller en annan medborgare. Detta borde vara huvudregel i en demokrati. Om en skyldig eller våldsutövare inte fällt kan tilltron på den svenska domstolen skadas allvarligt.

Vi kommer att fortsätta engagera oss med all kraft mot orättvisan i Idris Demirs fall och även andra orättvisor som sker mot Sveriges invandrar och etniska grupper. Domen i Jönköping är en högsta grad kränkande av demokratisk huvudprincip och vi kommer att bekämpa detta.

Vi kräver att Sverige med sin regering, myndigheter, frivilliga organisationer reagerar mot detta och kräver en rättvis rättegång mot Idris Demirs mördare.

Keya Izol
Förbundsordförande

Berbang

Kurdiska Riksförbundets Tidskrift No: 122* 2001

Anförande av Seyran Duran, Ordförande i Kurdistans Kvinnoförbund i Sverige på seminariet "Integration, på Vems Villkor" den 20 november 2001

Ämnet är i många avseenden komplicerad och när det tas upp till diskussion tillsammans med ett redan svårt och för många i samhället otydligt begrepp, nämligen integration blir det ännu komplicerad.

Om vi utgår ifrån att integration betyder delaktighet med bibehållen integritet och olikhet vilket inte minst jag utgår ifrån, är mitt svar på frågan om "Invandrarföreningar bidrar eller hämmar de kvinnors och flickors integration"? blir otvetydigt JA.

En av demokratins grundpelare utgörs av organisationsfrihet. Rätten och möjligheter till att organisera sig i föreningar handlar inte bara om att skapa mötesplatser för likasinnade individer eller för gemensamma mål. Det handlar i samma utsträckning om att vara delaktig i beslutsprocessen i samhällslivet och därmed att ha makt i samhället, inte minst i demokratiska samhällen.

Eftersom integration för mig betyder delaktighet, jämlikhet och jämställdhet med bibehållen integritet och olikhet i fråga om etniska, språkliga, kulturella, politiska bakgrund, och kan inte förverkligas någon annan stans än där människor möts tycker jag att invandrarföreningar skall vara en mötesplats som främjar hela gruppens integration, inklusive kvinnorna och flickorna som utgör en stor del av respektive invandrargrupp. Därför tycker jag att första

frågan i ämnet egentligen bör handla om kvinnornas delaktighet i föreningslivet bland invandrar grupper. Om vi kan ge ett positivt svar på denna fråga, blir följdfrågan om invandrarföreningar över huvud taget främjar eller hämmar integrationen.

Men, så som i alla andra frågor i samhället ser verkligheten annorlunda ut än det som är önskvärd. Kvinnornas deltagande och makt i föreningar handlar om delaktighet, jämlikhet och jämställdhet. En förening som är bildad på gemensamma språkliga eller etniska grunder kan inte vara demokratisk om den inte främjar kvinnornas och flickornas, ungdomarnas delaktighet i föreningslivet. Sådana föreningar existerar. Å andra sidan finns det mer lyckade förebilder i invandrarnas föreningsliv. Föreningar vars medlemmar består av män och kvinnor, unga som gamla och styrs av kvinnor eller har stor antal aktiva kvinnliga medlemmar.

Vi, inom kurdiska gruppen och i Kurdistans Kvinnoförbund har haft positiva och negativa förebilder och erfarenheter. Jag upplever att kurdernas föreningsliv i stort främjar kvinnornas delaktighet och därmed jämlikhet och jämställdhet. Men, jag menar inte att vi har lyckats. Det återstår mycket att göra och många hinder att övervinna när det gäller jämlikhet och jämställdhet för kurdiska kvinnor i den kurdiska gruppen i Sverige. Kampen om jämställdhet och jämlikhet

kan inte begränsas med föreningslivet. Men jag tycker att för oss invandrare är föreningar en av de viktigaste platser och redskap för att gå vidare i kampen för ett jämlikare och med jämställdt samhälle.

Jag hoppas att informationen om Kurdistans Kvinnoförbundet struktur och representation i Kurdiska Riksförbundet kan ge Er en bild av det som vi har åstadkommit i fråga om delaktighet, jämlikhet och jämställdhet i föreningslivet bland kurder i Sverige.

Kurdistans Kvinnoförbund i Sverige bildades i december 1992. Innan Kurdistans Kvinnoförbund i Sverige bildades fanns enstaka kurdiska kvinnoföreningar i Sverige, dock den starkaste i Stockholm.

Så här ser Kurdistans Kvinnoförbundets organisation och representation i Kurdiska riksförbundet. (Overhead)

Avslutningsvis vill jag säga att, det finns inte något enhetlig bild i denna fråga bland invandrar föreningar, precis så som i det svenska samhällets egna organisationer, föreningar, fackföreningar osv. De föreningar som främjar och bidrar till kvinnornas delaktighet, jämlikhet och jämställdhet tycker jag att främjar också integrationen av kvinnorna och flickorna i det svenska samhället

ئاگادارىي لى لايەن كۆمىتەى ھاوكارىي ھىزە سىياسىيەكانى كورد و كوردستانىي لى سويد

كۆمىتەى ھاوكارىي ھىزە سىياسىيەكانى كورد و كوردستانىي لى سويد، دووى رېيەندان سالىرۆزى پەنجاشەشەمىن سالى دامەززانى كۆمارى ديموكرانى كوردستان پىرۆز دەكات. ھونەرمەندانى بەشدار : ناسر پەززانى ، قادر ئەلىياسى ، ئەردەلان ، قادر قوربانى و ... و كۆرى ھونەرىي يەكىتتىي لوانى ديموكرات لى سويد.

كات: ۲۰۰۲/۱/۱۹

كاترمىر : ۱۸،۰۰۰ واتە ۶ ئىوارە

شوين : سولنا ھالىن ، ستۆكھۆلم

ھەموو لايەك بەخىر بىن

كۆمىتەى ھاوكارىي ھىزە سىياسىيەكانى كورد و كوردستانىي لى سويد

و بەختىار لى كۆمەلەى بورۆس، رىزگار كىستەيى، رەمەزان عومەر حاجى و نىزانى عباس لى كۆمەلەى يۆنشۆپىنگ بەشدارىي كۆپونەوئەكەيان كورد. لى كۆپونەوئەكەدا چالاكىي كۆمەلەكان خويندراپەوئە و لەسەر كارو خەباتى ھاوبەش و پلانى كارىي دوارۆز گىفتوگۆيان كورد.

پۆزى ۲۰۰۱/۱۲/۹، كۆمەلەى فالون كۆنگرەى سالانەى پىكەپىنا و ئۆرگانەكانىي خۆى نۆى كوردەوئە و نۆينەرانى بۇ بەشدارىي كوردن لى كۆنگرەى فیدراسىيۇندا ھەلبۇارد. نورى سالىھ ئەندامى كۆمىتەى بە نۆينەراپەتتىي فیدراسىيۇن بەشدارىي كۆنگرەى كۆمەلەى فالونى كورد.

پۆزى ۲۰۰۱/۱۲/۹، كۆمەلەى لىنشۆپىنگ كۆنگرەى سالانەى پىكەپىنا و ئۆرگانەكانىي خۆى نۆى كوردەوئە و نۆينەرانى بۇ بەشدارىي كوردن لى كۆنگرەى فیدراسىيۇندا ھەلبۇارد. كۆفان ئامەدى بەرپرسىياري كۆمىتەى پەيوەندىيەكانى ناوخۆى فیدراسىيۇن بەشدارىي كۆنگرەى كۆمەلەى لىنشۆپىنگى كورد.

پۆزى ۲۰۰۱/۱۰/۲۱، ئەمىر جەرگىس بەرپرسىياري كۆمىتەى ھەرىمى پىنجەمى فیدراسىيۇن بەشدارىي كورد لى وتوويژىكى رادىيوى ھىقى لى مالوئى و وەلامى پىرسىياري بەپىوئەبەرانى رادىيوى و بىسەرانى سەبارەت بە چەند بابەتى گرنگ داپەوئە، لەوانە كوردنەوئە لۆكالى فیدراسىيۇن لى لايەن وەزىرى كولتورى سويد Marita Ulfskok و سەرلىدانى نۆينەرى ھۆكۈمەتى ھەرىمى كوردستان و پارتە سىياسىيەكانى كوردستان.

پۆزى ۲۰۰۱/۱۱/۱۱، كۆمەلەى فالشۆپىنگ كۆنگرەى سالانەى پىكەپىنا و ئۆرگانەكانىي خۆى نۆى كوردەوئە. عادل دەۋكى بەرپرسىياري كۆمىتەى ھەرىمى چوار بە نۆينەراپەتتىي فیدراسىيۇن بەشدارىي كۆنگرەى كۆمەلەى فالشۆپىنگى كورد.

پۆزى ۲۰۰۱/۱۲/۸، كۆمىتەى ھەرىمى چوارى فیدراسىيۇن چوارەمىن كۆپونەوئەى ھەرىمى خۆى بە سەرۆكايەتى بەرپرسىياري كۆمىتەى ھەرىم عادل دەۋكى لى شارى يۆنشۆپىنگ پىكەپىنا. شىخ كەمال لى كۆمەلەى فالشۆپىنگ، گەلاوئىز بابان لى كۆمەلەى يۆتتېۋورى، كەمال

چەند چالاکییەکی فیدراسیۆن و ئۆرگانەکانی



پەنابەرانی کوردیی ئەو ھەریتمە کوردستان لە سوید. بەشدارانی تری ئەو پرۆگرامە بریتی بوون لە Peter Springält بەرپرسی پەنابەرانی وەزارەتی دەرەوێ سوید سەر بە رۆژھەلاتی نیوهراسست و Magnus Ryden بەرپرسی بەشی پەنابەرانی باشوری کوردستان لە بەرپۆبەراییەتی پەنابەرانی سوید.

کۆمیتەیی گشتیی فیدراسیۆن لە چوارەمین کۆبوونەوێ ئاسایی خۆیدا، کە رۆژی ۲۰۰۱/۱۰/۱۲ بەستی، بریاریدا شکاتنامەییەک دژی ژینرال (نزار خەزرەچی) یەکیک لە تاوانبارانی بۆمبارانی کیمیایی ھەلەبجە و ئەنفالکردنی گەلی ئیمە لە باشوری کوردستان ئامادە بکات. خەزرەچی ئیستا پەنای بۆ دانمارک ھێناوە و لەوی دەژی. کۆمیتەیی کارگێڕ بۆ ئامادەکردنی ئەو شکاتە، داوا لە کۆمەڵەکانی دەکات، بریاری کۆمیتەیی گشتیی بە ئەندامان و کوردەکانی دانیشتووی شارەکانتان بگەینن و شکاتنامەیی بنەمالەکانمان بە دیاری کردنی (ناو، شوینی ئەنفال، میژووی ئەنفال و شەھیدانی ھەلەبجە) مان بە زووترین کات بۆ پەوانە بکەن.

ھەروەھا کۆمیتەیی کارگێڕ رۆژی ۲۰۰۱/۱۰/۱۷، نامەییەکی دەربارەیی تاوانبار نزار خەزرەچی ئاراستەیی وەزارەتی دەرەوێ دانمارک کرد و لە رۆژی ۲۰۰۱/۱۲/۱۲ شدا، شکاتییکی لەگەڵ ناو نیشانی ۱۲۶ ئەنفالکراو و شەھیدانی ھەلەبجەیی پەوانەیی وەزارەتی دەرەوێ دانمارک کرد. شایانی باسە کە ناوەکان لە لایەن کۆمەڵەیی یۆتیبۆرییەو بە فیدراسیۆن درابوون.

رۆژی ۲۰-۲۱/۱۰/۲۰۰۱، یەکیەتی ژنانی کوردستان کۆنفرانسییی دوو رۆژی لە نینسگۆرد Nynäsgård پیکھینا. ھەشتا ژنی کورد لە کۆمەڵەکانی ستۆکھۆلم، ئوسالا، قیستەرۆس، ئیسکیلستونا و یەقلە بەشداریی کۆنفرانسیەکیان کرد. لەو کۆنفرانسیەدا کە ژنی ھەر چوار پارچەیی کوردستانی تیدا بوو، ئەم بابەتانەیی خوارووە کەوتنە بەرباس و گفتوگۆیان لەسەر کرا:

- ۱- گفتوگۆ لەسەر نەخۆشیی ژنانە لە لایەن دوکتۆر شەمال چەلیک.
- ۲- گفتوگۆ لەسەر رەوشی کچان لە لایەن یاسازان دەوریم نوژەن.
- ۳- گفتوگۆ لەسەر لیدان و

دەستدێژیی بۆ سەر ژنانی پەنابەر لە لایەن Bennedita Nunez سەرۆکی مالی ژنانی نیونەتەوہیی.

۴- گفتوگۆ لەسەر مافی ژنان لە لایەن پاریزەر Ann Catrin Bark.

۵- گفتوگۆ لەسەر نەخۆشیی جنسیی ژنان لە لایەن Lena Mårbrand لیکۆلەر لە شارەوانیی ستۆکھۆلم.

ئێوارەیی رۆژی یەکەم بە ئاواز و گۆرائیی ھونەرماندان جودی و ھەسەن مەلا کۆتایی پێھات.

رۆژی دووھەم شەش گروپی کار لە ژنانی بەشدار پیکھات تا لە تەوہرەیی باسەکان ورد بنەوہ و بۆ بەشدارانی بخەنە پوو. لە ئاکامدا گروپەکان بەم ئەنجامە گەشتن:

۱- دایک و باوک دەبێ وەک ھاوڕێ لەگەڵ منالانیان رەفتار بکەن و گفتوگۆیان لە نیواندا ھەبێ.

۲- دەبێ باوەر و خۆشەویستی دوولایەنە لە نیوان گەرەکان و منالاندا ھەبێ.

۳- دایک و باوک دەبێ کاتی پێویست بۆ منالەکانیان تەرخان بکەن.

۴- دایک و باوک دەبێ ھەقالاتی منالەکیان بناسن و بەشداریی بکەن لە چالاکییەکانی خۆیگەکەیاندا.

۵- دایکانی کورد ھاوکاریی یەکتەر بکەن بۆ بەرەوپێش بردنی منالەکانیان بە بەشدارییکردنی لە کۆر و کۆمەڵەکان و کۆنفرانسیەکاندا.

رۆژی ۲۰۰۱/۱۰/۴، کەیا ئیزۆل بەشداریی پرۆگرامییکی کەنالی یەکی رادیۆی سویدی کرد، کە تاییەت بوو بە باروودۆخی گشتیی باشوری کوردستان و کیشەیی

له سه‌ره‌تای ئاشکرابوونی نه‌خۆشی شیرپه‌نجی، به سه‌رلیدانی له مال و نه‌خۆشخانه، به ته‌له‌فۆن و هاو‌دردیی نواندن، ده‌میک لیمان خافل نه‌بوون.

هر له یه‌که‌م چرکه‌ی ئاگاداریی له وه‌ستانی دلی کاک که‌ریم له کاتژمێر ۱۰۳۰ رۆژی ۱۰/۶/۲۰۰۱ به دواوه، لافاوی پرسه و هاو‌دردیی نیشان‌دان، به شیوه‌ی چۆراو‌چۆر نه‌پساوه‌توه و دۆست و ناسیاوانی کاک که‌ریم له هه‌موو به‌شه‌کانی کوردستان، له ئورویا، کانادا، خه‌فت و په‌ژاره‌ی خۆیان راده‌گه‌یه‌نن. رادیۆ کوردیی‌ه‌کان، ته‌له‌فیزیۆنه‌کان و رۆژنامه‌کان به تاسه‌وه، له‌م رۆداوه ده‌دوین و باسی که‌سایه‌تی و به‌ره‌مه‌کانی ده‌کهن و ئەم شه‌پۆله‌ی هاو‌دردیی نواندن و باسه به‌ربلاوه، نیشانه‌ی ئەمه‌کداریی و به‌ده‌نگه‌وه هاتنی دلسۆزانی نه‌توه‌که‌مان له کاتی رۆدانی ئەم کاره‌ساته دلته‌زینه دایه.

خۆشه‌ویستان!

گه‌لێن‌کمان پێخۆش بوو ته‌رمی کاک که‌ریم له ئامیزی نیشتمان‌ه‌که‌ی کوردستان له په‌نا گل‌کۆی شه‌هید پێشه‌وا قازی محمه‌د و هه‌فالانی، له په‌نا سلیمان موعینی و کاک هه‌ژار و ماملی، له نزیک شه‌ریف زاده و ئاواره، یان له باشوری رزگارکراوی کوردستان له په‌نا ته‌رمی رابه‌ری میژوویی کورد مه‌لا مسته‌فا بارزانی و ده‌یان که‌سایه‌تی ناو‌داری رێبازی ئازادی کوردستان به خاک سپێزایا. به‌لام مخابن له ویست و داخوای ئێمه‌را تا ده‌ره‌تان ولوانی ئەو ئاواته مه‌ودا زۆره.

ده‌لتی چی؟ ئەمه چاره‌نووسی کورده که رۆله هه‌ره فیداکاره‌کانی به ده‌ستی دوژمنانی ده‌کرینه قوچی قوربانی و مل به په‌ت و سنگ به گولله‌پژاو، وینه‌ی شیخ سه‌لام، شیخ عه‌بدولقادر، شیخ سه‌عید، دوکتۆر فوئاد، سمکو، پێشه‌وا قازی و هی تر ده‌بنه مه‌شخه‌لی ئازادی بۆ رێبوارانی رێبازه‌که‌یان، به‌هۆی پیلانگیزی و پاله‌په‌ستۆی دوژمانانی ئازادی و دیموکراسی، داگیرکه‌رانی کوردستان ناچار ده‌کرین رێگای هه‌نده‌ران و ئاواره‌یی بگرنه به‌ر و به هه‌زاران تاسه‌وه دور له زیدیان، یان به مه‌رگ سه‌ر بنینه‌وه، وینه‌ی شیخ عوبه‌یدیلا نهری، مه‌ولانا خالیدی نه‌قشبه‌ندی، نالی، حاجی قادری کۆیی، به‌درخانیه‌کان، ئیحسان نوری پاشا، مه‌لا مسته‌فا، ئازاد مسته‌فا و کاک که‌ریم، یان گه‌لێک له‌وانه، له دووره ولاتیش ده‌کرینه ئامانجی تیری دوژمنان و له به‌ندیخانه، وینه‌ی سه‌ید عوبه‌یدیلائی ئیسحاقی، زه‌بیحی و قزلجی له‌ناو ده‌برین یان وینه‌ی دوکتۆر قاسملوو و براده‌رانی له به‌ناو وتووێژدا ده‌که‌ونه به‌ر ده‌ستریژ و شه‌هید ده‌کرین یان وه‌ک شه‌ره‌فکه‌ندی و هاو‌پێیانی، له میکونۆسی برلین ده‌کرینه نیشانه‌ی تیروریسته‌کانی کۆماری ئیسلامی و دلی پر له ئاواتیان له لیدان ده‌که‌وئ.

ئازیزانی ماته‌مینی کۆچی کاک که‌ریم، کاک که‌ریمی شینگیزی شه‌هیدانی هه‌له‌بجه و ئەنفالکراوه‌کان و هه‌زاران شه‌هیدی بارزانی بیسه‌روشوین کراو، هه‌ر ئیستا به ناشتنی کۆچکردوو، که‌سایه‌تییه‌کی تر له ژماره‌ی گۆرغه‌ریبانی هه‌لوه‌دای ئازادی کوردستان زیاد ده‌بی، که‌سایه‌تییه‌ک، که له سه‌ره‌تای فام کردنه‌وه‌وه تا مردن، ئاواتی رزگاریی گه‌ل و ولاته‌که‌ی بوو، له‌م پێناوه‌دا پیوی زیندان و ئاواره‌یی له‌خۆ هه‌لسوو. دوا‌ی سه‌رکه‌وتنی شوێشی گه‌لانی ئیزان تا سالی ۱۹۸۴ به‌وپه‌ری له‌خۆبو‌ردویی و ماندوویی نه‌ناسیه‌وه، خزمه‌تی بزافی رزگاریخو‌ازی نه‌توه‌که‌ی کرد و له ئاواره‌پێشدا، به‌نوسینی بیره‌وه‌رییه‌کان و چه‌ند کتییی تر له بواره جیاوازه‌کاندا و وه‌رگیزی ژماره‌یه‌ک کتیب بۆ سه‌ر زمانی کوردی، سه‌رجه‌م ۴۴ به‌رگ نوسراو و وه‌رگیزی بێشکه‌شی کتیبخانه‌ی کوردی کرد.

خۆشه‌ویستان!

سه‌ری ریز بۆ ئیوه‌ی به‌شدار له‌م کۆری ناشتنه‌دا و هه‌موو ئەو حیزب و ریکخراو و که‌سایه‌تی و دۆستانه داده‌نوین، که به هاو‌دردیی ده‌برین، له خه‌م و مه‌ینه‌تی ئێمه‌یان که‌م کرده‌وه و نایشارینه‌وه، که به ده‌نگه‌وه هاتنی به‌ریز مه‌سه‌ود بارزانی و کاک نیچیرقان بارزانی و رابه‌ریی و کادیر و ئەندامانی پارتی دیموکرات و رابه‌ریی حیزبی شیوعی کوردستان، هه‌ر له یه‌که‌م رۆژی ئاگاداربوونیان له نه‌خۆشیی کوشنده‌ی کاک که‌ریم به‌دواوه جێگه‌ی ریزه. ئەمه که کاک نیچیرقان بارزانی له زمان کاک مه‌سه‌وده‌وه ئاگاداری کردین، که ناماده‌ی هه‌رچه‌شنه یارمه‌تیه‌کن بۆ چاککردنه‌وه‌ی کاک که‌ریم له هه‌ر شوێنیک و هه‌رچه‌نده‌ی تی بجی، له‌بیر بنه‌ماله و دۆستانی کاک که‌ریم ناچینه‌وه.

به بروای ئێمه، ریزی راسته‌قینه له کاک که‌ریم و گشت هه‌لوه‌دایانی رێگای ئازادی، ریزان له‌بیر و رایان، له پێش‌نیاره به‌که‌له‌که‌کانیان و دابینکردنی هه‌رچی خیراتری یه‌ک خسته‌نه‌وه‌ی بی گری و گۆلی مالی کورد له باشور و به‌هیزکردنی ئەو ئەزمونه‌یه و هه‌روه‌ها هاو‌کاریی و به‌ره‌وه‌پێش بردنی یه‌کیارچه‌ کردنی بزافی مافخو‌ازی کورد له هه‌رکام له به‌شه‌کانی تری کوردستان به شیوه‌یه‌کی دیموکراتی و دور له مه‌زنخو‌ازیه.

با به سلوو له رۆحی پاکی گشت شه‌هیدانی کوردستان، سلوو له رۆحی کاک که‌ریم و گشت ئەو گۆرغه‌ریبانه‌ی بۆ کوردستان ژیان و بۆ کوردستان مردن و سوپاسی هه‌موو ئیوه‌ی به‌ریزی به‌شدار له ناشتنی کۆچکردوو، کۆتایی به قسه‌کانمان بێنین. دیسان سوپاسی ئیوه‌ی ئازیزان ده‌که‌ین و سه‌رکه‌وتنتان به ئاوات ده‌خو‌ازین.

هه‌ر بێژین

كۆرى پرسە و ماتەمىن بۇ كەرىم حسامى



رۆژى ۲۰۰۱/۱۰/۱۴، تەرمى كەرىم حسامى سىياسى، نوسەر و وەرگىزى كورد له گۆرستانى تىنستا له ستۆكھۆلم به خاك سپىزرا. مامۆستا حسامى رۆژى ۲۰۰۱/۱۰/۶ به ھۆى نەخۆشى شىزپەنجەى مېشكەوھ كۆچى دوايى كرد. له رېورەسىمى به خاك سپاردنى تەرمەكەيدا سەدان نوسەر و روناكبير و نوینەرانی رېكخراوھ سىياسىيە كورد و كوردستانىيەكان بەشدارىيان كرد، پەيامى بنەمالەى حسامى له لايەن محەمەد ئەمىنى سىراجى دۆستى دىزىنى حسامى خویندرايەوھ.

كۆمىتەى كارگىزى فیدراسیون به ھاوكارىي بنەمالە و دۆستانى حسامى، كاتژمىر دووى پاش نیوهرۆى ۲۰۰۱/۱۰/۱۴ كۆرىكى پرسە و ماتەمىنى بۇ خوالنخۆشبوو له ھۆلى شىستانىزىقى ستۆكھۆلم پىكھىنا. كۆرەكە به ئاوازی شمشالى ھونەرەند قالەمەرە و دەنگى كەرىم حسامى كه ۲۲ سال له مەوبەر له ھەلمەتى تەبلىغاتىي ھەلبژادنى خولى يەكەمى پەرلەمانى ئىراندا له گوندى قالوئى ناوچەى نەغەدە لەسەر ژيانى خۆى دابوو، به راگەياندىنى خولەكىك بىدەنگى كۆرەكە كرايەوھ.

له سەرەتای كۆرەكەدا كه سەدان كەس بەشدارىيان تىداكرد، پەيامى بەرىز مەسعود بارزانى سەرۆكى پارتى ديموكراتى كوردستان خویندرايەوھ و ئاماژە به پەيامى سەرۆكى پەرلەمانى كوردستان دوكتۆر رۆژ نورى شاوھيس و سەرۆكى حكومەتى كوردستان بەرىز نىچىرفان بارزانى كرا و پەيامى مەكتەبى سىياسى پارتى ديموكراتى كوردستان و نوینەراییەتى حكومەتى ھەرىمى كوردستان له باكورى ئەوروپا خویندرايەوھ.

دوا به دواى ئەوھ، پەيامى كۆمىتەى ھاوكارىي ھىزە سىياسىيەكانى كورد و كوردستانىيە له سوید، حىزبى ديموكراتى كوردستانى ئىران، فیدراسیونى كۆمەلە كوردستانىيەكان له سوید، كۆمىتەى رېكخستنەكانى يەكەتى نىشتمانى كوردستان له سوید، مەكتەبى سىياسى حىزبى شىوعى عىراق، حىزبى شىوعى كوردستان، حىزبى سۆسىاليستى كوردستان، بەرىزان جەوھەر نامىق سالم، غەنى بلورىان، شاعىر عەبدوللا پەشىنو، يەكەتى نوسەرانی كورد له سوید، دەستەى نوسەرانی بەربانگ، حىزبى كۆمۆنىستى كارگەرىي

عىراق، سازمانى خەباتى شۆرشگىز، بەرىزان دوكتۆر سالىح ئىبراھىمى، دوكتۆر جەمشىدى حەيدەرى، ممتاز حەيدەرى، گولمەراد مورادى، سازمانى فدائىيانى ئەكسەرىيەتى ئىران، كۆمەلەى شۆرشگىرانى كوردستان، رادىوئى ئاشتىي، رادىوئى مولتى كولتى، بەرىزان ئىلاھە و فەرەيدونى مېتران، ئەحمەد سەفا، بورھان مەحمود بۆر و دلشاد بارزانى و دەيان پەيامى تر، كه خویندەنەوھيان چوار كاتژمىزى خاياند، بەرىزان سەعيد كاوھ، بەرۆژ ئاكەرىي، دوكتۆر حوسىن خەلىقى، قەرەنى قادرى و چەند دۆستى دىزىنى ترى حسامى له كۆرەكەدا لەسەر ھەول و تىكۆشانەكانى دوان.

شاپيانى باسە، كه حامىد گەوھەرى ئۆرگانىزەى كۆرەكەى كردبوو. عاسى رەبەاتى، ناسر سىنا و گۆفان ئامەدى بەرپۆھيان برد و تەواوى خەرجىي رېورەسىمى به خاك سپاردن و كۆرەكە له لايەن نوینەراییەتى حكومەتى ھەرىمى كوردستان له سوید داين كرا. دەقى پەيامى بنەمالەى حسامى بەمجۆرە بوو:

خوشكان و برايانى بەرىز !

بەشدارانى كۆرى ماتەمىنى ناشتنى رۆلەى به ئەمەكى نەتەوھى كورد كاك كەرىم حوسامى. به ناوى بنەمالەى حوسامى، خزمانى نزىك و دورى و به ناوى خۆم و خىزانم وەك دۆستىكى دىزىن و به وھفاى كاك كەرىم، سوپاسى ئامادەبوونتان لەم كۆرەدا دەكەين و سوپاسى ھەموو ئەو كەسانە دەكەين، كه ھەر

دیمانه‌یه‌ک له‌گه‌ل هونه‌رمه‌ند قادری قوربانی

ئاماده کردنی عیزه‌ت فه‌رخه

له فالونه‌وه ئه‌م چاوپیکه‌وتنه له‌گه‌ل هونه‌رمه‌ند قادر قوربانی کرا.

پ- ده‌کری خۆتان به‌ خۆینه‌رانی به‌ربانگ بناسین ؟

و- ناوم قادر قوربانی یه، له‌ گوندی شیناویی سهر به‌ پیرانشار له‌ دایک بووم و سالی ۱۹۹۶ هاتومه‌ته‌ سوید و ئیستا له‌ شاری فالون ده‌ژیم.

پ- له‌ چ سالی‌که‌وه ده‌ستت به‌ گۆرانی وتن کردووه ؟

و- ههر له‌ مندا‌لییه‌وه گۆرانیم وتوووه و خه‌لک به‌ ده‌نگ‌خۆشیان ناسیوم، به‌ تاییه‌تی له‌ قوتابخانه‌دا، چونکه‌ له‌وئ گۆرانیم ده‌وت. له‌ سالی ۱۹۹۲وه وه‌ک گۆرانیبیژ گۆرانی ده‌لیم.

پ- مه‌به‌ستت ئه‌وه‌یه‌ که‌ وه‌ک بیه‌شه‌ گۆرانیی ده‌لیی یان بیه‌شه‌یه‌کی تریشت هه‌یه‌؟

و- من وه‌ک بیه‌شه‌ گۆرانیی ده‌لیم و کاریکی ترم نیه‌.

پ- هه‌تا ئیستا چهند گۆرانیبیت وتوووه‌؟

و- تا ئیستا یانزه‌ گۆرانیی و سرودم هه‌یه‌ و زیاتر له‌ یانزه‌ پرۆگرام هه‌بووه‌ و گۆرانیی جۆراجۆرم وتوووه‌.

پ- کئ ئاوازی گۆرانییه‌کانت بۆ ئاماده‌ ده‌کات؟

و- زۆریه‌ی گۆرانییه‌کانم له‌سه‌ر ئاوازی خۆم تۆمارم کردوون و له‌ ئاوازی که‌سیکی تر که‌تکم وه‌رنه‌گرتوووه‌.

پ- هونه‌ری گۆرانیی کوردیی له‌ چ پله‌یه‌کدا ده‌بینی؟

و- ئه‌گه‌ر بیه‌ت و گۆرانیی کوردیی له‌گه‌ل هی هیندی له‌ گه‌لانی تر به‌راورد بکه‌ین، بۆ وینه‌ له‌گه‌ل گۆرانییه‌کانی رۆژئاوا، ده‌لیم ئیمه‌ نه‌گه‌یه‌شتووینه‌ته‌ ئاستی ئه‌وان، له‌گه‌ل ئه‌وه‌شدا ئیمه‌ش وه‌ک گه‌لانی رۆژه‌لاتی نیوه‌راست و ئاسیای رۆژه‌لات خاوه‌ن گۆرانیی به‌ سۆز و پیتشکه‌وتووین و هونه‌ری ئاواز و گۆرانیمان پئ به‌ پیتی کولتور و پیتشکه‌وتنه‌کانی ترمان گه‌شه‌ی سه‌ندوووه‌.

پ- ئاستی گۆرانیی کوردیی له‌ ده‌ره‌وه‌ی و‌لات چۆن ده‌بینی؟

و- به‌ بۆچوونی من هه‌رچه‌نده‌ گۆرانیبیژه‌کانی کورد له‌وه‌یه‌ری بئ ئیمکاناتییدا گۆرانیی ده‌لین، به‌لام به‌شیک له‌



گۆرانییه‌کانیان که‌ش و هه‌وا‌ی تازه‌ به‌و هونه‌ره‌ ده‌به‌خشن و یارمه‌تی ده‌دن، ته‌نانه‌ت به‌ به‌ره‌ویشه‌وه‌ چوونی فه‌ره‌هنگی که‌له‌که‌مان و تام چیژئیکی تاییه‌ت به‌ ده‌ره‌وه‌ی ولاتیان هه‌یه‌.

پ- پانان له‌سه‌ر گۆرانییه‌ ره‌سه‌نه‌کانی کوردیی چیه‌؟

و- من گۆرانییه‌ ره‌سه‌نه‌کانی کوردیی به‌ پایه‌ی هونه‌ری گۆرانیی کوردیی ده‌زانم و هه‌تا بلیتی به‌ تام و چیژن، ئاستیان به‌رزه‌. مرۆف که‌ گوئ له‌ حه‌یران ده‌گریت، یان لاوک، هۆره، قه‌تار و ئه‌للاره‌هه‌یسی و باش سه‌رنجیان ده‌دات، ئه‌وکاته‌ ده‌زانن، که‌ گه‌لی کورد خاوه‌ن چ کانگایه‌کی له‌بن نه‌هاتوووه‌ له‌ هونه‌ری گۆرانییه‌ ره‌سه‌نه‌کانییدا. ته‌نانه‌ت لێره‌ له‌ ده‌ره‌وه‌ی ولاتیش بۆنی سه‌روشت و دیمه‌نه‌ جوانه‌کانی کوردستانیان لئ دئ.

پ- چ پرۆگرامیکت بۆ رۆژانی ئاخیری سال ئاماده‌ کردووه‌؟

و- رۆژی ۲۰۰۲/۱/۱۹ به‌شداریی جه‌ژنی دووی ریه‌ندان، سالتروژی دامه‌زرانی کۆماریی کوردستان ده‌که‌م، که‌ له‌ لایه‌ن هه‌یزه‌ سیاسییه‌کانی کورد و کوردستانییه‌وه‌ پیکدی.

دیمانهیهک له گهډ کۆمهلهی ئویریرۆ دا

ئاماده کردنی کهریم قه‌لادزهیی

کۆمه‌له‌ی کوردیی له شاری ئویریرۆ ساڵی ١٩٨٥ به ئه‌ندامی فیدراسیۆن وه‌رگیراوه. به‌ریانگ له روهتی ناساندنی کۆمه‌له‌کانی سه‌ریه فیدراسیۆندا به خۆینه‌راتی، دیمانه‌یهکی له‌گه‌ډ ئه‌ندامانی کۆمیته‌ی کارگه‌ڕی کۆمه‌له‌ پیکه‌ینه‌نا. ئه‌وانه‌ی به‌شداریی ئه‌و وتووێژه‌یان کرد بریتی بوون له به‌ریزان: نوری سالیح، ره‌سول بایه‌زی، که‌ریم قه‌لادزه‌یی، شه‌هلا هه‌ریزی و عوسمان کاشانی.



پ- که‌ی کۆمه‌له‌که‌تان دامه‌زراندووه‌؟

و- ساڵی ١٩٨٤ کۆمه‌له‌که‌مان دامه‌زراوه.

پ- هه‌تا ئیستا چه‌ند کۆنگره‌تان پیکه‌ینه‌وه‌؟

و- ١٨ کۆنگره‌ی ئاسایی و کۆنگره‌یه‌کی

نایاسایی له‌سه‌ر داوا‌ی ئه‌ندامانی له رۆژی

١٩٩٩/٥/٢٢ پیکه‌ینه‌وه‌، واته ژماره‌ی

کۆنگره‌کانی گه‌یشتوونه‌ته ١٩ کۆنگره.

پ- ئویریرۆ له چ سالیکه‌وه کوردی ئی نیشه‌جئ

بووه‌؟

و- له سه‌ره‌تای هه‌شتاکاندا کورد له‌م شاره

نیشه‌جئ بوون.

پ- کۆمه‌له‌که‌تان پتر به چ ئه‌رکیکه‌وه خه‌ریکه و چی ده‌کات؟

و- له یه‌که‌م ساڵی دامه‌زرانی کۆمه‌له‌که‌مانه‌وه هه‌موو

سالیک ئاگرێ نه‌ورۆزمان له کاتی خۆیدا هه‌لکړدووه و

یادی کاره‌ساتی کیمیا بارانی هه‌له‌بجی شه‌هیدمان له

ناوه‌ندی شاردا کړدووه‌ته‌وه، جه‌ژنی دووی رېبه‌ندان و

زۆر کۆرسی جوراوجۆرمان بۆ کورده‌کانی ئه‌م شاره

کړدووه‌ته‌وه. هه‌شتا له هه‌ندیکیاندا به‌رده‌وامین. گه‌لێک

کۆبوونه‌وه و سیمینارمان بۆ پیکه‌ینه‌وان. به گۆیره‌ی توانا

هه‌موو ساڵی جه‌ژن و شه‌وی کورده‌یمان بۆ گه‌یوان.

پ- تا چ راده‌یه‌ک توانیوتانه لاوان له ده‌وری کۆمه‌له‌که‌تان

کۆ بکه‌نه‌وه‌؟

و- له راستییدا گرنگی تایبه‌تییمان به لاوان داوه و

ئه‌وانیش له کۆمه‌له‌دا کۆمیته‌ی تایبه‌تی خۆیان هه‌یه و

چالاکن.

پ- ده‌کری شه‌هلا خان که ئه‌رکی کاروباری ژنان و منالانی له

ئه‌ستۆبه‌ی باسی کۆمیته‌که‌تان بکه‌یت و چی بۆ ژنان و منالان

کړدووه‌؟

و- ئیمه گه‌لێک کۆرس و چالاکیمان بۆ ژنان و منالان

هه‌یه. بۆ نمونه:

١- کۆرسی فێرکردنی مه‌له به ژنان.

٢- کۆرسی فێرکردنی دروستکردنی خۆراک.

٣- کۆرسی فێرکردنی جل و به‌رگ دروین به ژنان.

٤- کۆرسی فێرکردنی کۆمپیوتەر به ژنان.

بۆ منالان و لاوانیش له شه‌وانی کورده‌واری و

ئاهه‌نگه‌کاندا گرنگی تایبه‌تییان ده‌دریتتی. ئه‌و منالانه‌ی رۆژی له دایکبوونیان ده‌که‌وێته ئه‌و شه‌وه‌وه دیارییان ده‌دریتتی. هه‌ندیک پرسیار ئاراسته‌ی منالان ده‌کری و ئه‌وانه‌ی وه‌لامی راستی ده‌ده‌نه‌وه، خه‌لات ده‌کری.

پ- ده‌کری به گۆیره‌ی ئه‌زمه‌وونی ١٥ ساڵه‌ی کۆمه‌له‌که‌تان کار و چالاکیه‌کانی فیدراسیۆن هه‌له‌سه‌نگیین؟

و- بوونی فیدراسیۆن زۆر پێویسته. فیدراسیۆن له‌ناو

فیدراسیۆنه‌کانی تری بیاندا، به فیدراسیۆنیکی زۆر

چالاک ده‌ژمیرری له سوید. توانیویه‌تی ده‌ستکه‌وتی باش

به‌ده‌ست بینتی، به‌لام له کۆبوونه‌وه‌کانی هه‌ریمی سینه‌مدا

کۆمه‌له‌کان به‌گشتیی رهنه‌یان هه‌یه. چونکه به‌رپرسیانی

فیدراسیۆن گرنگی ته‌واو به په‌یوه‌ندی نیوان خۆیان و

کۆمه‌له‌کان ناده‌ن.

پ- داواکارتان له فیدراسیۆن چیه‌؟

و- هیوادارین که فیدراسیۆن بتوانی زۆرتین کوردی

دانیشه‌تووی سوید له ده‌وری خۆی کۆ بکه‌ته‌وه.

پ- ئیوه ده‌زانن، که فیدراسیۆن به هۆی کۆمه‌له‌که‌مانه‌وه ده‌توانی

کورده‌کانی دانیشه‌تووی سوید له ده‌وری خۆی کۆ بکه‌ته‌وه و

به‌جیه‌گه‌یانندی ئه‌و ئه‌رکه به شیوه‌ی راسته‌وخۆ ده‌که‌وێته

سه‌رشانی کۆمه‌له‌کانی، ئیوه راتان له‌مباره‌یه‌وه چیه‌؟

و- ئه‌مه راسته و به‌شینی گرنگ له‌و ئه‌رکه ده‌که‌وێته

سه‌رشانی ئیمه، به‌لام چالاکیی و په‌یوه‌ندی ئۆرگانه‌کانی

سه‌رووی فیدراسیۆن ئه‌و رینگه‌یه پتر بۆ کۆمه‌له‌کانی خۆش

ده‌کات.

پاراستنی کولتور

عادل دهۆکی

قورسما نەبوو و تەنیا دەسلەت و چەکمان کولتورەکەمان بوو، کە خۆمان بێ پاراستوو.

گەر سەیری میژوو بکەین، بۆمان دەردەکەوێ، کە زۆر جار بە کۆمەڵ لێیان کوشتووین، بە کۆمەڵ لە کوردستان راگۆزراوین یان خۆمان بۆ پاراستنی گیانمان لە ولاتی خۆمان کۆچمان کردوو، بەلام لە هەموو ئەوانەدا، وازمان لە زمان و کولتوری خۆمان نەهیناوە. بە زمانی شیرینی خۆمان قسە دەکەین و جل و بەرگی خۆمان لەبەر دەکەین و پیناسەیی کورد بوونی خۆمان رادەگەیهین.

شانازیی کردن بە زمان و جل و بەرگی کوردییەو بۆ ئێمەیی کورد لە جیهاندا، خەباتیکی گەورەییە. ئێمە با سەیری ئەو کولتورە گەورەییە بکەین، کە پارێزگاریی لێ کردووین و لە مردن پزگاری کردووین. هەرچەندە چەکیکی پارێزەر بوو بۆ نەتەوێکەمان، ئەمڕۆ ئەبێ چاک بزاین کە بە کولتورەکەمانەو زیندووین و ئەگەر نەتەوێکە کولتوری بمانی، هەرگیز لەناو ناچێ و ئەگەر نەتەوێکە زمان و کولتور و جل و بەرگ و هەلسوکەوتی تایبەت بەخۆی نەما بۆخۆشی نەماوە.

هەموو نەتەوێکە بە زیندوویی راگرتنی کولتورەکەییەو زیندوو. ئەمڕۆ بەشێک لە نەتەوێکەمان بە هۆی جۆراوجۆر لە جیهاندا پەرت و بلاو بووئەو و ژمارەییکی زۆری لە ئەوروپا خۆی گرتووئەو. ئەمەش ئەرکی خستووئە سەر شانمان کە بە هەموو شیوەییەک زمان و کولتوری خۆمان بپارێزین. راستە ئەمڕۆ ئێمە لە ناو کولتوری جۆراوجۆردا دەژین و پنیوستە ناگاداریی کولتوری نەتەوێکەکانی تریش بێن، بەلام نابێ واز لە کولتور و زمانی خۆمان بێنین. دەبێ هەول بدەین بۆ دەولەمەند کردنی کولتوری خۆمان و نەلێین کولتوری ئێمە بۆ کوردستانه. ئەگەر ئێمە کولتوری کورد بۆ کوردستان دا بنێین، ئەوکاتە ئیتر ئێمە دەمرین و بەبێ ناسنامە دەبین. لەبەر ئەوە دەبێ بە باشیی کولتوری خۆمان بپارێزین و منالەکانمان فیتری زمانی کوردیی بکەین و ریز لە پۆژە میژووییەکانی کوردستان بگیرین و چالاکانە بەشداریی یاده شیرین و تالەکانی گەلمەمان بکەین و بەوجۆرە بەشداریی بکەین لە پاراستنی کولتوری نەتەوێکەمان لە دەرەوێ کوردستاندا.

بەرلەوێ بچمە سەر گرنگی پاراستنی کولتور، ئەمەوێ بە کورتیی رونی بکەمەو کە کولتور چییە و چۆن دروست بوو و لە کۆنەو هاتوو.

کولتور شیوەی هەلسوکەوتی هەر نەتەوێکە و گەشەسەندنی بە پیشکەوتنی نەتەوێکە بەستراوئەو. واتە شیوەی تایبەتی ژیا نەتەوێکە پەسەنەکانی جیهانە و پیشاندەری یاسای ژیا ن و هەلسوکەوت و رەفتاری نەتەوێکە. بە تێپەربوونی هەزاران سال بەسەر تەمەنی نەتەوێکە و بە هاوکاریی و هەول و کۆششی میثکی زانایانی ئەو نەتەوانە، کولتور بێناکانی داریژراو، دروست بوو و گەشەیی ستەندوو.

کولتوری نەتەوێکە پەسەنەکان بە گۆزەیی بارودۆخی کۆمەلایەتی، ئابوری، سیاسی و جوگرافیای ئەو نەتەوانە پیکهاتوو و رەگی داگوتاو و نەتەوێکەکان لە وچوارچێوەییەدا، گیروگرتەکانیان چارەسەر دەکەن و ژیا ن دەبەنە سەر لە خۆشیی و ناخۆشییەکاندا. کولتوری پیشکەوتوو، بە گشتیی نەتەوێکە ساپەتییەکان لە یەکتەر نزیک دەکاتوو و ریزی ئەوان لە کۆمەلدا پتەو و بە هیز دەکات.

ئێمەیی کورد نەتەوێکەیی زۆر کۆنێن لە میژوودا و هەزاران سال بەسەر ژیا ن و تەمەنی ئێمەدا لە پۆژەلاتی ناوهراست تێدەپەری. وەک نەتەوێکە کۆنەکانی جیهان توانیومانە بە هۆی کولتوری تایبەت بە خۆمان لە دەوری یەکتەر کۆ بێنوو و زمانیکی تایبەت لەسەر پیزمانی تایبەت بۆ خۆمان داریژین. هەرەها بە چەشنی نەتەوێکە تری جیهان توانیومانە هەرمیکی جوگرافیایی کە تێیدا هاتووینەتە دنیاو، بکەینە شوینی ژیا نمان، کە کوردستانی پێدەلێین.

بە درێژایی میژوو دوژمانی کورد دەیانەوێ، ئێمە لەناو بەرن و دەست بەسەر خاکە ئازیزەکەمان کوردستان دا بگرن و بە ناوی خویانەو تاپۆی بکەن. بە راستی ئێمەیی کورد نەتەوێکەیی هەژار و ئاشتیخواز و بیزار لە شەر و شوپین و پۆژیک لە پۆژان نەمانویستوو، خاکی نەتەوێکەیی تر بە ناوی خۆمان بکەین، ئامادەش نەبووین لە مافی رەوای خۆمان چاوپۆشیی بکەین. هەرچەندە رۆنە کە ئێمە بەرامبەر بە دوژمانان و داگیرکەرانی کوردستان هیچ چەکیکی

خەباتى كۆمەلى كراوه بۇ زىادکردنى كۆمەلەي كراوه

جەمە دۆستان

كەنالى كوردسات داپنشاندران، بكوژانى ئەمانە، ھەمان بكوژانى خەلكى ئەمريكا بوون، كەچى ئەو رووداوهي كوردستان لە رۆژئاوا ھېچ گرنكىي پېنەدرا! من كە كوردم و لە سويد دەژيم، ئەمە وا ليكەدەدەمەوه كە قەسابى كردنى بيگوناھانى كورد نرخی لە بيگوناھانى ئەمريكى كەمتر بېت!

ئىسلام ئايىنىكى ئاشتيخواز و بىدەنگ بوو، بەلام ئەو رۆژئاوا بوو كە ويستی بيكات بە ھىزىكى توندېرەوى دژ بە كۆمۆنيزم. دەستبەردار بوونى رۆژئاوا بۇ شاي ئيزان و دامەزراندنى كۆمارى ئىسلامىي، لىرەوه سەرچاوه دەگرئى. ئەمە بوو بە ھۆى دامەزراندنى ريكخراوى ئىسلامىي توندېرەوى، كاتىكىش كۆمۆنيزم ھەرەسى ھىنا، ئىدى ئەمانىش توندېرەويەكەي خۆيان ئاراستەي رۆژئاوا كرد، رۆژئاوايەك كە

خۆي يارمەتى ئەم گروپانەي دابوو و دروستى كردبوون! خۆرئاوا لە يارمەتيدان و سەرخستنى موحاھيدانى ئەفگان دژ بە روسيا بە «ئوسامەبىنلادن» يەشەوه، دەورئىكى گەرەي ھەبوو. خۆرئاوا تالپيانى گەيانە سەر سەكۆي دەسەلات، ھەتا دەسەلاتىكى ئايىنى سوننى دژ بە ئيرانى شيعە دامەزرىنى. چارەسەرە كاتىي و نيوەچلەكانى ئەمريكا لە ژماردن ناين، لىستەكان دريژن! لە قىتنام و شىلى و ئەرزەنتىن بېروانە!

خۆرئاوا رۆلى گرنكى ھەيە لە بيناكردن و پاراستنى ئاسايىش لە جېھاندا. سالى ۱۹۹۱ رۆژئاوا ئەركى خۆي لە ئاست كوردستاندا بەجىھىنا و كوردستانى لە چنگى سەدام پزگار كرد. پاراستنى ئەو ناوچەيە لە لاين UN ھوہ بوو ھۆى دامەزراندنى دوو حكومەتى ناوچەيى و گەشەكردنىكى بىويىنەي ديموكرات. لە ھەردوو حكومەتە ناوچەيەكەدا ھەلبىژاردنى شارەوانى كرا، سەدان شارۆچكە و لادى، قوتابخانە و نەخۆشخانە، جادە و رېگاويان دروستكرانەوه، نىتى مۇبايل تەلەفۇن و ئىنتەرنىت لە قوتابخانە و كىتبخانەكاندا ھەيە. خەلك لە كوردستان مافى دەربرپىنى بىروپراي ھەيە، بە بەراورد لەگەل ولاتانى دراوسىدا، جياوازي لە نيوان مافەكانى مرۆفدا كەمترە. ھەلومەرجى ژيان و گوزەران و مافى ئافرەتان باشترە و ھەولتى دابىنكردى يەكسانىيەكان دەدرىت. بۇ دامەزراندن لەسەر ھەمان كار و بە ھەمان توانا و پسپۆرىيەوه، ئافرەت شانسى وەرگرتنى ئەو كارەي لە پياو زياترە.

ديارە كەموكوپرىش زۆرە. دوكتور بەرھەم سالىح كە سەرۆك وەزىرانى حكومەتى ھەرىمى سلىمانى يە، كاتىك لە ئەمريكا بىنىم، گوتى: «داوام لە سىياسەتمەدارانى خۆرئاوا ئەويە كە خۆيان بىن و بە چاوى خۆيان گۆرانكارىي و بيناكردن و پرۆسەي ديموكراتىي لە ولاتەكەماندا بىين.»

ئەندىرش ئۆلبىرى بەرپرسيارى سەرەكى رۆژنامەي قىستمانلاند و بەرپرسي بەشى بەرھەم لە رۆژنامەكەدا، رۆژى شەممە رىكەوتى ۲۰۰۱/۱۰/۱۹، وتارىكى لە وەلامى وتارىكى مندا، كە لە ۲۷ى ھەمان مانگدا بلاو بووبوو ھە بلاوكردەوه.

من كە سىكم كە لە ژىر كارتىكەرىي پرۆسەي ديموكراتىدام و چەندان سالە كە لەم ولاتەدا دەژيم و فىرى ديموكراسى و ژيان و بىركردنەوهي ديموكراتىيانە بووم. ھەموو ئەو پەرەگرافانەم سەرۆژىر كردوون، كە پەيوەنديان بە ديموكراتىيەتەوه ھەيە و تەنيا يەك پەرەگرافم نەبىيوە كە باس لە جياوازي دانان لە نيوان خەلك و پەگەز و ولاتە جياوازهكاندا بكات.

ئەو وىنەيەي كە ئەندىرش ئۆلبىرى دەربارەي گەلى سويد دەيخاتەروو، لەگەل ئەو وىنەيەي كە لە بىرى مندايە ناگونجى و جياوازه. گەلى سويد بەو ناسراوه كە رىز لە مافە مرفۇايەتتەيەكانى مرۆف دەگرئى لە ھەر كوئىەك بىت. رەنگە ھەستى ئەمان دەربارەي مرۆف و مافەكانى لە دنيادا كەموئىنە بىت. تەماشاي ئەو ھەموو يارمەتتەيە رۆحى و ئىنسانىيە بكە، كە سويدىيەكان بۇ پىشنگىرىكردن لە ولاتە ھەزارەكان پىشكەشى دەكەن. دەشى ئۆلۆف پالمە وەك ھىمايەكى تەواوى گەلانى ژىردەستە دابىنئى، من لەسەر نوسىن و تىروانىنەكانم، سەدان نامەم لە سەرۆك حىزب و سىياسىيەكان و خەلكانى ئاسايىيەوه پىنگەيشتووو و دلخوشيان كردووم. من لەو بېروايەدا نىم كە ھەموو سويدىيەك خۆي وەك ئەمريكايى حساب بكات يان خۆي بە ئەمريكى بزانىت، رەنگە كەس و گروپى وھا ھەبن. بەلام ئەوانە نوئىنەرايەتى گەلى سويد ناكەن.

ئەگەرچى لە كۆمەلى داخراودا پەيداكردى ھەوال ئەستەمە، بەلام ئەگەر رۆژئاوا مەبەستى بىت، دەتوانى بە ئاسانى پەيداي بكات، بىرتانە كە رۆژئاوا چۆن شارىكى گەرەي وەك ھەلەبجەي بچوك كردەوه، شارئى كە ھىندەي شارى قىستەرۆس گەرەيە و ئەوان كردىانە گوندىكى بچكۆلە. ئەوسا كە سەدام ھەلەبجەي گازباران كرد، ئەو لە چەنگى دژ بە ئىراندا چاوى چاوانى خۆرئاوا بوو. مىلۆسەفچ دەگىرى و دەدرىتە دادگا، بەلام سەدام ئازادە... بۆچى؟

ناوى تەواوى ئەو كۆمپانىيەنى كە گازى كىمىوايان بە عىراق فرۆشتووو لاي چەكىشكەرەكانى UN ھەيە، بۆچى ئەو ناوانە ئاشكرا ناكەن. ھەفتەي پىشوو، كۆمەلەي ئوسامە بىنلادن لە كوردستان ۷۲ كوردى بىتاوانيان سەربىرى و تەرمەكانيان بە ناشىرىنترىن شىوہ شىواند، ئەو وىنانە لە

فسه‌ی نه‌سته‌ق

حەمەسەعید حەسەن

- * ئەسپیان نال دەکرد، بۆقیش لاقی بەرز دەکردهوه.
- * مانگای تینوو ئاوی خۆی دەخواته‌وه و گوێ ناداته قیرە‌ی بۆق.
- * له دەست دووشک هەلدی، مار چاوه‌رینه.
- * چنگی بەردی تی بگره، یه‌کێکیان هەر ده‌بێتکێ.
- * له دەرگاوه سەرقالی دوورخستنه‌وه‌ی پلنگ بووین، له په‌نجه‌روه گورگ خۆی به مالدا کرد.
- * له‌بەر ئەوانه‌ی خیرا ری ده‌کەن، نان به‌ر کێسه‌ل ناکه‌وی.
- * بارانی به‌هیز به‌سه‌ر سه‌ربانی لاوازا ده‌باری.
- * خوی بفرۆشم باران ده‌باری، ئارد بفرۆشم ره‌شه‌با هه‌لده‌کا.
- * نه‌ به‌ رۆژی رۆشن، مۆم دابگیرسینه، نه‌ له‌به‌رده‌م گه‌مه‌دا، هونه‌ر بنوینه.
- * چاکه‌کردن له‌گه‌ل به‌دکاراندا، وه‌ک ئاو به‌ زه‌ریا به‌خشینه.
- * ئەگەر دوو نانت هه‌بوو، یه‌کێکیان بفرۆشه‌ و پاره‌که‌ی بده‌ به‌ گۆل!
- * ئەگەر زیه‌رکه‌ی زاده‌ی ریش بووایه، بز نانا ده‌بوو.
- * زه‌رافه‌ زیه‌رکه‌، هه‌موو شتی ده‌بینی و هه‌یج نالی.
- * ئەگەر مافووره‌که‌ت کونیکێ تیدا بوو، له‌سه‌ر کونه‌که‌ دابنیشه.
- * پشیلە‌ی نووستوو، مشکی پی ناگیرێ.
- * ئەو سه‌گه‌ی زۆر بوه‌پی، ناگه‌زێ.
- * گۆزه‌ درزیردوه‌که‌ی تۆم له‌ ساغه‌که‌ی خۆم پی باشتره.
- * سێوی دراوسی هه‌میشه‌ شیرینتره.
- * ئەوی خواردن به‌ سه‌گی که‌سانی دیکه‌ بدات، سه‌گی خۆی پی ده‌وه‌پی.
- * سه‌گ دزی ده‌کات و بز ن سزا ده‌دری.
- * پشیلە ده‌بێزێ و سه‌گ ده‌یخوا.
- * ئەوی به‌ هیوای شتی زۆر باش بی، ده‌بی زۆر چاوه‌روان بی.
- * ئەوی هاوزه‌مان به‌ ئومیدی گرتنی دوو که‌رویشک بی، هه‌یجانی پی ناگیرێ.
- * به‌ ده‌ستیک دان رۆ ده‌کات و به‌وی دی بۆ هه‌یلکه‌ ده‌گه‌ری.
- * ئەوی حه‌زی له‌ هه‌یلکه‌ بی، نابی گاره‌گاری پی ناخۆش بی.
- * تا هه‌یلکه‌کان نه‌ترووکین، جووجه‌له‌کان مه‌ژمیره‌!
- * له‌ لووتزل وایه، هه‌مووان باسی لوتی ئەو ده‌کەن.
- * ئەگەر هاوڕێیه‌تی که‌ر بکه‌ی، ده‌بی چاوه‌رێی جووته‌ش بی.
- * په‌رژینیک له‌ نیواندابی، هاوڕێیه‌تی به‌ گه‌رمی ده‌مینته‌وه.
- * دوو پیاو بی به‌ شه‌ریان، سه‌گه‌کانیشیان به‌شه‌ر دین.
- * پیاوی وا، هه‌ر سه‌گی وای ده‌بی.
- * ئەوی پی به‌ میرووله‌یه‌کدا بی، شاره‌میرووله‌یه‌ک له‌ خۆی ده‌کا به‌ دوژمن.
- * بۆ ئەوه‌ی شاره‌زای رینگه‌که‌ ببیت، ده‌بی پرسیار له‌و رێبواره‌ بکه‌ی که‌ تووشت دین.
- * له‌ پووباره‌که‌ بپه‌رێوه، ئەوسا گالته‌ به‌ تیمساحه‌که‌ بکه‌!
- * مارانگاز که‌ په‌تیش ببینی، ده‌ترسی.
- * ببه‌ به‌ دۆستی گورگ، به‌لام با هه‌میشه‌ ته‌ورت پی بی!
- * پشت به‌ خۆدا ببه‌سته، وه‌لی حوشره‌که‌ش ببه‌سته‌وه‌!
- * بیر به‌ ده‌رزی لی نادری.
- * به‌ مریشک مه‌لی، برۆ پێویم بۆ بانگ
- بکه‌!
- * که‌س قرژانگی پی فیری راست رۆیشتن ناگری.
- * ئەسپ له‌ کاتی غاردا نال ناگری.
- * هه‌موو جله‌کانت به‌ سنگیکدا هه‌لمه‌واسه‌!
- * دوو پی له‌ تاکه‌که‌وشیتکدا جێیان نابیته‌وه.
- * گله‌ی له‌ خۆدا مه‌که‌ که‌ پلنگی خولقاندوه، سوپاسی بکه‌ که‌ بالیشی پی نه‌به‌خشیوه.
- * پشتم بخورینی، پشتت ده‌خورینم.
- * ئەو دره‌خته‌ مه‌به‌روه‌ که‌ سێبه‌رت بۆ ده‌کا.
- * گردیکی نه‌وی، بۆ پیاویکی پیر، چیايه‌کی بلنده.
- * به‌رانی پیر حه‌زی له‌ گیای ناسکه‌.
- * گورگی شه‌ل که‌رویشکی پیریشی پی راو ناگری.
- * له‌ نیو بیستاندا، قه‌یتانی پێلاو مه‌به‌سته‌وه، با گومان‌ لی نه‌کەن.
- * سمۆره‌ ته‌نیا له‌به‌ر ئەوه‌ی بچووه‌ نابیته‌ کۆله‌ی فیل.
- * لی گه‌ری با مه‌لان به‌سه‌ر سه‌رته‌وه‌ بنیشنه‌وه، په‌لام مه‌هێله‌ هه‌یلانه‌ی تیدا بکه‌ن!
- * ئەوی ته‌لاری نه‌دیبی، ته‌ویله‌شی پی خانوه.
- * ئەگەر پۆشاکت له‌ پووش بوو، ئاگر مه‌کوژینه‌وه‌!
- * شیر به‌ تۆری جالجانۆکه‌ ناگیرێ.

سه‌رچاوه‌:

Ordspråk från när och fjärran,

Lennart Hellsing, Alfabet bokförlag

1998 Stockholm.

يەكپەتە ئوروپا و ھوسەلە

نەزاد وەلى

سالىكىش لە دەرەھەي ئوردوگا، داواي رەگەزنامە بکات، ئەبى وەك ئەمريکا، چەند تاقىکردنە ۋە يەك بکات. لەوانەش زمان و كۆمەلناسىي و شارەزايى لە رووى كۆمەلەيە تىيە ۋە ... ھتد.

بە گوڤرەي راسموسىن و (چەپە رەگەزىرستەكانى يارانى)، پەنابەران لەو ھەوت سالە و لە ئوردوگا بە باشىي فېرى زمان و دابونەرىت و ژيانى كۆمەلەيەتەي ئەو ولاتە ئەبن.

ئەوانەي كە خىزانىان ھەيە، نە ئەتوان لەگەل خىزانەكانىندا بە كۆمەل بەگەنە ئوروپا، چونكە كەم خىزانى رۆژھەلاتىي لە (ھەوت) كەس كەمترە، نە (ھوسەلە) شىيان ھەيە ھەوت سال بەبى خىزانەكانىان ژيان لە پەنابەرىي و ئوردوگا بە تەنيا بەرنەسەر.

كەواتە ئەوانەي كە دىنە ولاتەكانمان، بەگشتىي لاوان و باكيان نىە چەند (ھوسەلە) يان ئەبى. بۇ ئەوان گرنگ ئەويە لاون و زوو فېرى زمان و دابونەرىتەكان ئەبن و تىكەلاوي كۆمەلگاكە ئەبن و ژيانى خىزانىي و داروژيشيان لىرە داين ئەكەن!!

بەلئى ... راسموسىنى چەپ و لىبرال ئەيەوي ناوجەرگەي ئوروپا بکات بە ئوردوگاكانى سىبىرياي سەردەمى سۆقىيەت و دۆزەخى پەنابەران!!!

ئەوي جىي داخە ئەويە كە تىرۇرىستان لەم بوارەشدا ئاويان كرد بە ئاشى رەگەزىرستاندا و ئەمانىش بە بيانوى بەرەنگار بوونەوي تىرۇرىزمە ۋە، ئەسپى

رەگەزىرستانەيان تاوئەدن و بارودۇخى پەنابەران و مافى پەنابەرىي ئەوئەندەي تر ئالۆز ئەكەن.

دروستبوونىە ۋە لە سالى ۱۹۲۰ تا ئەمرو ئەكەم جارە سەرکەوتنىكى وا گەرە بە خۆيە ۋە ببىنىت و سەرۇكايەتى ھكومتەي بکەوتتە دەست، ئەندىرش راسموسىن سەرۇكى ئەم حىزبەيە.

راسموسىن دوابەداوى سەرکەوتنى حىزبەكەي لە ھەلژاردندا، بۇ دەزگاكانى راگەياند كە سالى ئايىندە كە دانمارك سەرکردايەتى يەكپەتەي ئوروپا ئەكات، خۇي و ھكومتەكەي ھەولئەدن كە چەند پىشنىازىك لە يەكپەتەيدا بەرباس و جىگىريان بەكەن و ياسايەكى لىو بەكەوتتە ۋە. يەككە لەر پىشنىازانەي ئەويە كە ئەبى پەنابەر بە يەك ياساي پەنابەرىي لە تەواوي يەكپەتەي ئوروپادا مامەلەي لەگەلدا بکرىت.

ھەندىك لە وردە پىشنىازەكانىش برىتىن لە: پەنابەر ئەبى (ھەوت سال) لە ئوردوگا بەمىنىتە ۋە بۆي نەبىت لە دەرەھەي ئوردوگا بەزى.

داوى سى سال ئىنجا مافى پەنابەرىي بدرىت، بەلام ئەبى تا ھەوت سالەكە ھەر لە ئوردوگا بەمىنىتە ۋە. لەگەل ئەوئەشدا كە مافى پەنابەرىي ۋەرگرتو ۋە، بۆي نەبى ھىچ كارىك بکات، ۋەك وتمان نە پەش و بۆر و نە سپى.

مافى پەنابەرىي ئەبى تاكەكەسىي بىت. ئەمەش ماناي ئەويە كە پەنابەر بۆي ھەيە تەنيا داواي پەنابەرىي خۇي بکات.

خىزانى ھەيە يان نا، ئەويان ئەبى لە داوى ھەوت سالەكە ئىنجا (قسەي) لەسەر بکرىت. نابى بە ئاسانىي رەگەزنامە بدرىت بە پەنابەران. ئەوي پاش ئەو (ھوسەلە) يە و چەند

دوستىكەم وتى ئەرى پىم نالىي ھوسەلە چىيە؟ وتم سەبرى ئەويە ھەرەبىيەكەت بىستو ۋە وتى ئەي چۆن! وتم ئەي (ئەندىرش راسموسىن) ت بىستو ۋە؟ وتى نازانم چى ئەلئىت!

بەلئى... ھوسەلە لە ھەوت سالە ۋە ھاتو ۋە، ئەوي كە (سەبر) و خۇراگىي زۆر بىت، ئەوا كەسىكى بە ھوسەلەيە.

لەوانەي ئەوي كە شەرابخۆر بىت، شەرابى ھەوت سالەي خواردىتتە ۋە، ئەوي كە ئاشناي كلتور و ئاواز و گۇرانىي كوردىي بىت (ساقى بۆم تىكە شەرابى ھەوت سالە) كەي ھەسەن زىرەكى بىستو ۋە. ئەوي لەناو كورددا ژىابىت ئەوا ھەزاران ئافرەتى بىنيو ۋە كە داوى لە دەستدانى نازىزانىان، تا ھەوت سال رەشپوئش ئەبن (جاران)، يان ھەوت سال جلوبەركى ئالووالا ناپوئش، بە راستى ئەو ئافرەتەنە بە (ھوسەلەن).

بۇ ئەوي ھوسەلەمان بىمىنىت، دىمە سەر باسە سەرەكپەكە،

ئەم سال ھەندىك لە دامودەزگاكانى سويد مقومقويان بوو دەربارەي دانانى ياسايەك كە رى لە لىشاوي پەنابەرىي بگرىت. يەككە لە پىشنىازانەش ئەوي بوو كە ئەبى پەنابەر تا چوار (دانە) سال لە ئوردوگاي پەنابەراندا بىمىنىتە ۋە و بۆي نەبىت ھىچ كارىكىش بکات (بىگومان نە پەش و نە سپى) و لە داوى ئەو ماويە ئىنجا مافى پەنابەرىي بدرىت و جىوړىي خۇي داين بکات.

لەم داويەشدا ئە ولاتى دانمارك ھەلژاردن كرا و دوو حىزب سەرکەوتنى گەرەيان بەدەست ھىنا، يەككىيان حىزبى گەل كە رەگەزىرست و توندرو ۋە بەرامبەر بە پەنابەران و ئەوي ترىش حىزبى چەپى لىبرال كە لە

بگريت له پیناوی ئاشتی و دیموکراتی و مافهکانی مرؤفا.
3- کۆنگره سلای گرمی خوی ئاراسته گیاره
سیاسییهکانی کورد له لایه ن دهوله ته فاشیست و
داگیرکهراوهکانی کوردستان دهکات.

4- کۆنگره پشنگیری تهواوی خوی بهرامبه به خهباتی
گهلانی ژیردهسته و چهوساوهی جیهانی سییه له ئاسیا،
ئفریقا و ئامریکا باکور له پیناوی رزگار بوونیان له دهست
ئیمپریالیزم و بهدیتهانی سهربهستی سیاسی و ئابوری
دهردهبرئ.

5- کۆنگره دژی سیاسهتی زۆرداری و چهوساندنهوه و
سروشتی کۆئناڵیستی و کۆنهپهستی پادهوستی و
سیاسهتی رژیمه داگیرکهرهکانی کوردستان بهرامبه گهلی
کورد مهحکوم دهکات.

6- کۆنگره دژی ئه وهیزه سیاسییه کوردییانه و هه موو
ئو هیزانیه که له کۆمه لگای کوردا دهژین و هاوکاری
رژیمه فاشیست و داگیرکه رهکانی دهکهن. ههروه ها نارهبازی
خوی بهرامبه هه موو ئه وهیزه ندهردهبرئ که هاوکاری
له گهل ئه و پهبازه دهکهن، که دژی بهرزه وهندهکان و مافهکانی
گهلی کورده.

7- کۆنگره له نامه یه کدا بۆ ریکخراوی
نه ته وهیبه گگرتوههکان، ریکخراوی بهرگریکردن له مافی بهنده
سیاسییهکان، خاچی سوری نیودهولهتی و هه موو ئه و
ریکخراوانه ی که بهرگری له مافی مرؤف دهکهن، داوا دهکات
نارازی بوونی خویان سهبارته به کرداری نامرؤفانه و
رهفتاری کۆئناڵیستی و دپدانه ی رژیمه داگیرکه رانی
کوردستان، واته تورکیا، عیراق، ئیران و سوریا، بهرامبه به
گهلی کورد، دهبرین. ههروه ها کۆنگره داوا ی پیکهتانی
کۆمیته یهک دهکات بۆ بهرگریکردن له گیاره سیاسییهکانی
کورد له لایه ن رژیمه داگیرکه رهکانی کوردستانه وه.

کۆمیته ی کارگیزی هه لیزیراوی کۆنگره ی چواره م له
یهکهم کۆبوونه وهی خۆیدا، که ههفته یهک دوا ی کۆتایی
کۆنگره پیکه ی هیتا، ئه رکی ئه ندنامه ی کۆمیته ی کارگیزی به م
شویه هه خواره وه دیاری کرد:

1- مهحمود کبیر : سه رۆک

2- شورش عهسکه ریی : سه کرتیر

3- سالح ئینجه : بهرپرسیاری بهربانگ

4- چهودهت ده میر : بهرپرسیاری مالی

5- ساقیب ئوزون : ئه ندام

6- قادر کاکه یی : ئه ندام

7- که یۆ جگه رخوین : ئه ندام

کۆمیته ی کارگیزی له سه رهتای چالاکیه کانی هه ولئ
پیرۆزکردنی جه ژنی نه ورۆز ده دات. نزیکه ی 800 کس
به شداری دهکهن له جه ژنی نه ورۆزدا. دوا ی ئه وه بۆ جیه جی
کردنی بریارهکانی کۆنگره، چه ند کۆر و کۆبوونه وه پیکدین و
خۆپیشاندانیکی مه زن دژی هیرشی سوپای تورکیا بۆ سه ر
کوردستان و بۆ ئازادکردنی بهنده سیاسییهکانی تورکیا
ریکدهخن. هه ر له وه په یوه ندییه دا جاریکی تر له
1984/9/12 دا خۆپیشاندانیکی تر ریکده خات، که نزیکه ی
700 کس به شدارییان تیدا کردوه.

به بۆنه ی کۆچی دوا یی مامۆستا جگه رخوینه وه کۆریکی

ماته مینی پیکهتیاوه. دووهه زار و پینجسه د پۆستی ریی له
وینه ی جگه رخوین بلاو کردوه ته وه و به شداری دهکات له
ناردنه وه ی تهرمی خوالیخوشبوو بۆ سوریا و له چه مین
رۆژی کۆچی دوا ییدا، کۆریکی مه زن له هۆلی قۆری گۆرد
Vårbygård پیکدین.

رۆژی 1984/12/7، سیمیناریکی له سه ر ناسنامه ی گه لی
کورد و دوا ی ئه ویش له گهل بهرپه و به رایه تی ئیداره ی
په نابه رانی سوید SIV سیمیناریکی له سه ر کوردهکانی
دانیشتووی سوید پیکهتیاوه. چونکه لۆکالی فیدراسیۆن
پنویستی به نوپکردنه وه هه بووه، لۆکالیکی کاتی له
هالونبریۆن Hallonbryen گرتوه و گواستویه ته وه بۆ
ئه وئ. له نیوان کۆنگره ی چواره م و پینجه مدا، کۆمه لیک
گیرگرفت له فیدراسیۆندا سه ری هه لداوه، به و حاله ش
کۆمیته ی کارگیزی حه وت ژماره به ربانگی به چاپ گه یاندوه،
که هه موویان به زاراوه ی کرمانجیی بوون. ههروه ها له نیوان
کۆنگره ی چواره م و پینجه مدا، چهودهت ده میر ئه ندامی
کۆمیته ی کارگیزی به هۆی نه خۆشیی دل کۆچی دوا یی کردوه.
قادر کاکه یی وازی له کارکردن له کۆمیته ی کارگیزی هیتاوه.
ساقیب ئوزون مالی له سوید گواستویه ته وه و شورش
عهسکه ریی مالی له ستۆکه ولمه وه چهوته کارلستاد. ئه و
چار ئه ندامه له کۆمیته ی کارگیزی ده رچوون و دوو ئه ندامی
جیگر: مسته فا جه زیری و مهحمود پاک ده میر (له وه ندی)
جیگه ی دوو کهس له و چار که سه یان پ کردوه ته وه.

به گۆزیه ی ریکه وتنی ریکخراوه سیاسییهکانی
دامه زرینه ی فیدراسیۆن، له یهکهم کۆنگره ی فیدراسیۆنه وه،
ئه ندامانی کۆمیته ی کارگیزی و سه رۆکی فیدراسیۆن به
به رده وامیی به رای بهرپرسیانی ئه و ریکخراوانه دیاری کران.
ئه و په وته به کۆبوونه وه ی پتری په نابه رانی کورد له سوید و
بلاو بوونه وه یان به سه ر شارهکاندا و پهبه ش بوونیان له
وه رگرتنی بهرپرسیایه تی له ئۆرگانهکانی فیدراسیۆندا،
دژاریی له کار و بهرپه و به ردی فیدراسیۆندا دروست ده کرد.

فیدراسیۆن ته نیا له ستۆکه ولم، ئوسالا و یۆتییۆری
کۆمه له ی هه بوو، که چی کورد له زۆریه ی شاره گه و رهکانی
سوید ده ژیان. له بهر ئه وه، فیدراسیۆن ناچار بوو هه ولئ
به رفراوان کردنی خوی و ئۆرگانیزه کردنی کوردهکانی
دانیشتووی سوید بدات. ئه مه ش فیدراسیۆنی به ره و
سیسته می دامه زراندنی کۆمه له له شاره وانیهکاندا پال
په وده نا و فیدراسیۆن ده بوو به ره و دامه زراندنی کۆمه له له
شاره وانیهکاندا هه نگاو بئی. واته له هه ر شاره وانیه کدا
کۆمه له یهک دامه زرینی.

ئه و دیارده یه گرفتی زۆری بۆ ریکخراوه سیاسییهکان
دروست ده کرد. چونکه ئه وان له هه موو شارهکاندا به راده ی
پنویست ئه ندامیان نه بووو، ده بوایه کۆمه له ی تیکه لاو له
خویان و کوردهکانی دانیشتووی شارهکان دامه زرینی. یان
ئه ندامانیان له کۆمه له یه کدا بکه ن به ئه ندام، که به دهست
کهسانی تره وه هه لده سوران. ئه مه ش ریکگی به رفراوان
بوونه وه ی فیدراسیۆنی ده گرت، له بهر ئه وه فیدراسیۆن له
نیوان کۆنگرهکانی چواره م و پینجه مدا سه رکه وتنی به دهست
نه هیتا و نه یوانی به گۆزیه ی شاره وانیهکانی سوید کۆمه له
دامه زرینی.

کۆنگره به رپرس بووه له پێکهێنانه وهیدا. له بهر ئهوه جارێکی تریش رۆژی 1984/1/26 له گهڵ کۆمیتتهی چاودێر کۆبوونهتوه و ئهمهش پرۆتۆکۆلی کۆبوونهوهکه یان.

پرۆتۆکۆلی کۆبوونهوهی دیوان و کۆمیتتهی چاودێر

رۆژی 1984/1/26، فهرزنده باران (محهمهد ئوزون)، حهمه محهمهد و شۆرش زیرهک ئهنادامانی دهستهی بهرپهوهری کۆنگره و زناڕ خامۆ، حهنهفی جلهبلی و شوکری خوجه ئهنادامانی کۆمیتتهی چاودێر کۆبوونهوه و لهسهه بارودۆخی کۆمهلهکان گفتوگۆیان کرد. دوو ئهنادامی تری کۆمیتتهی چاودێر واته ههفال بشار توپسز و شۆرش عهسکهری بهشداریی کۆبوونهوهکه نهبوون. له کۆبوونهوهکهدا به وردیی ههلو مهرجی کۆمهلهکان کهوته بهرباس. ئهوه کۆمهلهکانی بهپیتی پرۆگرامی فیدراسیۆن مافی ئهنادامتهی خویان نهدابن و کۆنگرهی خویان بهپیتی پرۆگرامی فیدراسیۆن پیک نههینابن، مافی بهشدارییکردنیان له کۆنگرهی فیدراسیۆندا پئی نادری.

ئهو کۆمهلهکانی ئهرکی خویان بهجئ هیناوه بریتین له:

- 1- کۆمهلهی کولتوریی کوردی ئێران.
- 2- کۆمهلهی یهکیهتی کارگهریی کوردستان.
- 3- کۆمهلهی دیموکراتیی و کولتوریی له ستۆکهۆلم.
- 4- کۆمهلهی دیموکراتیی و کولتوریی له بۆتسوییکا.
- 5- کۆمهلهی لاوانی کورد.
- 6- کۆمهلهی کولتوریی کورد له یۆتیبۆری.
- 7- کۆمهلهی کارگهریی کوردستان.
- 8- کۆمهلهی پێشپهوهی کورد له سوید.

ئهم دوو کۆمهلهیهی خوارهوهش کۆنگرهی خویان پیک نههیناوه و ئهرکی خویان بهجئ نهگهیاوندوه:

- 1- لقی کۆمهلهی خۆپێندکارانی کورد KSSE.
- 2- کۆمهلهی فۆلکلۆری کوردستان.

ئهو کۆمهلهکانی ئهرکی خویان بهجئ نهگهیاوندوه، گفتوگۆیان لهسهه کرا و مافی بهشدارییکردنیان له کۆنگرهی فیدراسیۆندا پینادری و پینویسته بۆ ئهوهی مافی ئهنادامتیان له فیدراسیۆندا پئی بدری، پینشیاوی وهرگرتنیان به کۆنگره بدری. ناوی ئهو کۆمهلهکانه بریتین له:

- 1- کۆمهلهی پێشپهوهی کورد له ئوئیسالا.
- 2- لقی کۆمهلهی خۆپێندکارانی کوردستان AKSA.
- 3- کۆمهلهی ژنانی کوردستان.
- 4- کۆمهلهی یهکیهتی گهلی کوردستان.

له کۆنگرهی پینشووی فیدراسیۆنیشدا ئهم سنی کۆمهلهیهی خوارهوه مافی ئهنادامتهی خویان نهداوه:

- 1- کۆمهلهی کولتوریی کارگهریی کوردستان.
- 2- کۆمهلهی کارگهریی دیموکراتیی کوردستان.
- 3- کۆمهلهی کورد له ناکا.

رۆژی 1984/2/4، فیدراسیۆن سههلهنوی کۆنگرهی پیکهینا و بۆ بهرپهوهبردنی کارهکانی، دهستهیهکی بهرپهوهریی له بهرپازان: عهلی کهمال (سهروک)، محهمهد (سکرتێر)، ئهمهد قهرهموس و ماموستا نوژهن (یاریدهدهر)، که پینشتر له لایهن کۆمیتتهی چاودێرهوه بۆ بهرپهوهبردنی کۆنگره دهستنیشان کرابوون، ههلهدهبژێرن و بهرپرسیایتهی بهرپهوهبردنی کۆنگرهیان پئی دهسپێرن. کۆنگره

سهههتا بهپیتی مادهی پینجی پرۆگرامی فیدراسیۆن مافی ئهنادامتهی کۆمهلهکان دهخاته بهرباس و لهسهه وهرگرتنی چوار کۆمهلهی نوی به ئهنادام رادهوهستنی و له ئاکامدا:

- 1- کۆمهلهی گهلی کوردستان به 18 دهنگ لهگهڵ بهرامبهر 15 دهنگ دژ، مافی ئهنادامتهی دهدریتتی.
- 2- کۆمهلهی ژنانی کوردستان به 19 دهنگ لهگهڵ بهرامبهر 9 دهنگ دژ، مافی ئهنادامتهی دهدریتتی.
- 3- لقی کۆمهلهی خۆپێندکارانی کوردستان AKSA له سوید به 19 دهنگ لهگهڵ بهرامبهر 18 دهنگ دژ، مافی ئهنادامتهی دهدریتتی.

- 4- کۆمهلهی پینشپهوهی کورد له ئوئیسالا به 24 دهنگ دژ له بهرامبهر 16 دهنگ لهگهڵ، مافی ئهنادامتهی پئی نادری.

سهروکی فیدراسیۆن به گوێرهی مادهی ههوتی پرۆگرامی فیدراسیۆن، راپۆرتی خهبات و سکرتێری مالیی راپۆرتی ئابوری دهخویننهوه. ههردوو راپۆرت به 30 دهنگ لهگهڵ و 8 دهنگ دژ و 4 دهنگی سپی (بینهنگ) پهسهند دهکرین. به گوێرهی مادهی پانزده، ههلبژاردنی ئۆرگانهکانی فیدراسیۆن دهست پیندهکات و ئهمانهی خوارهوه بۆ کۆمیتتهکانی کارگێر و ریفیسۆر ههلهدهبژێرن.

کۆمیتتهی کارگێر:

- 1- محهمود کپهه له کۆمهلهی کارگهریی دیموکراتیی کوردستان، سهه به DDKD.

- 2- سالح ئینجه له کۆمهلهی کارگهریی کوردستان، سهه به پینگی ئازادیی.

- 3- شۆرش عهسکهریی له کۆمهلهی گهلی کوردستان، سهه به یهکیتی نیشتمانیی کوردستان.

- 4- کهیۆ جگهرخوین له کۆمهلهی کوردی سوویا، سهه به پارتی پینشپهوهی دیموکراتیی کوردی سوویا.

- 5- ساقیب ئوزون له سهه به ئالای رزگاری.
- 6- قادر کاکهلی کۆمهلهی کولتوریی کوردستانی ئێران.

- 7- جهودهت دهمیر له کۆمهلهی کولتوریی و دیموکراتیی ستۆکهۆلم، سهه به ئالای رزگاریی.

- 8- محهمود پاک دهمیر (لهوهندی) (جیگر)
- 9- مستهفا جهزیری (جیگر)

کۆمیتتهی ریفیسۆر:

- 1- زناڕ خامۆ. 2- سیدار بوداک. 3- م. سدیق. 4- رهسول (جیگر). 5- بهکر (جیگر).

جینگه سهرنجه که کۆنگره تهنیا شهش ئهنادامی بۆ کۆمیتتهی کارگێر ههلبژاردوه و ئهنادامی ههوتهم واته جهودهت دهمیر رۆژی 1984/2/11، شهش رۆژ دواي تهواو بوونی کۆنگره له لایهن عهلی کهمال سهروکی دهستهی بهرپهوهریی کۆنگرهوه به کۆمیتتهی کارگێری ناسینراوه.

بهرپهوهبردنی کارهکانی کۆنگره

- 1- کۆنگره لهگهڵ ریز و سلاویدا پینشپهوهی خهباتی رزگاربخوازانهی گهلی کورد و پینشمههگه قارهمانهکانی کوردستان له پیناوی به دهست هینانی مافه مرؤفایهتی و دیموکراتی و نهتهواپهتییهکانی دهکات. ههروهها نارازیی خوی بهرامبهه به رژیمة داگیرکهههکانی کوردستان دهردهبرئی.
- 2- کۆنگره داوا له رای گشتی سوید و پینکخراوهکان دهکات، که پتر پشتی خهبات و مافهپهواکانی گهلی کورد

ج- هەلەدان بۆ دەركردنی بەربانگ ھەر پانزدە رۆژ جارێك.
 چ- خەبات بۆ كردنەوێ بەشی پەرورەدەكردنی مامۆستای زمانی كوردیی لە زانكۆكانی سویددا.
 خ- خەبات بۆ وەرگرتنی مافی دانانی رادیو و تەلەفیزیۆن بە زمانی كوردیی.
 د- وەرگێرانی راگەیانراوەكانی حكومەتی سوید بۆ سەر زمانی كوردیی.

ر- درێژەدان بە پرۆژەیی زمانی زگماك.
 پ- دانانی گروپی فۆلكلۆری كوردیی.
 ز- دانانی گروپی شانۆیی بە زمانی كوردیی.
 ژ- دانانی گروپی مۆسیقا.

كۆنگرەیی سنیەم، دوو گرتی سەرەکی فیدراسیۆنی چارەسەر كرد كە بریتی بوون لە ناوی فیدراسیۆن و سەرۆکی فیدراسیۆن. بۆ چارەسەر كردنی گرتی یەكەم پرۆگرامی گۆرێ و ناوی فیدراسیۆنی لە (فیدراسیۆنی كۆمەڵە كوردییەكان) ھە كرده (فیدراسیۆنی كۆمەڵە كوردستانیەكان) و بۆ دووھمیشیان رایگەیاندا: فیدراسیۆن ناوی ھەك پێشوو دوو كەس لەسەر ناوی بەرپرسی پەيوەندیگەر ئەركی سەرۆکی فیدراسیۆن لە ئەستۆ بگرن. كۆمیتەیی كارگێر دەبی لە لایەن خۆیەو یەكێك لە ئەندامانی بە سەرۆك ھەلبژیرێ و ئەركی سەرۆکی بەرپۆھ بەرێ. ھەرۆھا كۆنگرە ئەو كەسانەیی خوارەوێ بە ئەندامی كۆمیتەیی كارگێر ھەلبژارد:

1- سالیح ئینجە، 2- مەحمود كیپەر، 3- جەودەت دەمیر
 4- ئەشرف ئۆكۆموش، 5- ھارون ئەلی ئاچك (شیار)،
 6- شۆرش عەسكەری، 7- كەییۆ حەسەن.
 كۆمیتەیی كارگێر لە یەكەم كۆبوونەوێ خۆیدا لە رۆژی 1982/12/11 بەرپرسیاریەتیەكانی بەم شیۆھییەیی خوارەو ھەدا بەشكرد:

1- سالیح ئینجە سەرۆکی فیدراسیۆن
 2- مەحمود كیپەر سكرتێر
 3- جەودەت دەمیر سكرتێری مالیی
 4- ئەشرف ئۆكۆموش بەرپرسی بەربانگ
 5- ھارون ئەلی ئاچك (شیار) بەرپرسیاری رێكخست
 6- شۆرش عەسكەری بەرپرسی پەيوەندیی ناوڤ
 7- كەییۆ حەسەن بەرپرسی كۆلتوری

كۆمیتەیی كارگێر لە ماوێ بەرپرسیاریەتی یەك سالەیدا، ئەو چالاکیانەیی خوارەوێ لە راپۆرتیکدا بۆ كۆنگرەیی چوارەم ئامادە كرد و رۆژی 1983/12/21 ی بۆ بەستنی كۆنگرەیی چوارەم دیاریی كرد.

1- بۆ پتەوكردنی پەيوەندیەكانی خۆی لەگەل بەرپۆھەرایەتی پەنا بەرانی سوید، رۆژی 1983/3/1 لەگەل بەرپرسیاری ئەو دەزگایە كۆبووئەو و لەسەر كار و خەباتی فیدراسیۆن و یارمەتی سالانەیی بەرپۆھەرایەتی پەنا بەران بۆ فیدراسیۆنەكان باس و گفتوگۆی كردوو.

2- لۆكالی فیدراسیۆنی بۆ بەرپۆھەردنی كارەكانی فیدراسیۆن و ویست و داخوایی ئەندامان و كوردەكانی دانیشتوی سوید، رۆژانە والا كردوو و ھەر رۆژەیی ئەندامی كۆمیتەیی كارگێر ئەركی كردنەوێ لۆكالی فیدراسیۆنی لە ئەستۆ بوو.

3- رۆژی 1983/5/31، دژی ھێرشێ سوپای توركیا بۆ سەر كوردستان خۆپیشاندانیکی رێكخستوو، كە پتر لە ھزار كورد بەشدارییان تیندا كردوو. رادیو و تەلەفیزیۆنەكانی سوید بە خەستیی لەو خۆپیشاندانەیی كوردان دوان. ھەرۆھا كۆمیتەیی كارگێر لە كۆبوونەوێیەكدا لەگەل ھەزارەتی دەرەوێ سوید، بەرپرسیاری و ھەزارەتی دەرەوێ سویدی لە ھێرشێ توركیا بۆ سەر كوردستان و زیانی خەلك ئاگادار كردوو.

4- رۆژی 1983/6/4، شەوێکی كوردیی بۆ پشتگێری لە گەلی كوردی رۆژەلاتی كوردستان لە Medborgarhuset پێكھینا و فیلمیکی دیۆكۆمینی لەسەر رۆژەلاتی كوردستان پێشانی بەشداران داو.

5- چالاکیی جۆراوجۆر بۆ پشتگێری لە كوردەكانی باكوری كوردستان بەرپۆھ بردوو و رۆژی 1983/7/24، بە نیشانەیی پشتگێری لە مانگرتووھەكانی شاری ئەرزەرۆم لە بەیاننێکی رۆژنامەوانیدا تاوانەكانی دەولەتی توركیای شەرمەزار كردوو.

6- یەكێك لە گرنگترین چالاکیەكانی فیدراسیۆن لە نیوان كۆنگرەكانی سنیەم و چوارەمدا، خەبات بۆ پەرورەدەكردنی منالان و لاوانی كورد بوو. كۆمیتەیی كارگێر لە راپۆرتی خۆیدا كە بۆ كۆنگرەیی چوارەمی ئامادە كردوو، دەنوسی:

- ھەرچەندە بیبەش بوون لە مافی نەتەوہیی كارگەریی قوڵی ھەییە لەسەر كەسایەتی منال و لاوانی كورد، بەلام بەوھالەش ئیمە دەبی ئەمرو لە سوید نەترسین و حاشا لە كورد بوونی خۆمان نەكەین. شك لەویدا نیبە كە لێرە بۆ بریاردان لە كوردستان ئازادترین، بەلام بەو حالەش ھیتشتا زۆربەیی منالانی ئیمە لە جیاتی خۆیندنی زمانی كوردیی، زمانی توركیی، عەرەبیی و فارسیی دەخوین. ژمارەییەكیش لەبەر نەبوونی كتیپی كوردیی نایانەوێ زمانی كوردیی بخوین. فیدراسیۆن بۆ بارھینانی منالانی كورد بۆلتینیکی لە 12 لاپەرەدا بە زمانی كوردیی دەرکرد. پێوھندیی بە ناوھندی بەرپۆھەرایەتی خۆیندنی سویدەو ھەول بەدەن. Skolöversyrelsen كورد، بۆ ئەوێ كتیپی كوردیی بۆ منالانی كورد ئامادە بكات. ھەرۆھا كۆمیتەییەكی لە ھەوت ئەندام لە ستۆكھۆلم و ئوپسالا پێكھینا، كە بۆ ئەو مەبەستە ھەول بەدەن.

بۆ پەرورەدە كردنی مامۆستای زمانی كوردیی گەلیك ھەنگاوی بەنرخێ ناو. سالیح ئینجە سەرۆکی فیدراسیۆن پەيوەندیی بە Staffan Lundgren سەرۆکی زانكۆی ستۆكھۆلم Universitet och Högskolaambetet كردوو. سەرۆکی زانكۆ بە گەرمیی پێشوازیی لێكردوو و لە زانكۆدا جینگەییەکیان بۆ خۆیندنی دوو سالەیی پەرورەدەكردنی مامۆستای زمانی كوردیی كردووئەو. بۆ ئەمەش پەرلەمانی سوید رۆژی 1983/1/12 داواكەیی خستووئە بەریاس و پەسەندی كردوو و لە پاییزی سالی 1984دا دەست بە خۆیندنی زمانی كوردیی كراو لە زانكۆی ستۆكھۆلم. فیدراسیۆن دوو مامۆستای بە ناوی رەشو زیلان بۆ بەشی كرمانجیی زانكۆی ستۆكھۆلم و فەرھاد شاكەلی بۆ بەشی سۆرانیی زانكۆ ناساند.

مېژووی بیست ساله فیدراسیونی کۆمهله کوردستانیهکان له سوید

حامید گوههاری

له سهه کارو خهباتی فیدراسیون. لهو کۆبوونهوهیهدا سههروکی بهرپهوهبهرایهتی بیانان دامهزاندنی فیدراسیونی پیرۆز کرد. - بهههولی کۆمیتتهی کارگێری فیدراسیون رۆژی 1982/3/17، کۆمهلهی مامۆستاینی کورد و رۆژی 1982/3/28، کۆمهلهی وهزشی لوانی کورد له سوید دامهزان.

- له نیوان دوو کۆنگرهی دووهم و سێیهمد، کۆمهلهی AKSA، کۆمهلهی KSSE، کۆمهلهی گهلی کوردستان، کۆمهلهی کورد له ناکا، کۆمهلهی ژنانی کوردستان، کۆمهلهی دیموکراتی کوردهکانی سوریا، کۆمهلهی کوردهکانی ئێران به ئەندامهتی فیدراسیون وهگرێران.

- کۆمیتتهی کارگێر کۆبوونهوهیهکی رهسمیی لهگهڵ Thord Palmund سههروکی بهرپهوهبهرایهتی بیانان لهسهه پهنابهرانی کوردی کوردستان عیراق پیکهینا و داوای وهگرتنی ئەوانی کرد.

- کۆمیتتهی کارگێر داوای ئەندامهتی له پیکهراوی هاوکاری فیدراسیونهکانی بیانی SIOS کرد. دهبرارهی داوای ئەندامهتی فیدراسیون له SIOS دا له بهشی کۆنگرهی دووهمدا وتم: چونکه ئەندامانی SIOS له وهگرتنی ئەندامی نویدا مافی فیتو کردنیان ههیه و فیدراسیونی تورکان دژی به ئەندام وهگرتنی فیدراسیونی ئیمه بووه له SIOS دا، فیدراسیون سههلهنوێ له نیوان کۆنگرهکانی دووهم و سێیهمد به ئەندام وهگرتهگیرا.

- کۆمیتتهی کارگێر دوو کۆبوونهوهی لهگهڵ ناوهندی بهرپهوهبهرایهتی خویندنی سوید Skolöverstyrelsen پیکهینا بۆ فهههنگی کوردیی و سویدی و سێ ئەندامی فیدراسیون بۆ ئەو کاره دهستنیشان کران، ههروهها لهسهه پرۆژهی زمانی کوردیی گهتوگۆیان کرد.

کۆنگرهی سێیهم ئەو خالانهی خوارهوهی بۆ خهباتی دواڕۆژی فیدراسیون دهستنیشان کرد:

ئا- خهبات بۆ وهگرتنی مافی بیانیان له ههلبژاردنهکانی سویدا.

ب- خهبات دژی راگرتن یان کهم کردنهوهی مافی پیکهراوه بیانییهکان.

پ- هاوکاری لهگهڵ پیکهراوه بیانییهکان و ههولدان بۆ وهگرتنی مافی ئەندامهتی له پیکهراوی هاوکاری فیدراسیونهکانی بیانیی SIOS دا له سوید.

ت- پشتگیری له خهباتی دژی به رهگهزهپرستی له سوید و ههولدان جیدی دژی رهگهزهپرستی.

بهشی دووهم

کۆنگرهی سێیهم 4-1982/12/5

ژمارهی کۆمهلهکانی ئەندامی فیدراسیون له نیوان کۆنگرهکانی دووهم و سێیهمد له شهه کۆمهلهوه گههسته پانزده و فیدراسیون رۆژی 1982/12/4 به بهشداریی 45 نوینهر له 15 کۆمهله، سێیهمین کۆنگرهی پیکهینا له لۆکالی ABF له ستۆکهۆلم به خولهکیک بیدهنگیی بۆ گیانی شههیدانی کوردستان.

کۆمیتتهی کارگێر سههههتا راپۆرتیکی گشتیی ئاراستهی کۆنگره کرد و تیییدا رایگهیاندا: فیدراسیونی کۆمهله کوردستانیهکان ئەمرۆ سێیهم کۆنگرهی پیکهین، فیدراسیون دوو سالی دژواری بهجیههشت، چونکه دامهزاندنی فیدراسیون و کار تیداکردنی بهو شتیه بهرفراوانه کاریکی ئاسان نیه. جاری یهکهمه که ئەو ژماره کۆمهله کوردستانیهکان به بیرو رای جیاواز له دهوری یهکتر کۆدینهوه و لهژیر ئالای فیدراسیوندا پیکهوه کار دهکن. ئاشکرایه که ئەوه ههنگاوکی مێژوویییه له سوید و قازانج به بهرز کردنهوهی ورهه گهلی ئیمه له ناوخۆ و دهروههه کوردستاندا دهگهیهنی. فیدراسیون قهیرانی پارچه پارچه بوونی کونی بهجیههشت و بوو به دهنگی بهرز و بلندی بۆ نیشتمانپهروهراکی کورد له سوید و سههروکیهتی کردنی مستی قورسه له دهمی دوژمنه داگیرکه رهکانی کوردستاندا. کۆمیتتهی کارگێر داوی خویندنهوهی ئەو راپۆرته گشتیه، راپۆرتی کار و چالاکییهکانی پیکههش کرد. بهشیک له چالاکییهکانی له لاپههه 6-7 بهریانگی ژماره 7 دا تۆمار کراوه و من لێرهدا ئاماژه بهم چهند خالهه خوارهوه دهکهه:

- پیکهینای کۆبوونهوهیهکی رهسمیی لهگهڵ Karin Andersson وهزیری بیانیان دهبرارهی ههلوهرجی کوردهکانی ژێردهسهلاتی سوریا.

- نامهیهی ئاراستهی بهرپهوهبهرایهتی رادیو و تهلهفیزیونی سوید کرد، بۆ وهگرتنی رادیویهکی سویدی به زمانی کوردیی بۆ کوردهکانی دانیشتووی سوید، ههروهها داوای کرد له شارهکاندا رینگا بدری که کوردهکان له رادیوی ناوچهیی دا به زمانی کوردیی کهک وهگرن.

- کۆبوونهوهیهکی رهسمیی ئەندامانی کۆمیتتهی کارگێر لهگهڵ بهشه جیاوازهکانی بهرپهوهبهرایهتی بیانیان له نۆریشپینگ لهسهه بانگههشتنی Thord Palmund سههروکی ئەو بهرپهوهبهرایهتییه به مهبهستی گهتوگۆ کردن

چاپکراوه کانی نوئ

خهباتی کۆمهانی کراوه بۆ زیادکردنی کۆمهلهی کراوه

خۆرئاوا دهوریکی بنه‌رهتی هه‌بوو له پرگارکردنی گه‌لی کورددا له چنگی سه‌دام، ئیستا کوردستان بوو ته‌ خائیکی گه‌شی پر ئاسایش و دیموکراسی له سه‌رتاسه‌ری رۆژه‌لاتی نیه‌وه‌ راستدا. راستیه‌که‌ی ئه‌وه‌یه‌ که به‌شیکی زۆر له‌ خه‌لک دووچاری شه‌ر و مه‌ینه‌تی و نابه‌رامبه‌ری هاتوون، زه‌بر و کوشنار بوو ته‌ تاکه‌ ئامرازیک بۆ به‌گژداچوونه‌وه‌ی زولم و ناحه‌قی، ئه‌نجامی به‌ کاره‌ینانی ئه‌م زه‌بر و توندوتیژییه‌ش هه‌ر له‌سه‌ر خه‌لکی هه‌ژار ده‌که‌ویت، ژانیان هینده‌ی تر ئه‌سته‌م تر ده‌بیت، به‌لام ئه‌وی جیگای سه‌رنجه‌ ئه‌وه‌یه‌ که شینواری زه‌بر و کوشنار له داموده‌زگای راگه‌یانندی خۆرئاوادا ره‌نگ ده‌داته‌وه‌، که‌چی که‌مجار باس له‌ هۆکاری راسته‌قینه‌ی کوشنار ده‌کریت.

سیاسه‌تی خۆرئاوا بۆ چاره‌سه‌ری کیشه‌ و گرفته‌کان زۆرجار کاتییه‌ و زۆر له‌سه‌ر خه‌لکی بیگونا‌ه ده‌که‌ویت. هه‌ر ئه‌مه‌شه‌ بوو ته‌ هۆی گه‌شه‌کردنی زه‌بر و گورزه‌که‌شی به‌ر خۆرئاوا ده‌که‌ویت. تیرۆر ناكریت له‌ ریشه‌ بکیشریت ئه‌گه‌ر ولاتانی خۆرئاوا په‌یوه‌ندیان له‌گه‌ل ده‌وله‌ته‌ دیکتاتوره‌کاندا نه‌گۆرن، ئه‌و ولاتانه‌ی که‌ مافی مرۆقیان تیندا نه‌پاریزراوه‌ و ئافره‌ت مافی ده‌نگدانی نییه‌، ئه‌و ولاتانه‌ی که‌ که‌مایه‌تییه‌ ئیتنیه‌کان ده‌چه‌وسینه‌وه‌ و مافی قسه‌کردنیشیان به‌ زمانی زگمکی خۆیان ناده‌نی. ناكری هه‌ولدان دژی تیرۆر له‌ هه‌ولدان بۆ دیموکراتیی و زیادکردنی ژماره‌ی ولاتی دیموکراتیی جیا بکریته‌وه‌!... ئه‌گه‌ر هه‌یزی شه‌ر پشه‌کیش نه‌کریت، هه‌رگیز تیرۆر له‌ بن نایه‌ت و له‌ داها‌توودا به‌ شیوه‌ی جیاواز سه‌ره‌لده‌داته‌وه‌... تیرۆریست به‌ ریگای بۆمباران کردن ده‌ستگیر ناكریت، به‌لكوو ده‌بی بدۆزیته‌وه‌ و بدریته‌ دادگا!

عه‌ره‌ببیدا هه‌ر عه‌وله‌مه‌یه‌، هه‌رچه‌نده‌ ئه‌و وشه‌یه‌ش مانای ته‌واوی گلوبالیزم نیه‌ له‌ عه‌ره‌ببیدا، به‌لام جییتی خۆی گرت له‌ زمانه‌که‌یاندا. ده‌با ئیمه‌ش وشه‌یه‌کی گونجایی بۆ بدۆزینه‌وه‌ و ئیتر به‌س بی.

- له‌ یه‌کێک له‌ گۆفاره‌کانی ولاتدا بابه‌تیکم خوینده‌وه‌ که‌ ده‌رباره‌ی به‌شیکی ریزمان بوو له‌ دیالیکتیکی کوردبیدا. ئه‌وه‌ی لام سه‌یر بوو، له‌جیاتی ئاوه‌لناوی دا‌پژراو، (دا‌پژاو) به‌کاره‌ینرا بوو. له‌ کاتیکدا رژان له‌ رشتنه‌وه‌ هاتوو و دا‌پژراو له‌ دارشتنه‌وه‌ و رشتن و دا‌پشتن دوو چاوگی هه‌جگار له‌ یه‌کتر جیاوازن. مه‌به‌ست له‌ دا‌پشتن (فۆرمیوله‌) کردنه‌ و (دا‌پژاو) یش هه‌رچه‌نده‌ له‌ کوردبیدا شتی وامان نیه‌ و خۆئه‌گه‌ر (قه‌زاو به‌لا دور) هه‌شمان بیت، ئه‌وا مه‌به‌ست له‌وه‌ ئه‌بی که‌ شتیک (رژا) بیت وه‌ک (دوی داده‌ رژواه) که‌ی ئه‌مین بالدار.

- له‌ هه‌فته‌نامه‌یه‌کی تردا سه‌رباسی بابه‌تیک رایچه‌کانم: (سزیفانه‌).

له‌ باسه‌که‌دا و به‌ سه‌رباسه‌که‌شه‌وه‌ ته‌نیا دوو جار ئه‌م وشه‌یه‌ نوسراوه‌، بابه‌ته‌که‌م خوینده‌وه‌ و هه‌ر بۆم ده‌رنه‌که‌وت (سزیفانه‌) مانای چیه‌، له‌به‌ر ئه‌وه‌ی من خۆم گه‌رمیانیم، خه‌یالم بۆ (زیف) چوو. ئه‌میش به‌ گه‌رمیانی مانای قۆشمه‌، هه‌زله‌ی...هتد، به‌لام سی (٢٠) چ په‌یوه‌ندییه‌کی هه‌یه‌ به‌ هه‌زله‌یییه‌وه‌؟ من نازانم و ئیوه‌ش خۆتان سه‌ریشک بن، دوچار خۆم ناچار کرد به‌ سیفیل بیقه‌بلنم.

جا تکایه‌کم هه‌یه‌ بۆ ئه‌وانه‌ی که‌ ئه‌نوسن، بۆ ئه‌وه‌ی سه‌ر له‌ خوینه‌ر تیکنه‌ده‌ن و قسه‌ی خوینه‌رانیشتان نه‌یه‌ته‌ سه‌ر، که‌ وشه‌یه‌کی سه‌یر و سه‌مه‌ره‌ ئه‌نوسن یان وشه‌یه‌کی کۆنی کوردیی یان ناوچه‌یی، ئه‌وا هه‌چ ناکه‌ویت له‌سه‌رتان که‌ (چوته‌ که‌وانه‌یه‌ک بکه‌نه‌وه‌ و مه‌به‌سته‌کانی تیدا بنوسن)، با هه‌موو لایه‌کمان سویدی ئی وه‌رگیرین.

ناوی کتیب : خوینده‌وه‌ و راهینانی کوردیی پۆلی دووم و سینیهم و چواره‌می سه‌ره‌تایی.

دانه‌ر : گۆلنیشان و شه‌وکه‌ت ئامیدی تیراز : ١٠٠٠ به‌رگ چاپی یه‌که‌م ، سوید ٢٠٠١

ناوی کتیب : خوینده‌وه‌ و راهینانی کوردیی پۆلی پینجه‌م و شه‌شه‌م و سه‌هه‌م.

دانه‌ر : گۆلنیشان و شه‌وکه‌ت ئامیدی تیراز : ١٠٠٠ به‌رگ چاپی یه‌که‌م ، سوید ٢٠٠١

ناوی کتیب : له‌ بیره‌وه‌ریه‌کانم ، به‌رگی یانزده‌هه‌م

نوسه‌ر : که‌ریم حسامی مۆنتاژ : ناسر ئیبراهیمی چاپ : سوید ٢٠٠١

ناوی کتیب : کوردستان نوسه‌ر : ئان ئیریکیسون

به‌ زمانی سویدی و کوردی «زاراوه‌ی سوێرانی و کرمانجی» چاپ : سوید ٢٠٠١

هەر جاره و چەند وشەیهک

نەوزاد وەلی

گەراییی بۆ (گلوبالیزم) بەکار ئەهێنن، که له کاتێکدا هیچ پەيوەندییهک له نێوان جیهان و گەرا و گلوبالیزمدا نیه. گەریی دوو پاشگره: (گەر) و (بی). (گەر) ئەخریته سەر هەندیک ناو و ئەیکات به ئاوه‌لناو، وهک: ئاسن-ئاسنگەر، مس-مسگەر، به خستنه سەری (بی) بۆ ئاوه‌لناوهکە، ناوی مانایی دروست ئەبێت وهک ناوی پیشه، هەر وهک: ئاسنگەر- ئاسنگەری، مسگەر- مسگەری، به لام هەندیک کەسی تر هەر بۆ گلوبالیزم (جیهانگەری) بەکار ئەهێنن که ئەمیش نه وهک پیشه و نه ئاوه‌لناوهکەش هیچ پەيوەندییهکیان نیه به گلوبالیزمهوه.

لهو دوو وشەیهش سه‌یرتر به‌کارهێنایی (گێره)، ئەم پاشگره ئەخریته سەر ناو و ئەیکات به ئاوه‌لناو، وهک: دهمار+گێره، به پاشگری (بی) خستنه سەر ئەم ئاوه‌لناوه، ئەیکات به ناوی مانایی، وهک: دهمار+بی= دهمارگێری.

کهواته بۆ گلوبالیزم که به مانای (به‌گشتیی بوون) یان (به جیهانیی بوون)ه، سێ وشەیی جیاواز به‌کار ئەهێنرێت، جیهانگەراییی، جیهانگەریی و جیهانگێریی که له لایه‌کهوه هیچیان پەيوەندییان نیه به گلوبالیزمهوه و له لایه‌کی تریشهوه هیچیان راست نین له زمانه‌که‌ماندا و داتاشراویکی بی سه‌رویه‌رن و به‌شیکردنه‌ویان ده‌رکه‌وت که هیچیان مانایه‌کی کوردیی نابه‌خشن.

عەرەب له‌گەڵ ئەوه‌دا که ۲۱ ده‌وله‌تیان هه‌یه و تهنیا دوو ده‌وله‌تیان نیه که به‌یه‌که‌وه بگۆنجن، به‌لام چونکه زمانه‌که‌یان سیمایه‌کی نه‌ته‌وايه‌تی و هۆی مانه‌وه‌یانه، که یه‌ک جار وتیان (عه‌وله‌مه) ئیتر له هه‌موو ولاتانی

که‌موکورتیی و هه‌له‌کان بێده‌نگ بین و هه‌ولێ چاره‌سه‌رکردنی کیشه‌کانی زمانه‌که‌مان نه‌ده‌ین، نه‌خێر... ئەوه نیشانه‌ی پیشنه‌که‌وتنه و گه‌له‌که‌شمان به قو‌ناغێکدا تینه‌په‌ریت که توندوتولکردنی زمانه‌که‌ی یه‌کێکه له پیرۆزترین ئه‌رکه‌کانی ئەم قو‌ناغه‌ی.

سالانیکه خه‌لکانیکی زۆر داوا له فیدراسیۆن ئەکه‌ن که (بۆخۆی) کتیبی زمانی کوردیی بۆ منالان چاپ بکات، به‌لام وهک له ژماره‌کانی پیشوودا باسمان کرد، ئیمه نامانه‌وێت ئەو بواره زیاتر ئالۆز بکه‌ین و گۆمی (ئه‌لفویتی کوردیی بۆ منالان) قولتر بکه‌ینه‌وه. وهک وتوو‌مانه ئەوه کاری که‌سێک و ده‌زگایه‌ک نیه! ئەم ئه‌رکه له سه‌رده‌مه‌دا زۆر گه‌وره‌تره له هه‌ول و کۆششی که‌سێک و ده‌زگایه‌کی راگه‌یاندن، ئەوه کاریکی هه‌ره‌وه‌زیی ئه‌وێت و بریاری کۆمینه‌یه‌کی پسیپۆر و شاره‌زایان که بریاره‌کانی په‌یره‌وی بکریت. به هه‌رحال هه‌ندیک له خۆینه‌ران پیشنیازی ئه‌ویان هه‌یه که وهک ژماره‌کانی پیشوو، به‌رده‌وام بین و هه‌ جاره و له‌سه‌ر چەند وشه‌یه‌ک بدوین.

- (به‌ینی) خۆمان بی... گلاس‌نوست و پیروسترویکا له جیاتی ئەوه‌ی سیاسه‌تی کورد بگرتیه‌وه، که‌چی بۆ کلتۆلییه‌که‌ی ئیمه زمانه‌که‌مانی گرتوه‌ته‌وه. (گه‌را) له کوردیدا به هیلکه‌ی گیانداره بچوکه‌کان ئەوترئ، وهک هه‌ندیک له خشۆکه‌کان و می‌شومه‌گەز و... هتد.

ئەگەر شتی‌ک به‌روخسار و شیوه له گه‌را بچیت ئەوا ئەلێین (گه‌راییی)ه، ئەمیش ناویکی ماناییه و وه‌سفی شتی‌ک ئەکات به شتیکی‌تر.

ئەوه‌ی سه‌یره که‌سانیک (جیهان

خۆشبه‌ختانه بانگه‌وازه‌کانی به‌ربانگ ده‌رباره‌ی زمان و ئەو رێچه‌یه‌ی که له‌م چەند ساله‌ی رابوردودا له‌م بواره‌دا گرتیه‌به‌ر، ورده‌ورده به‌رئه‌گرت.

خۆینه‌رانی بلاکراوه‌کانی ولات و به‌ربانگ هه‌ست به‌وه‌ولده‌ی به‌ربانگ ئەکه‌ن. ئەوه‌تا ماوه‌یه‌که له‌م رۆژنامه و له‌و گۆفاردایه‌ی کیشه‌کانی زمان ئەکریت و تاک و ته‌را رۆشنی‌ران ناره‌زایی ده‌رئه‌برن له داتاشین و روتکردنه‌وه‌ی وشه‌ی کوردیی و شیواندنی زمانه‌که‌مان. ئەگه‌رچی زۆربه‌ی ده‌زگاکانی راگه‌یانندی ولات توانای باشیان هه‌یه و له‌ زۆر روه‌وه، به‌لام هیشتا به‌ گۆیره‌ی پیوست گرنگی ناده‌ن به‌ زمانه‌که‌مان.

ده‌رباره‌ی گۆشه‌کانی دوو ژماره‌ی پیشوومان گه‌ییمان لیکراوه، له لایه‌ن یه‌کدوو مامۆستای به‌ریزه‌وه له کۆبوونه‌وه‌یه‌کی مامۆستایاندا له ستۆکه‌ۆلم.

گومان له‌وه‌دا نیه که نه‌ک هه‌ر سنگمان، به‌لکوو لاپه‌ره‌کانی به‌ربانگیش به‌ فراوانییه‌وه هه‌موو گه‌یه‌یه‌ک وه‌رئه‌گرن، به‌لام سه‌یر له‌وه‌دایه که ئەوانه‌ی پنیان وایه که باسێک به‌ گۆیره‌ی خواست و ویستی خۆیان نیه، به‌ نوسین و روتکردنه‌وه ناگادارمان ناکه‌نه‌وه!

مامۆستایان به‌ گشتیی و مامۆستایانی زمانی کوردیی له ده‌ره‌وه‌ی ولات، ئەبێ ئەوه باش بزائن که مایه‌ی سه‌روه‌ریی ئیمه‌ن و ئەوه‌ی که پیتیکی کوردیی (ئەگەر به‌ شیواووییش بێت) فیزی رۆله‌یه‌کی کورد بکات له‌م ده‌ربه‌ده‌رییه‌دا، ئەوا ئیمه سه‌ری ریزی بۆ دانه‌وه‌ین. به‌لام خوشک و برایانی به‌ریز، ئەمه‌ش مانای ئەوه نیه که له

ئەوانىش بۇ پىشخستنى گىشتىي مىللەتى ئىران ھاوكارىي دەولەت دەكەن. قازى محەمەد كە راست و رەوانتر لەو دووانە قسەى دەكرد، لە سەرەتادا گلەيى لە كىشەكانى پىشوو كرد و دواى ئەو لە گەندەلەيى دەزگاكانى حكومت لە ناوچە كوردنشىنەكان دوا و گوتى بۇچى لە كوردەكان بۇ كارى ئىدارىي ناوچە كوردنشىنەكان كەلك وەرناگرن.»

رۆژى ۲۲ى سەرماوەز خۇمان گەيانە مەھاباد و سوراخى قازى محەمەد مان كرد. بىردىيان بۇ دەفتەرى حىزبى دىموكرات. قازى محەمەد لەوئى بوو. بە گەرمىي پىشوازي لىكردين. يەكەم پرسىيارى لە ئىمە ئەو بوو، كە داخوا ناشامان خواردوو؟ گوتمان ئىمە شىووشمان نەخواردوو. فەرمانى دا نانايان بۇ هينايان. كاتى خواردن گوتى:

– پىرئى شەو پىشەوهرىي تەلفۆنى بۇ كردم و رايگەيانە كە سوپاى ئىران بەرەو تەوريز دئ و ئىمەش خۇمان كۆ كوردوو تەو و خەرىكى چوون بەرەو جولفا و سۇفیه تىن. پىشنىيازى پىكردم كە منىش لەگەل بنەمالەكەم مەھاباد بەجەپەلم و بەنا بۇ سۇفیه ت بەرم، كە لە وەلامىدا گوتم لە لای خەلكى مەھاباد دەمىنەو و هەتا ئەو جىيەش بۆم بلوئ پىش بە رشتنى خوئنى خەلك و ئازاوەگىرپى دەگرم و خۆم دەكەمە بەلا گىرەوهرى گەل.

دوا بە دواى لە سىدارەدانى پىشەوا و هەفلالانى روكنى دووى لەشكرى چوارەمى ورمى ئەو راگەياندراوهرى خوارەوهرى بلاوكردوو.

ستادى هیزى دەولەتى ئىران لە ورمى «روكنى دووم» ژمارە: ۱۹۱۲۵ - ۱۳۲۶/۱/۱۰ (۱۹۴۷/۳/۳۰) سەعات ۸ى بەيانى

راگەيانەن

لە كۆتايى سالى ۱۳۲۰-۱۹۴۱دا، محەمەدى قازى، ئەبولقاسمى سەدرى قازى و محەمەد حوسىنى سەفى قازى لە مەھاباد دەستيان دايە زنجىرەيەك هەلخەلەتاندن و چالاككەيى دژ بە ئاسايىش و هىمنايەتى ناوچە و بەرەبەرە كارى پىاوگۆزەنى خوئيان پەرە پىندا، كە بوو بە هوى هيندئ رووداوى داخهينەرى وەك هيرشكردنە سەر شارەبانىي مەھاباد و كوشتنى پىنج پاسەوان، تالانكردنى شارەبانىي و لەنۆبەردنى بەلگە و دەستاويزئى پىاوگۆزىيەكانى خوئيان، كوشتنى «مەحمودىيان» بازىرگانى مەھابادى و «قازى زاده» سەرۆكى ئىدارەى ئامار، كە هەموويان بوونە قوربانى خواست و زىدەخوازىي ئەوان، هەروەها تالانكردنى گوندەكان و رووداوى ديكەى ناوچەكە.

محەمەدى قازى بە ھاوكارىيى براكەى بە ناوى سەدرى قازى كە بە روالەت نوئىنەرى خەلكى مەھاباد بوو لە پەرلەمانى ئىراندا، بەلام لە ئەسلىدا ماكەى بەرپۆهەردنى سەرەكى نەخشەى گلاوى دابەشكردنى بەشېك لە ئىران بوو، هەروەها سەفى قازى بۇ بەرپۆهەردنى ئامانجى ناپىرۆز و گلاوى خوئيان، سەرۆكى هەموو ئىدارەكانى دەولەتئىي لە مەھاباد دەرکرد و لە رۆژى ۲۴ى سەرماوەزى سالى ۱۳۲۴- ۱۵ى ديسەمبەرى ۱۹۴۵دا ئالاي سنى رەنگى شىر و هەتاوى ئىزانايان لەسەر بىنا حكومەتئىيەكان داگرت و ئالايەكيان بەناوى ئالاي كوردستان لەجئ هەلكرد.

محەمەدى قازى لە رۆژى دووى رىبەندانى ۱۳۲۴- ۲۲ى جانوارى ۱۹۴۶دا خۇى بە سەرۆك كۆمارى كوردستان ناساند و تاقمىك خىانەتكارى پابوردوو خراپى بە ناوى وەزىرى حكومەتى خودموختارى كوردستان لەسەر ئىشوكار دانا، كە هەموويان ھاوكارى نزيكى خۇى بوون و ئىنجا بۇ بەرەبەرەكانى

كردنى هیزى دەولەت، تاقمىكى چەكدارى لە خەلكى مەھاباد و بارزانىيەكان پىكەينا و ژمارە چەك و تەقەمەنىيەكى بەرچاوى لە نيو دانىشتوووان و عەشیرەتەكاندا دابەشكرد و رەوانەى سەقز و سەردەشتى كردن. ئەوەش بوو هوى گەلەك رووداوى خوئىناوىي، هەرچەندە هیزى دەولەت چەند جار لە كوردستان داواى فەرمانبەردارىي لئ كردن هىچ سوودى نەبەخشى. هەروەها بەرپۆهەردانى خاوەن پىزى دەولەت لە تاران گەلەك هەوليان دا لەو بىرە نابەجئىيە دوريان بخەنەو، بەلام كەلكى نەبوو، هەمان رىيازى خوئيان درىژە پى دا. دانىشتوووانى شار و ئەندامى عەشیرەتەكانيان هاندا، دژى هیزەكانى حكومەتى بەرەبەرەكانى بكەن و بە نوسىنىش، فەرمانى هيرش بىردنە سەر هیزە سەربازىيەكانى ئەرتەشيان دەرکرد، بەلام بەخوشىيەو عەشیرەتەكان بەبىرى گلاوى ئەوانيان زانى و گوئيان نەدانى. ئىنجا هیزە سەربازىيەكان درىژەيان بە چوونە پىشى خوئيان دا و هەموو پىلانى خىانەتكارانيان بئ سوود هىشەو، لە ئاكامدا ئەم خىانەتكارانە دەستبەسەر کران و كەوتنە دەست دادگا. دۆسىەكانيان درايە «دادگای سەربازىي سەردەمى شەپ» و هەر سىكيان بە ئىعدام مەحكوم کران. دادگای پىداجوونەو (تجدید نظر) و هەروەها خاوەنشكۆ شاهەنشا حوكمەكەيان پەسند كرد و لە سەعاتى ۶ى بەيانى رۆژى ۱۰ى خاكەلئو- ۳۰ى مارسى ۱۹۴۶، حوكمەكە بەرپۆهە چوو.

فەرماندەى لەشكرى چوارەم و هیزى دەولەتى ئىران لە

كوردستان

سەرلەشكر هومايوى

سەرچاوەكان :

۱- نەپتىيەكانى محاکمەى قازى محەمەد و ھاوپىيانى كۆكردنەو و نوسىنى د. رىحىم سەفى قازى، كۆكردنەو و وەرگىرانى محەمەد رەزا سەفى قازى، نشر آنا، چاپى دووم تاران، ۱۳۸۰.

۲- كۆمارى ۱۹۴۶ى كوردستان، وىليام ئىگلتن جۆنز، وەرگىرانى سەيد محەمەدى سەمەدى.

۳- بەلگەنامەكانى كۆمەلەى ژيانەوهرى كوردستان. بڕوانە كتیبى كۆمەلەى ژيانەوهرى كوردستان، لە نوسىنى، نوسەرى ئەم وتارە.

۴- كۆمەلەى ژيانەوهرى كوردستان، لە نوسىنى، نوسەرى ئەم وتارە.

۵- گۆفارى كوردستان «بلاوكەرەوهرى بىرى حىزبى دىموكراتى كوردستان» ل ۱۱ ژمارە ۱، ۶ى ديسەمبەرى ۱۹۴۵.

۶- شىعرى فیردەوسى و پىشەوا بە كوردیى دەبیتە:

هەموو يەك يەك خۆ بە كوشتن بدەين
باشترە كە ولات بە دوژمن بدەين
پىشەوا دەنوسى:

هەموو يەك يەك پشت لە دوژمن بكەين

باشترە لەو كە خۇمان بە كوشتن بدەين

۷- رۆژنامەى «مرد امروز» ۲۳/۹/۱۳۲۵هه ئىران.

۸- لە كوردستانى عىراقەو تە ئوهرى روپاي ئاراس،

نوسىنى مورتەزا زەرەخت، چاپى ئازادە تاران، سالى ۱۳۷۶.

۹- كوردەكان، نوسىنى حەسەن ئەرفەح، وەرگىرانى

نوسەرى ئەم وتارە.

ههلوهشاندى كۆمەلەي ژىكاف و دامەزاندنى حىزبى دىموكراتى كوردستان لە ۲۳ى ئۆكتۆبەرى ۱۹۴۵ و بەستنى يەكەم كۆنگرەي حىزب لە ۲۴ى ئۆكتۆبەرى ھەمان سالدا. قازى مانگىك و ۲۶ رۆژ دواي دامەزاندنى حىزبى دىموكرات، لە ۲۶ سەرماوھەزدا ئالاي كوردستانى لە مھاباد بەرز كوردە و لە ۲۲ى ژانويەي ۱۹۴۶دا، لە چوارچراي مھاباد، لە كۆبوونەوھەيكي گشتىي گەلدا كۆمارى دىموكراتى كوردستانى دامەزاند و لە لايەن خەلكەوھە نازناوي پىشەوای پى بەخشرا.

كۆمارى كوردستان بە سەرۆكايەتى پىشەوای قازى محەمەد لە ماوھەي دە مانگ و بىست و شەش رۆژى تەمەنىدا توانى دەزگاي دەولەتتى، سىستىمى ئىدارىي و بەرپۆھەريي حكومەتى، ئەرەشى نەتەوھەي، دەزگاي فيزىكردن و پەرورەدە و راگەياندى گشتى دامەزىنتى و دواي ئو ماوھەي بە پىلانى دوژمنى داگىركەي ئىزان و يارمەتى دەرەبەگە خۆفرووش و خۆبەدەستەوھەدەرەكانى رۆژھەلاتى كوردستان و پشت بەردانى يەكيتىي سۆقيەت لە رۆژى ۱۷ى دىسەمبەرى ۱۹۴۶دا، يەكسال دواي ھەلكردنى ئالاي كوردستان، مھاباد كەوتەوھە دەست دوژمنى داگىركە.

بەر لەوھەي كە مھاباد بکەوتەوھە دەست دوژمن، سەرۆك بارزانى داواي لە پىشەوای كە، فەرمانى بەرگري كردن لە كۆمار راگەيەنتى، بەلام ئو كە ناگاي لە كوردەوھەي خاينانەي سەرۆك عەشیرەتە خۆبەدەستەوھەدەرەكان بوو، واى بەباش زانى، كە خۆي و كۆمار تەسلىمى دوژمن بگات و بەم جۆرە لە رژانى خويى خەلك پىشگىرى بگات و تەنانەت ئامادە نەبوو، گيانى خۆشى رزگار بگات و مھاباد بەجىھىلتى. تەنيا داواي ئوھە بوو، كە بارزانى ئالاي كوردستان لەگەل خۆي بەرئ و فەرمووي: تو تەنيا كەسيكى كە دەتوانى پارىزگارىي لەو ئالايە بکەي و لە دوارۆژدا لە گۆشەيەكي خاكي كوردستاندا ھەلى كەيەوھە.

چەند رۆژىك دواي جىگىربوونى سوپاي داگىركەي ئىران لە مھاباد، پىشەوای قازى لەگەل محەمەد حوسىن خانى سەيفى قازى و سەدرى قازى دەستبەسەر کران. رۆژى ۱۹ى ژانويەي ۱۹۴۷، لە دادگايەكي تايبەتتى سەربازىيدا بە سەرۆكايەتى سەرھەنگ «پارسى تەبار» و بەشدارىي چەند ئەفسەر لەوانە: «ئايروم»، «فيوزى»، «فيروزي»، «بىنگلەرى»، «وھەرھام» و «موزفەرى» بە شىوھى نەھنى كەوتنە ژىر لىپرسىنەوھە. پىشەوای دەبان تاوانى بۆ رىز كرابوو. يەكۆك لەوان، كە سەرۆكى دادگا ئەوانى تری زۆر تورپە كوردبوو، ئو كۆپلە شىعەرەي فيردەوسى بوو، كە ئەوكاتە بۆ بەرزپارگرتنى وەرەي ئەندامانى سوپا لە سەر دەرگا و دىوارى ئىدارە و سەربازخانەكانيان ھەلداوھەسى و پىشەوای پىچەوانەي كوردبوو. فيردەوسى دەلى:

ھەمە سەر بە سرتن بە كشتن دەھىم

از آن بە كە كشور بە دشمن دەھىم

پىشەوای لە وەلامى نامەيەكي توندى و بى ئەدەبانەي سەرتىپ «رەزمئارا»دا بۆي نوسىبوو:

ھەمە سەر بە سرتن بە دشمن دەھىم

از آن بە كە خود را بە كشتن دەھىم

كۆبوونەوھەكانى دادگا ھىندىك چار لە كاتژمىر ۲۴.۰۰-۰۰.۸ و ھىندىك چارىش تا ۰.۰۳ رۆژى دوايى درىزەي ھەبوو. رۆژى ۹ى ژانويەي ۱۹۴۷، دادگا لەسەر تاوانى پىشەوای و سەدر و سەيفى قازى كۆليوھە. ناوبراو لە كاتژمىر ۲۲.۰۰-۰۰.۸ جيا لە ماوھەيەكي كورت كە دادگا بۆ خواردى ناز پشوو ي راگەياندا، نزيكەي ۱۴ سەعات يەكسەر قەسەي كرد

و رەخنەي جياوازي لە دادگا و حكومەت گرت و لە كۆتاييدا رايگەياندا، كە ئو دادگايە سەلاحيەتى لىكۆلنەوھەي لەسەر من و ھەفا لانم نىھە. ئىمە مروفي مەدەنبن و دەبى لە دادگايەكي مەدەنى دا يان لە تاران لە لايەن دادرەسى سوپا محاكمە بكرىن.

قازى محەمەد لە دوايىن دىفاعى خۆيدا بە ئاشكرا رايگەياندا كە پىتان وا نەبى من ئاگام لە چارەنوسى خۆم نەبووھە، بەلكو بەچاكي دەمزانى و بەر لە ھاتنى ئەرەتەش و ھىزە ناوھەندىيەكان بۆ مھاباد وتوومە كە من لە دار دەدەن.... بۆ چى سەرەراي ئو چۆنيەتتەي ھەلنەھاتووم؟ لەبەر ئەوھە نەبووھە كە نەمتوانيوھە، بەلكو شەش دەزگا ماشىنى سواری و جىپم لە دەستدا بوون و ھەر كاتىك بىارم دابا، دەمتوانى لە سنور تىپەرم و خۆم رزگار بکەم، بەلام من وھكوو پىشەوھەي ژانايە نەبووم كە لەكاتى روويەروو بوونەوھە لەگەل مەترسى راكبەم؛ بۆ كوئى ھەلا تىبام؟ ئىرە خاكي كوردستانە و قەبرى ھەشت بەرە باب و ئەژدادى منى تىدايە، پىويست بوو كە من بۆ مانەوھەي مىللەتى كورد ئو فىداكارىيە بکەم.

رۆژى ۱۹۴۷/۲/۵، واتە دوانزە رۆژ دواي تەواوبوونى محاكمەي قازىيەكان، لە تاران قولى ئەردەلان و عەبدولحمىدى سەندەجى، كە نوینەرانى سەنە بوون لە خولى چوارەدى پەرلەمانى ئىراندا، لەگەل خەليل فەھىمى وەزىرى مشاويرى حكومەتى ئەوكات، دەچنە لاي پىشەوای قازى و داواي لىدەكەن، كە بۆ رزگاربوونى خۆي ھەفا لانى لە ئىعدام داواي لىبورن لە حەمە رەزاشا بگات، بەلام مەرگى پى باشتر بوو لە سەرشورى. ھەتا بارزانىيەكان لە رۆژھەلاتى كوردستاندا بوون و نەچووبوونە بەشى باشورى كوردستان، دەولەتى ئىران پىشەوای قازى و ھەفا لانى لە سىدارە نەدا، بەلام ھەرکە ئەوان لە ۲۷ى مارسى ۱۹۴۷، رۆژھەلاتى كوردستانيان بەجىھىشت و گەرانەوھە باشور(۱۱)، محەمەد رەزا شا فەرمانى لە سىدارەدانى قازى و ھەفا لانى راگەياندا و ۳۰ى مارسى ۱۹۴۷ بە فەرمانى راستەوخۆي محەمەد رەزا شا، لە چوارچراي شارى مھاباد، واتە لەو جىگايەي كە كۆمارى كوردستانى لى راگەياندبوو، لەگەل محەمەد حوسىن خانى سەيفى قازى و سەدرى قازى لە سىدارە دران.

پىشەوای قازى بە كوردەوھە پىشانى دا، كە نىشتمانپەرورەيكي فىداكارى نەسەرەوتووه. ھەرچەندە بۆ ماوھەيەكي زۆر لە خەباتى سىياسىدا بەشدارىي نەكردبوو، بەلام خۆ بەختكردنەكەي لە پىناو نەتەوھەي كورددا، گەياندىيە پلەيەك، كە بۆ ھەمىشە لە دلى خەلكى كوردى ھەموو بەشەكانى كوردستاندا زىندوو دەمىننەتەوھە و شەھىد كوردنىشى پەلەيەكي رەشە بە سەر سىماي داگىركەرانى كوردستان و بنەمالەي پەھلەويدا دەمىننەتەوھە.

بۆ ئەوھەي گەورەي پىشەوامان پتر بۆ دەرکەوتى، ئامازە كردن بە دوو نووسراو دەرپارە بەرپىزان بە پىويست دەزانم، كە لە كىتیبى «كوردەكان»ى حەسەن ئەرەفەح و لە كىتیبى «لە كوردستانى عىراقەوھە تا ئەوبەرى رووباي ئاراس» نوسىنى مورتەزا زەرەبەخت وەرگىراون. حەسەنى ئەرەفەح دەلى:

« رۆژىك سەدرى براى قازى محەمەد كە نوینەرى پەرلەمان بوو، بە تەلەفون داواي لى كردم چاوپىكەوتنىكم دەگەل ئو و براكەي ھەبى. ئەوان ھاتنە سەر كوردايەتى ستادى ئەرەتەش و گفتوگۆيەكي ھەمە بابەتە و دووردرىژمان كرد. سەدر و سەيف تا پادەبەكە خۆيان دەپاراست و ھىمەن بوون و بە پىنج و پەنا قەسەيان دەرکرد و دەيانگوت ھىوادارىن دەولەتى ئىران لە تايبەتەندىيەكانيان بگات و مافى نەتەوھەي ئەوان بەسەلینى و

محەمەدی قازی چۆن بوو بە پێشەوای کورد

حامید گەوهەری

له ۱۹۴۱دا که لهشکری سوری سوڤیهت له بهشیک له خاکی رۆژههلاتی کوردستان جیگیر ببوو، بۆ کۆنتڕۆلی ناوچهکانی ژێردهستی و به هاوکاری سەرۆک عەشیرهتهکانی کوردستان، سی دهرهههگ، خاوهن مولکی گهوره و کهسایهتیه زۆر ناسراوهکانی کوردی بۆ «باکو» بانگهێشت کرد. محەمەدی قازی یهکیک بوو لهو کهسایهتییانه، که لهگهڵ ئەو گروپه له دیسهمهبری سالی ۱۹۴۱ سەردانی «باکو»ی پایتهختی نازهربایجانی سوڤیهتی کرد.

محەمەد قازی به هۆی پلهی چینهیتهی و کار و بهرپرسایهتیهکهی، نزیکیهتی زۆری لهگهڵ فیوډالهکانی ناوچهکه ههبووه. لهبەر ئەوه، سهرهتا بهدڵ پیزی له کۆمهله نهگرتوه و بۆخۆشی زۆر جیگهی پیز و خۆشهویستی ریههانی کۆمهله نهبووه و تهناهت له لایهن ریههانی کۆمهلهی ژیاوهی کوردستانهوه پهختهی لی گیراوه.

کهسایهتی بهرز و پادهی ئیجتزاسی محەمەدی قازی لهنیو خهڵک و زۆریهتی ئەندامانی کۆمهلهدا و زهق بوونهوهی پادهی لیهاتوویی له کارهکاندا بۆ خهڵک و بهتایهتی روسهکان، ههیهتی ناوهندی کۆمهلهی ناچار کردوه، داوی ئەندامهتی لی بکات، ئەویش وهلامی داخواری ئەوان دهداتهوه. ههیهتی ناوهندی کۆمهله له کۆتایی ئۆکتۆبەر و سهرهتای نۆفهمبهری

۱۹۴۴دا سەرۆکایهتی کۆمهلهی پێ سپاردوه. محەمەدی قازی جاریکی تریش له کۆتایی سینهتیهبهری ۱۹۴۵دا چوه «باکو». سەفەری ئەمجارهی قازی بۆ نازهربایجان، له کاتیکدا ئەنجامی گرت، که سەرۆکایهتی کۆمهلهی ژیکافی له ئەستۆ بوو. لهو سەفەرهدا، که لهسەر داوی «ئاتاکشی ئۆف» ئەفسههری سیاسی سوڤیهت له تهریز ئەنجامی گرت و عەلی ریحانی، محەمەد حوسین خانی سهیفی قازی، مهنافی کهرمی، قاسمی ئیلخانیزاده، عەبدوللای قادری، ههمزە ئاغای نهلۆسی، نوری بهگی بهگزاده و محەمەدی خزری قازی شنۆیه، واته ئەندامانی بهرێوهبهرایهتی و کادیترانی پالای کۆمهله یاورییان دهکرد، له باکو چاوی به «باقرۆف» سەرۆک کۆماری نازهربایجان کهوت. ئاکامی ئەو دیدارهی دهستهی نوینهرایهتی کورد لهگهڵ باقرۆف، ههلوهشانی کۆمهلهی ژیکاف و دامهزانی حیزبی دیموکراتی به داواوه بوو. محەمەد قازی رۆلێکی بهرچاوی گیرا له گۆرینی ناو و ئامانج و

محەمەدی قازی کورپی عەلی قازی کورپی قازی ئەبولقاسم رۆژی ۱ ئاپریلی ۱۹۰۰ زاینی له مهاباد چاوی به ژین کردوهتهوه. له خزمهت قازی عەلی بابی و «ابولحسن سهیف القضا»ی مامی که مامۆستایهکی فرهزانی سهردهمی خۆی بووه له زمان و ئەدهبیاتی کوردیدا، خۆیندنی سهرتایی تهواو کردوه. له لایهن مامۆستایان میستر میلیتر و میسس میسدال فیزی زمانی ئینگلیزی بووه. له لای مهلا حوسینی مهجدی قورئانی خۆیندوه و هەر لهو رینگایهشهوه فیزی زمانی عهرهیی بووه. مامۆستا عەبدولرحمانی (گیو) موکریانی له فیزیوونی زمانی فهراڤسی دا یارمهتی داوه.

سهرهتا بهرگی ئاینی (عەبا و عەمامهی عهرهیی) پۆشیوه و دوایی تهنا عەمامهکهی ههشتتوهتهوه و له جیاتی عەبا، کۆت و پانتۆلی ئەوروپی لهبەر کردوه. دواي تهواوکردنی خۆیندن له لای باب و سهیف القضا مامی و مامۆستایانی ئەو سهردهمه، به پلهی قازیهتی گهیشت، بهلام ههتا قازی عەلی بابی له ژیاندا بووه، به شێوهی رەسمی ئهرکی قازیهتی بهرێوه نهبردوه و سهردهفتهری، دهفتهرخانهی ژماره دووی مهاباد بووه.

سالی ۱۹۲۳-۱۹۲۵ سەرۆکی ئیدارهی ئەوقاف و کاروباری ئیسلامی شاری مهاباد بووه و سالی ۱۳۰۵-۱۹۲۶ به خۆکشاندهوهی سهیف القضا مامی له

ئیدارهی فههرهنگ واته (ئیدارهی پهروهده و فیکردن) محەمەدی قازی کراوه به سەرۆکی ئەو ئیدارهیه.

محەمەدی قازی له سهردهمی سەرۆکایهتی خۆیدا دوو فیزگهی دامهزاند. یهکیکیان به ناوی (پهلههوی) فیزگهیهکی ئیجباریی بووه و ئهویتریان، فیزگهی (پرماس)، دوايي ناوی گۆرا و بوو به فیزگهی (پهروانه) واته پهپوله.

سالی ۱۹۳۱، محەمەدی قازی به دواي کۆچی دوايي قازی عەلی بابی دا، له لایهن حکومهتی ناوهندی ئیرانهوه کرا به قازی ناوچهی مهاباد، بهلام له سالی ۱۹۳۶دا، بههۆی قسهکردنی به زمانی کوردی بۆ سهربازەکانی سهربازخانهی مهاباد و پهختهگرتنی له کردهوهی دژی مەمورهکانی حکومهت، له لایهن حکومهتی رهزا شاوه، پلهی قازیهتی لیوهگرهپارهوه و دواي داگیرکردنی بهشیک له خاکی ئیران و کوردستان له ۲۵ی ئاگوستی ۱۹۴۱، له لایهن سوپای دهولته هاوپهیمانهکانهوه و راکردنی رهزاشا له ئیران، گهراڤاندیانهوه سەر کارهکی.



که‌ریم ئەحمەد

سکرێتیری گشتیی حیزبێ شیوعی کوردستان

سەردانی فیدراسیۆنی کرد



رۆژی ٢٦/١١/٢٠٠١، بەرێز که‌ریم ئەحمەد سکرێتیری گشتیی حیزبێ شیوعی کوردستان و بەرێزان بابی تارا، قادر رەشید (ئەبو شوان) و دوکتۆر زەکی لە لقی سویدی حیزبێ شیوعی کوردستان و کۆمیتەیی دەرەوی حیزب، سەردانی فیدراسیۆنیان کرد و لە لایەن سەرۆک و سکرێتیر و ئەندامانی کۆمیتەیی کارگێڕەوه پێشوازییان لیکرا. لە سەرەتای ئەو دیدارەدا که‌یا ئیزۆل بەخێرەتیی میوانەکانی کرد و بە کورتی وەلامی پرسبیری ئەوانی دایەوه. دواجار بەرێز که‌ریم ئەحمەد لەسەر سیاسەتی ئەمرۆیی حیزبەکه‌ی و ئەزمونی باشوری کوردستان دوا و وەلامی پرسبیری ئەندامانی بەشداری دایەوه. لە کۆبوونەوه‌که‌دا، ئەندامانی کۆمیتەیی کارگێڕ خۆشحالیی خۆیان لە هاوکاریی لقی حیزبێ شیوعی کوردستان لە سوید لەگەڵ فیدراسیۆن دەربریی و سەرۆکی یەکیەتیی ژنانی کوردستان داوای هاوکاریی پتری ژنانی ئەندامی حیزبێ شیوعی کرد. هەرەها حامید گەوهەری رۆژی ٣/١٢/٢٠٠١، بەشداریی

سیمیاریکی کرد، که لە لایەن کۆمیتەیی سویدی حیزبێ شیوعی کوردستانەوه بۆ بەرێز که‌ریم ئەحمەد لە هۆلی هوسبی تریف پیکهاتیبوو.

سیمیاریکی کرد، که لە لایەن کۆمیتەیی سویدی حیزبێ شیوعی کوردستانەوه بۆ بەرێز که‌ریم ئەحمەد لە هۆلی هوسبی تریف پیکهاتیبوو.

سیمیاریکی لە لایەن حیزبێ دیموکراتی کوردستانی ئێرانەوه

رۆژی ٨/١٢/٢٠٠١، کۆمیتەیی سویدی حیزبێ دیموکراتی کوردستانی ئێران سیمیاریکی سیاسی زانستی بۆ بەرێز حوسین مەدەنی ئەندامی دەرەوی سیاسی حیزبێ دیموکرات لە هۆلی هوسبی تریفی ستۆکهۆلم پیکهاتینا، لەو سیمیاریه‌دا که ناوی ١١ی سیتەمبەری ٢٠٠١ و ستراتژیی نوویی ئەمریکا لە جیهان و مەسەلەیی کورد بوو، مەدەنی بیروپرای خۆی سەبارەت بەو تەوهرە نووییە دەربریی. سکرێتیری فیدراسیۆن حامید گەوهەری بەشداریی سیمیاری حیزبێ دیموکراتی کوردستانی ئێرانی کرد.

چلەمین رۆژی شەهیدانی گوندی خێلی حەمه


رۆژی ٣/١١/٢٠٠١، کۆمیتەیی سویدی یەکیەتیی نیشتمانیی کوردستان سیمیاریکی بەبۆنەیی چلەمین رۆژی شەهیدانی گوندی «خێلی حەمه» لە هۆلی شیساتریتیف پیکهاتینا. لە سیمیاریه‌که‌دا چەندان وتار لەسەر بەکرێگراوانی جوندی ئیسلام که لە لایەن رژیمی کۆماری ئیسلامی ئێرانەوه یارمەتی دەرین، خۆیندراپەوه و کردەوه‌کانیان مەحکوم کرا. که‌یا ئیزۆل، حامید گەوهەری، فیلدان تانریکلو و گۆفان ئامەدی لە لایەن فیدراسیۆنەوه بەشداریی سیمیاریکیان کرد و ئیزۆل وتاریکی بەو بۆنەپەوه خۆیندەوه.

مالی نوئی فیدراسیون له لایهن وهزیری کولتوری سویدهوه کرایهوهی



پۆژی ۲۰۰۱/۱۰/۱۲، فیدراسیون به بهشداریی نوینهری ریکخواه سیاسیه کوردی و سویدییهکان و وهزیری کولتوری سوید Marita Ulfskog لۆکالی نوئی خوی کردهوه. ماریتا له وتهکانیدا لۆکالی نوئی فیدراسیونی به مالی کوردان ناساند و پیروزبایی کرد و پشنیوانیی خوی له خهباتی فیدراسیون و گهلی کورد دوویات کردهوه. سهروکی شارهوانی ناکا Erik Laugberg که له فرۆشتنی لۆکال به فیدراسیون پۆلی بهرچاوی ههبوو، پشنگیری خهباتی فیدراسیونی کرد. بریتس لانهرفاش Britis Lannerfars سهروکی کومهلهی کرینشینهکانی گههکی هینریکسدال خوشحالی خوی له هاتنی فیدراسیون بو گههکهکهیان دهربری و نوینهری پارتی گهل و پارتی ژینگه و تهها بهرواری نوینهری حکومتی ههریمی کوردستان له باکوری ئهوروپا پیروزباییان کرد.

نیچیرقان بارزانی سهروک وهزیرانی حکومتی ههریمی کوردستان سهردانی سویدی کرد



پۆژی ۲۰۰۱/۱۰/۲۶، نوینهرایهتی حکومتی ههریمی کوردستانی عیزان له باکوری ئهوروپا کۆبوونهوهیهکی بهرفراوانی بو بهریز نیچیرقان بارزانی سهروک وهزیرانی حکومتی ههریمی کوردستان له هۆلی (ئۆسیژومناسیوم) ستۆکهۆلم پیکهینا. ئەندامانی کۆمیتەیی کارگیری فیدراسیون و ئەندامانی کۆمیتەیی گشتیی دانیشتووی ستۆکهۆلم بهشداریی کۆبوونهوهکهیان کرد.

ناوهڕۆک

بەربانگ

ژمارە ١٢٢ سالی ٢٠ (٢٠٠١)

نۆرگانى فیدراسیۆنى كۆمهله كوردستانىیه كانه له سوید
خاوى نىمتیان: كهیا نىزۆل

دهستهى نووسهران:

حامید گهوهرى

نەوزاد وهلى

كۆفان نامهى

ئىلداى تانىركو

مونتاز

هامىدى گهوهرى

سەرنوسەر: ئىلداى تانىركو

ئابوونەى سالانه: ٢٠٠ كرۆنى سویدییه

بۆ دەزگاکان: ٣٠٠ كرۆنى سویدییه

نرخى يەك دانە: ٢٥ كرۆنى سویدییه

بۆ دەرەودەى سوید: ٤٠ دۆلارى ئەمریکى

بۆ دەزگاکانى دەرەودەى سوید: ٦٠ دۆلارى ئەمریکى

ناونیشان:

e-mail

berbang@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

Box 50 13

13 105 Nacka / Sverige

Tel: 08- 644 66 22

Fax: 08- 650 21 20

بۆستگىرۆ: 8- 64 38 80

دهستهى نووسهران مانى ئەودى همیه ، رینوسى وتارەکان رامب

بگاتەوه و بەو شتووبەى دەگونجى ، كورتیان بگاتەوه .

دهستهى نووسهران له ناوهڕۆكى وتارەکان بەرپرسيار سیه

فیدراسیۆنى كۆمهله كوردستانىیه كان له سوید له

1981/5/22 دامەزراره .

ژمارەى يەكەمى بەربانگ له مانگی ٧/١٩٨٢ ١٥ بلاوكرارهتەوه

- ١ - مالى نوێى فیدراسیۆن له لایەن وهزیری كولتوری سوید ل ١
- ١ - نیچیرفان بارزانی سەرۆك وهزیرانی كوردستان ل ١
- ٢ - كهريم ئەحمەد سكرتیری گشتی حیزبی شیوعی ل ٢
- ٢ - چلەمین رۆژی شههیدانی گوندی خێلى حەمه ل ٢
- ٢ - سیمیناریك له لایەن حیزبی دیموکراتی كوردستانه وه ل ٢
- ٣ - محەمەدی قازی چۆن بوو به حامید گهوهرى ل ٣
- ٦ - هەر جاره و چەند وشهیهك نەوزاد وهلى ل ٦
- ٨ - میژووی بیست ساله‌ی فیدراسیۆن حامید گهوهرى ل ٨
- ١٣ - یهکیهتی ئەوروپا و حەوسه‌له نەوزاد وهلى ل ١٣
- ١٤ - قسه‌ی نه‌ستق حەمه سه‌عید حەسەن ل ١٤
- ١٥ - خەباتی كۆمه‌لی كراوه حەمه دۆستان ل ١٥
- ١٦ - پاراستنی كولتور عادل دهۆكى ل ١٦
- ١٧ - دیمانه‌یهك له‌گه‌ل كۆمه‌له‌ی كهريم قه‌لادزیی ل ١٧
- ١٨ - دیمانه‌یهك له‌گه‌ل هونەرمانده عیزهت فهرخه ل ١٨
- ١٩ - كۆری مانه‌ینی كه‌ريم حسامی ل ١٩
- ٢١ - چەند چالاکیه‌کی فیدراسیۆن و نۆرگانه‌کانی ل ٢١
- ٢٢ - ناگاداریی له لایەن كۆمیتە‌ی هاوکاریی هیزه ل ٢٢

ناگاداری

كۆمیتە‌ی هاوکاریی هیزه سیاسییه‌کانی كورد و كوردستانی له سوید،

دووی رێبه‌ندان سالتۆژی به‌نجاوشه‌شه‌مین سالی دامەزرانی كۆماری

دیموکراتی كوردستان پیرۆز ده‌كات.

هونەرماندانی به‌شدار : ناسر ره‌زازی ، قادر ئەلیاسی ، نەردەلان ، قادر

قوربانی و ... و كۆری هونەریی یه‌كیتی لوانی دیموکرات له سوید.

كات: ٢٠٠٢/١/١٩

كاتژمیڕ : ١٨,٠٠ واته ٦ ئیواره

شوین : سۆلنا هالین ، ستۆكهۆلم

هه‌موو لایه‌ك به‌خیر بێن

بەريانگ

نۇرگانى ئيدراسيۇنى كۆمەتە كوردستانىيەكانە لە سوئد
زمارە ۱۲۲ سالى ۲۰۰۱



جەزنى رەمەزان و جەزئەكانى سەرى سالى ۲۰۰۲تان
لى پيرۆز بى